
MAHIR ÇAYAN



ŞOREŞA BÊNAVBER I-II-III

MAHIR ÇAYAN

ŞOREŞA BÊNAVBER I-II-III

Wergera ji zimanê Tirkî: Aram Alî

Buroya Ragihandinê ya Eniya Şoreşê ya Rojhilata Navîn

ji bo bîranîna "ÇARAN", Firat ÇAPLIK, Mûhammet TÎRÎL, Firat YILDIRIM û Ûmût OZSEPET...

ŞOREŞA BÊNAVBER I-II-III

NAVEROK

PÊŞGOTIN 11

DI DERBARÊ PIRSGIRÊKA ÇANDÊ DE 13

ŞOREŞA BÊNAVBER-I 17

PÊŞGOTIN 17

BEŞA YEKEMÎN 21

TEORIYA ŞOREŞÊ YA MARKSÎZMA BERIYA YEKDESTIYÊ 21

I. TÊGEHÊN ŞOREŞÊ YÊN MARX Û ENGELS 21

II. MERHALEYA ŞOREŞÊ, MERHALEYA WERARÊ Û TEORIYA QEYRANAN 27

III. TEORIYA QEYRANA DOMDAR Û ŞOREŞA DOMDAR 37

IV. TUNDIYA ŞOREŞGER Û DERBASBÛNA AŞTIYANE 45

V. "NETEWEYÎBÛN" Û ENTERNASYONALÎZM 47

VI. ŞOREŞA PROLETERYAYÊ LI WELATEKÎ TENÊ YAN LI HEMÛ EWROPAYÊ? 49

BEŞA DUYEMÎN 52

TEORIYA ŞOREŞÊ YA MARKSÎZMA DEMA EMPERYALÎST 52

I. VEGUHERANDINA SERMAYEDARIYA RIKBER A BER BI SERMAYEDARIYA YEKDEST VE 52

II. XERAKIRINA "ORTODOKS" A MARKSÎZMÊ Û TEORIYA ŞOREŞA LENÎNÎST (I) 56

III. XERAKIRINA "ORTODOKS" A MARKSÎZMÊ Û TEORIYA ŞOREŞA LENÎNÎST (II) **64**

TEORIYA ŞOREŞA BÊNAVBER A LENÎNÎST Û MENŞEVÎZM **64**

IV. HIŞMENDIYÊN PARTIYÊ YÊN BOLŞEVÎK Û MENŞEVÎKAN **71**

V. ŞOREŞA 1905'AN Û ŞOREŞA GEL A DEMOKRATÎK A KU LENÎN EW PÊŞBÎN DIKIR **78**

WÊ ŞOREŞ, JI BAJARAN BER BI GUNDEWARAN VE BIMEŞE **81**

DESTHILATA KU WÊ WERE AVAKIRIN, WÊ BIBE DESTHILATA HÊZÊN SEREKE; ZORBAZIYA ŞOREŞGER A KARKER Û GUNDIYAN **82**

VI. MERHALEYA WERARÊ, MERHALEYA ŞOREŞÊ **87**

HEYAMA WERARÊ **88**

MERHALEYA ŞOREŞÊ **90**

Jêrenot: **95**

ŞOREŞA BÊNAVBER II-III 101

DESTPÊK 101

BEŞA YEKEMÎN 106

RAVEKIRINÊN PÊŞEK 106

I. MARKSÎZM-LENÎNÎZM, RÊBEREKE ÇALAKIYÊ YE 106

II. DOZÊN LENÎNÎZMÊ YÊN GERDÛNÎ 108

III. MERHALEYÊN WERAR Û ŞOREŞÊ Û ŞÊWAZA XEBATÊ 109

BEŞA DUYEMÎN 120

SERDEMA QEYRANA 3'YEMÎN A EMPERYALÎZMÊ Û XETA LENÎNÎST 120

I. SERDEMA QEYRANA 3'YEMÎN A EMPERYALÎZMÊ 120
II. DÎKTAYA OLÎGARŞÎK 130
III. XETA ŞOREŞGER Û REVÎZYONÎZM 132

BEŞA SÊYEMÎN 143
TAYBETMENDIYÊN TIRKIYEYÊ YÊN DÎROKÎ, CIVAKÎ, ABORÎ Û PIRSGIRÊN DI DERBARÊ PRATÎKA ME DE 143
I. DEWLETA OSMANÎ YA FEODAL A NAVENDÎ 143
II. KEMALÎZM 147
III. ŞOREŞA 1923'AN Û HEYAMÊN 1923'AN Û 1942-1950'YÎ
IV HEYAMA 1950-1971'Ê 153
V. 12'Ê ADARÊ Û TÊKILIYÊN ÇÎNAYETIYÊ YÊN GUHERBAR 155

BEŞA ÇAREMÎN 169
ARMANCA ME YA STRATEJÎK: ŞOREŞA DIJ-EMPERYALÎST Û DIJ-OLÎGARŞÎK E 169

BEŞA PÊNCEMÎN 175
PIŞTÎ 12'Ê ADARÊ, REWŞA ENIYA ÇEPGIR A TIRKIYEYÊ ... 175
Jêrenot: 179

BIRYARA DERXISTINA JI THKP-C'YÊ YA YUSUF KUPELI Û M. RAMAZAN AKTOLGA 188

NAMEYA BERFANBARA 1971'Ê 190

PARTIYA RIZGARIYA GEL A TIRKIYEYÊ DANEZANA BI HEJMARA 1'EMÎN 192

ENIYA RIZGARIYA GEL A TIRKIYEYÊ DAXUYANIYA BI HEJMARA 1'EMÎN 198

RÊZIKNAMEYA PARTIYA RIZGARIYA GEL A TIRKIYEYÊ. 203

JI DESTEYA WEZÎRAN A AMERÎKANPEREST RE..... 206

PÊŞGOTIN:

Ev xebata ku ji zimanê Tirkî hatiye wergerandin, ji bo bîranîna gerîlayên THKP-C/MLSPB'yê, ÇARAN; Firat ÇAPLIK, Mûhammet TÎRÎL, Firat YILDIRIM û Ûmût OZSEPET ên ku ji bo rizgariya çîna karkeran û gelên bindest ên Tirkiye û Kurdistanê di 16'ê Îlona 2019'an de li Qadên Parastinê yên Medyayê şehîd ketine, hatiye amadekirin.

Emperyalîzm û rêveberiya zordest a olîgarşîk, incex bi şerekî gel ê çekdarî dikare were hilweşandin. Piştî şerê 2'yemîn ê parvekirinê, emperyalîzma DYA'yê, li welatên ku paş de hatine hiştin, diyardeya mêtîngeriya nû xist meriyetê. Bi vê diyardeyê re welatê me, Tirkiye jî bi riya kûçikên Amerîkanperest ên "herêmî û neteweyî", gav bi gav kete binê venêrîna emperyalîzma Amerîkayê. Bi darbeya 12'ê Îlonê re jî, diyardeya mêtîngeriya nû, ji nû ve li ser bingeha polîtîkayên nû yên lîberal, hate kûrkirin.

Welatê me -bi vegotina têgehên Marksîst- di nava "qeyraneke neteweyî" ya giştî de ye ku "êdî kesên ku bi rê ve dibin, nikarin weke berê bi rê ve bibin; kesên ku têne birêvebirin jî êdî naxwazin weke berê werin birêvebirin". Nivîsên Mahir Çayan û xeta THKP-C'yê, di binê ronahiya van rastiyan de, careke din rastiya xwe çespand. Peywira me ew e ku, em qeyrana neteweyî ya sermayedariya Tirkiyeya mêtîngeha nû, li ser bingeha ramana volantirîst a THKP-C'yê, bi pratîkeke dewlemend û zindî, kûrtir bikin.

Li hemberî her cûre jirêderketinên rastgir û çepgir ên ku rizgariya gelê me bi derengî dixin û asteng dikin, tiştê ku bihêle em ji riya xwe dernekevin, ramana THKP-C'yê ye.

Şoreşa Bênavber I-II-III, ew nivîsên teorîk in ku nêrînên polîtîk û stratejîk ên THKP-C'yê bi awayekî bipergal û bi giştî derdixin holê. Nivîs, ji hêla Mahir Çayan ve hatine nivîsîn. Wekî hemû gelan, mafê gelê Kurd jî heye ku bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdeyê bike. Ev yek, nayê nîqaşikirin. Riya rizgariya ji nexweşiya nijadperestiyê, li ser bingeha hêmanên Lenînîst, ji parastina Mafê Diyarkirina Çarenûsa Xwe Ya Neteweyan derbas dibe. Wergera ramana THKP-C'yê, ji bo rizgariya bi hev re ya gelên Tirkiye û Kurdistanê, destekeke biçûk e. Em ji bo keda wî ya di şoreşa yekbûyî de, spasiya hevalê Aram Alî dikin.

19/02/2022

Buroya Ragihandinê Ya Eniya Şoreşê Ya Rojhilata Navîn

DI DERBARÊ PIRSGIRÊKA ÇANDÊ DE

Karê şoreşgeran ew e ku divê ji bo şoreşê şer bikin; him jî bi hemû derfetên xwe. Weke ku hosteyên mezin jî didin xuyakirin: “Kesên ku ji bo şoreşê şer nakin, mirov ji wan re nikare bêje sosyalîst”. Ji ber vê jî dive şoreşger, xwe ji bo şoreşê amade bikin, behremendiyên xwe pêş bixin û bibin pispor. Ev yek jî bi perwerdeya di nava xebata teorîk û pratîk de pêk tê. Ango divê perwerdeya teorîk a şoreşger û pratîk bibin yek. Armanc ne ew e ku her pirtûkên ku dikevin dest, werin xwendin an jî agahî kom bibin; armanc ew e ku di nava rêzekê de perwerde were dîtin û ji bo ku bi dijminekî diyar re şer were kirin, bi awayekî baş perwerde were kirin. Armanc ew e ku kadroyên tevgera şoreşger werin avakirin.

Her têkoşer, divê inisiyatîfê bi kar bîne, di qadên têkçûn û serkeftinê de biryarên dûrist bide û bi rêberiya taktîkên rast, şer bike. Ji bo vê yekê jî divê teorî bi awayekî afirîner bikeve ramanê û di pratîkê de were pêkanîn.

Ji bo ku şagirtên tevgera şoreşger ji perwerdeyeke xurt derbas bibe du rê hene ku ev herdu rê hevdu temam dikin û bi hev ve girêdayî ne. Divê teoriya razber were fêmkirin; divê gelek gotin bikevin nava mejî; divê dîroka tevgerên karkeran were fêmkirin; divê dîroka tevgerên şoreşger ên cîhanê were fêmkirin, ango bi kurtasî divê Marksîzm-Lenînîzm û pratîka wê ya cîhanî were fêmkirin. Divê mirov di nava xebatên pratîk ên tevgera şoreşgerî ya welatê xwe de cih bigirin; ji ber ku li gorî mercên welatê wan

e, xeta rast a Marksîzm-Lenînîzmê fêm bikin û pratîka vê têkoşînê pêk bînin.

Weke ku tê dîtin, di tevgera kadrobûnê de teşegirtina teorîk a kesan, risteke gelekî girîng dileyîze. Heger ev taybetmendî baş pêk were, wê çaxê kadro dikarin weke pêşengên girseyan di xeta rast de çalakiyan bikin û weke rêxistinparêzên serbixwe xebatan bimeşînin. Barê sereke yê perwerdeyê, li ser milên kesan e.

Divê neyê jibîrkirin ku fêrkirin û ji bo fêrbûnê xebata çalak a takekesî, xebateke şoreşgerî ye. Pêwîst e bi awayekî mayînde di mejî de were çandin ku şoreşgerî, ne karekî seknan, mekanîk û di wateya giştî de ne pîşeyek e; şoreşgerî, giyanek e, coşek e û hesteke welatparêziyê ye. Perwerde, pêwîstiyek û peywira sereke ya vî giyanî ye. Incex wê çaxê xebatên zanistî yên ku bingeha perwerdeya şoreşger in, dikarin werin meşandin. Incex wê çaxê perwerdeya şoreşgerî ya li ser kaxizan û biryarên ku em distînin, wê nebin biryarên burokratîk û wê veguherin perwerdeya rojane ya şênber. Helwesta ku dibêje "Ez jî mile xwe bidim erebeya şoreşê ya ku dimeşe; bila para min jî tê de hebe", helwesteke bi temamî mekanîk e. Ev helwest, kesan ji çalakbûnê dixe; di demên zehmet de jî dike ku kes ji riya xwe bizîvirin. Pirsgirêk ne ew e ku mirov tev li çalakiya dafandina erebeyê bibe; pirsgirêk ew e ku dive mirov hemû derfetên xwe bixe meriyetê û ji bo şoreşê berpirsyariyê rake.

Ji bo vê jî pêwîst dike ku coşa şoreşger û li hemberî hêzên dij-şoreşger jî zor û hers hebe. Divê em zanibin ku di rojên dirêj ên şoreşê de hêza xurt a ku me li ser piyan dihêle, ev coş û hêrsa şoreşger e. Çawa ku artêşa ku çekên xwe winda bike, êdî

taybetmendiya artêşbûnê winda dike, şoreşgerên ku coşa welatparêziyê bi wan re tune ye jî taybetmendiya xwe ya şoreşgeriyê winda dikin. Welatparêzî, baweriya ji şoreşê re û hilgirtina berpirsyariyê ji hevdu nayên qetandin. Şoreşgerên baş, di demên têkçûnê de dikarin bi xwe biryarê bidin, dikarin bi xwe berpirsyariyê rakin û sist nabin. Hilgirtina peywiran û hestê berpirsyariyê, divê hertim bi dû xwe de tevgera şoreşgerî bîne. Ango kesên ku bi berpirsyariyê dihisin, divê rasterast derbasî pratîkê bibin; herî kêm dive xwe ji şoreşê re amade bikin. Pêwîst e ji bo vê jî "di binê hêmana navendîbûnekê de" şoreşger xwe di teorî û çalakiyê de perwerde bikin. Kesên ku xwe perwerde nakin, xwe bi bîrdoziya şoreşê napêçînin û nakevin nava xebateke pratîkî, weke kîsên vala ne û lewlewokên (lafazan) jirêzê ne.

Xala destpêkê ya perwerdeyê ew e ku divê mirov pirsgirêkên sereke yên têkoşîna çîna karkeran a welat û cîhanê (bi awayekî polîtîk, aborî û bîrdozî) lêkolîn bike û li ser vê bingehê perwerdeya teorîk a Marsîzm-Lenînîzmê bike. Divê were zanîn ku "Teorî ne dogma ye, lê rêbera çalakiyê ye" (Lenîn) û peywira sereke ew e ku "Divê bi wan were fêrkirin ku endamên partiyê û endamên yekitiya ciwanan, ne li hemberî dijminekî gelemperî têbikoşin, lê rêbazên Marksîzm-Lenînîzmê li gorî hin şert û mercan bixin meriyetê û li hemberî 'dijminekî diyar' şer bikin" (Dimitrov). Pêwîst e ku bingeha perwerdeyê wiha be.

Kadroyên ku perwerdeya takekesî dikin, pêwîst e hertim serî li hêmana NÎQAŞ-REXNE-REXNEDAYÎN'ê bidin. Yek ji peywirên ku li pêşiya me ye jî, fêrbûna Marksîzm-Lenînîzmê ye.

Ji bo ev perwerde biçe serî jî, pêwîst e xebatên me, di nava bernameyeke diyar de werin meşandin. Pêwîst e ku weke şervanên şoreşê, bêyî ku riya xwe şaş bikin, divê şervanên egîd ava bibin ku di xeta rast de bimeşin û xebatên di nava girseyê de bikin. Di nava tevgera şoreşger de kesên ku ji disiplînê, hişmendiya rêxistinê û berpirsyariyê direvin, rastî bîrên tarî tên. Di vê çarçoveyê de pêwîst e girîngiya mijarê were fêmkirin û em tevgera xwe li gorî vê girîngiyê sererast bikin.

MAHIR ÇAYAN

ŞOREŞA BÊNAVBER-I *

PÊŞGOTIN

Di eniya çepgir a welatê me de tevliheviyeke teorîk serdest e. Hin hêzên oportunîst ên ku heman ramanên revîzyonîst ji xwe re dikin bingeh û bi qalikên cuda derpêşî mirovan dikin û pişta xwe ne bi hêza xwe ya cewherîn, lê bi hêzên derve ve girêdidin, bi awayekî herî tund hevdu bi oportunîzmê, pasîfîzmê û xayintiyê tawanbar dikin. Di nava wan de hin cudahiyên biçûk ên nirxandinê yan jî şêwazê hene, lê ji bo van tiştan qiyametê radikin.

Di qaşo polemîkên bîrdoziyê yên ku dikin de bêyî ku fedî bikin tiştan şaş nîşan didin, qîjeqîjên bûrjûwaziya biçûk berz dikin û dibêjin "em kevn in, em dizanin". Di nava vê toz û dûmanê de ev bi salan e ku hevdu digevizînin.

Li welatê me tevgereke proleteryayê ya xurt tune ye, di encama vê yekê de jî li eniya çepgir asta bîrdoziyê ne bilind e. Di nava mercên wiha de çi rast e, çi xwar e ji hev nayê derxistin û hertişt ketiye nava hevdu. Û cewhera teoriya şoreşê ya Marksîst-Lenînîst winda bûye. Di nava mercên wiha de şêweyên cuda yên oportunîzmê, bi navê teoriyên resen ên "şoreşê" û bi navê Marks, Engels, Lenîn, Stalîn, Mao-Tse Tung û Ho Chi Minh derdikevin holê. Yek ji cûreyên oportunîzmê behsa nivîsên Lenîn dike û aliyê din bi xayintiyê tawanbar dike; aliyê din jî nivîsên Mao û Lîn Pîao dikin çavkanî û kesên ku wan tawanbar dikin bi revîzyonîzmê tawanbar dikin.

“Marksîzm dozîneyeke gelekî kûr û tevlihev e”. Marksîzm, li hemberî rastiyên jiyanê xwe hertim kûr dike, dewlemend dike û li xwe zêde dike. Di Marksîzmê de ya girîng ne gotine e, naverok e. Tiştê ku di Marksîzmê de naguhere, bi vegotina Lenîn, rêbaza diyalektîk e ku giyana wê ya zindî ye. Heger herdu hêmayên sereke yên diyalektîkê, dem û cih were paşguhkirin wê li gorî Marks û Engels, Lenîn revîzyonîst be; wê li gorî Lenîn û Stalîn, Mao-Tse Tung û li gorî Mao jî şoreşgerên serkeftî yên serdema qeyrana 3’yemîn revîzyonîst bin.

Oportunîzm li her deverê û her tim di berovajîkirina Sosyalîzma Zanistî de serî li du riyan dide:

Yan têgehên cih û demê paşguh dikin û bi çarlepkan xwe bi dozîneyên ku hosteyên Marksîzmê ji bo mercên din ên dîrokî pêş xistine û di dema niha de kevn bûne ve girê didin û hewl didin van dozîneyan, ji bo jirêderketina xwe bikin palpişt. Yan jî dibêjin “dem û cih hatine guhertin, ji bo wê ne derbasdar in” û hewl didin dozîneyên Marksîzm-Lenînîzmê yên di binê her şert û mercî de derbasdar in revîze bikin.

Weke hemû welatên cîhanê, hemû cûreyên oportunîzmê yên welatê me jî serî li herdu rêbazan didin, Marksîzm-Lenînîzmê berovajî dikin û hewl didin mejiyên milîtanên şoreşger tevlihev bikin.

Wextê me ev broşur nivîsî, me ev rastî ji ber çavan derbas kir. Me hewl da ku em têgihiştina xwe ya şoreşê, nêzîkahiya xwe ya rêxistinê û şêwaza xebatê û riya guhertin û dewlemendbûna teoriya şoreşger a Marksîzmê rave bikin. Di dahurandinên

Sosyalîzma Zanistî de bi gelemperî mirov ji dahûrandinên şênber, ber bi tiştên razber ve diçin. Weke ku me lijor jî diyar kiriye di nava tevliheviya teorîk a eniya çepgir de cewherê bîrdoziyê ji ber çavan winda bûye. Ji ber vê yekê me biryar da ku em ji tiştên razber dest pê bikin, ji destpêka mijarê em rave bikin, deynin holê ku çawa kûr bûye û bi vî awayî bigihêjin tiştên şênber.

Bi vî awayî em ê teoriya şoreşger a Marksîst a ku di nava tevliheviyê de cewherê wê winda bûye derxin holê û tevliheviya mejiyên hevalên me yên milîtan a ji ber polemîkên qaşo bîrdoziyê yên oportunîzmê jî asteng bikin. (Bêguman ne gengaz e ku em berovajîkirinên oportunîzmê bi temamî asteng bikin. Lê em dikarin mijarê bi awayekî zelal deynin holê û bi vî awayî berovajîkirinên oportunîzmê bi gelemperî bê bandor bikin).

Ji ber van sedeman me di dahûrandinên xwe de rêbaza ji tiştên razber, ber bi tiştên şênber ve şopand.

Me mijar di sê beşan de lêkolîn kir. Beşa yekemîn behsa teoriya şoreşê ya Marksîst a dema Marks, Engels û Lenîn dike.

Di beşa duyemîn de me behsa wê yekê kiriye ku Teoriya Şoreşa Bênavber a Lenînîst, ji hêla Lenîn ve di Du Taktîk'ê de hatiye kûrkirin. Her wiha me behsa sepandina vê teoriyê ya ji bo pratîkên mêtîngeh û nîv-mêtîngehan kiriye. Komunterên ku di dinê rêveberiya Stalîn de bûn û Mao, ev pêşniyara Lenîn cuda cuda şîrove kiriye. Di vê beşê de her wiha cewherê dozîneya riya ku ne sermayedar e û beşa Teoriya Şoreşa Demokratîk a Neteweyî hene.

Di beşa sêyemîn de taybetmendiyên cuda yên emperyalîzmê; kûrbûn û dewlemendbûna pêşniyara Lenînîst a li hemberî her şert û mercî; stratejiya şoreşê ya welatên nîv-mêtîngeh; şîroveyên şoreşger û yên revizyonîst ên şoreşa Kubayê û beşa Riya Şoreşa Tirkiyeyê hene.

Her wiha di her beşê de di mijarên pêwîst de rexnekirina oportunîzma li welatê me cih digire.

KURTULUŞ

BEŞA YEKEMÎN
TEORIYA ŞOREŞÊ YA MARKSÎZMA BERIYA YEKDESTIYÊ
I.
TÊGEHÊN ŞOREŞÊ YÊN MARX Û ENGELS

Marks û Engels behsa sê cûreyên têgeha şoreşê dikin: **"şoreşa polîtîk, şoreşa civakî û şoreşa bênavber"**. (Em ê di beşa 3'yemînd e behsa şoreşa bênavber bikin.)

Li gorî Marks û Engels şoreşa polîtîk ew e ku di nava wê pêvajoya dîrokî de desthilatdariya polîtîk piştî hilweşandina desthilatdariya paşverû ya heyî, bikeve destê rêveberiyeke pêşverû. Ji bo ku tevgerek karibe bibe şoreşa polîtîk pêwîst e ku girseyên gel **(3)** an jî beşeke girîng a gel li hemberî desthilatdariyê di nava têkoşînê de be. Incex dema ku girse rabin ser piyan û di encamê de desthilat bikeve destê şoreşgeran, mirov dikare behsa şoreşa polîtîk bike. **(4)** Li gorî Marks û Engels ji bo ku tevgerek karibe weke şoreşa polîtîk were nirxandin, pêwîst e ku rêveberiya piştî vê tevgerê, paşverû û demokratîk be. Ev ravekirina Marks, ji bo civaka bûrjûwa ya beriya yekdestiyê ye. Li cem Marks û Engels, pîvana pêşverûtiyê gelekî balkêş e. Marks wiha behsa pîvana pêşverûtiya tevgerekê dike:

"Krediyên dewletê û krediyên taybet, ew termometreyên aboriyê ne ku bi kêrî pîvandina tundiya şoreşê tên. Rêjeya van çiqasî kêm be, hêza xerabker û afirîner a şoreşê ewqasî bilind dibe." (Li Fransayê Têkoşînên Çînayetiyê, rpl:53) **(5)**

Tenê rêveberiyek dikare derba kuştinê li krediyên dewletê û krediyên taybet bixe; ew jî rêveberiya proleteryayê ye. Ji ber vê jî şoreşa polîtîk a ku li ser bingeha civaka bûrjûwaziyê bandora herî xerabker û afirîner pêk tîne, şoreşa proleteryayê ye. Ev şoreş, di heman demê de veguhertina civakî (şoreşa civakî) jî pêk tîne. Ji ber ku ev şoreş, krediyên bûrjûwaziyê û borsayê ji holê radike. Ev jî tê wê wateyê ku hilberîn û pergala bûrjûwaziyê ji holê radibe û pergaleke nû ya cviakî û aborî dest pê dike.

Şoreşa 18'ê Sibatê, şoreşeke polîtîk e. Ev şoreşa ku armanca wê arîstokrasiya aboriyê bû, nikarîbû derba kuştinê li krediyên dewletê û krediyên taybet bide, lê ew sînordar kirine. Sibat, nikarîbû dawî li pergala bûrjûwaziyê bîne, tenê kiriye ku yek ji cûreyên paşverû yên vê pergalê bi dawî bibe; her wiha çarçoveya maf û azadiyên demokratîk fireh kiriye û ew kûr kiriye. Ji ber ku dawî li pergala bûrjûwaziyê neaniye, şoreşa Sibatê, ne şoreşeke civakî bû, lê ji ber ku di encama serhildana girseyan de rêveberiya herî paşverû ya arîstokrasiya aboriyê hatiye hilweşandin û weke komara civakî, rêveberiyeke pêşverûtir hatiye ser kar, şoreşeke polîtîk e.

Di ravekirina şoreşa civakî ya Marks de (mirov dikare ji vê re bêje şoreşa rastîn) pêwîst e ku ji şêwazeke hilberînê, civak derbasî şêwazeke pêşdetir a hilberînê bibe.

Marks di vê mijarê de wiha dibêje:

"Di merhaleyeke geşedanan de hêzên hilberîner ên şênber ên civakê, bi têkiliyên hilberînê yên ku heta wê çaxê di nava wan de tevdigeriyan re yan jî bi têkiliyên xwedaniyê yên ku ravekirina wan a zagonî ye re dikevin nava nakokiyê. Ev têkilî, êdî nabin encamên geşedana hêzên hilberînê û li hemberî van geşedanan dibin asteng. Wê çaxê serdema şoreşa civakî dest pê dike. Guhertina bingeha aboriyê, wê avaniya mezin a jorîn, bi lezeke mezin an jî hêdî hildiweşîne. Di lêkolînkirina van tevliheviyan de pêwîst e ku serûbinbûna şênber a mercên hilberîna aboriyê - ev yek, bi awayekî teqez di warê zanistî de dikare were destnîşankirin- û teşeyên zagonî, siyasî, olî, hunerî an jî felsefî, ango teşeyên bîrdoziyê yên ku mirov dikevin ferqa vê aloziyê û wê hate dawiyê dibin, ji hev werin cudakirin... Bêyî ku hemû hêzên hilberîner ên di nava wê de pêş bikevin, teşegirtineke civakî teqez tune nabe; têkiliyên nû û bilindtir ên hilberînê, bêyî ku mercên hebûnê yên şênber ên van têkiliyan di nava civaka kevn de kulîlkên xwe vekin, teqez pêk nayên û cihên xwe nagirin." (Têkariya Rexneya Polîtîka Aboriyê, rpl:23-24)

Weke ku tê dîtin, di teoriyên şoreşê yên Amrks û Engels de hêla determînîzma aborî û civakî derdikeve pêş. Rista volantrîzmê jî di nava çarçoveya diyarker a mercên şênber de ye. Li gorî vê hişmendiyê şoreşa polîtîk, temamkerê şoreşa civakî ye. Di nava çarçoveya diyarker a mercên şênber de şoreşa polîtîk, berhema **inisiyatîfa şoreşger** e. (Dema ku Şoreşa Proleteryayê tê gotin, divê şoreşa polîtîk û civakî were fêmkirin).

Hêmayên wê ev in:

1) Şoreşa polîtîk, merhaleyeke pêwîst a şoreşa civakî ye.

Şoreşa polîtîk, berhema pêngava şoreşer e. Şoreş, karê rêxistina zane ya ku girseyan bi dûv xwe de diherikîne û dizanê wê çi bike ye. Bi taybetî jî ji bo şoreşa polîtîk a ku rê li ber veguhertina sosyalîst vedike, rewş wiha ye. Rêxistineke hejmarbiçûk a ku xwediyê disiplîneke ji hesin e, hişmendiyê digihêjîne girseyê, asta hişmendî û çalakiyê ya girseyê bilind dike û di cih û demên guncan de **inisiyatîfa şoreşger** bi kar tîne û bi vî awayî şoreşa polîtîk pêk tîne û veguhertina sosyalîst ava dike. Di encama çalakiya girseyên hişyar de şoreş pêk tê û şoreş, xwe dispêre girseyan. Lê belê rêxistina şoreşgeran a ku ji kesên hejmarbiçûk ên ku karê wan şoreşgerî ye pêk tê û pêngava şoreşgerî ya vê rêxistinê, di asta jiyanê de girîng e.

2) Ji bo ku şoreşa polîtîk, veguhertina civakî pêk bîne (ji bo dema beriya yekdestiyê tê gotin; ji bo roja me jî ji bo ku şoreş pêk were) **ango ji bo ku şoreşeke civakî pêk were pêwîst e ku ji aliyekî ve mercên civakî û avaniya aborî û civakî têr bike û li aliyê din jî asta hişmendî û rêxistinbûnê ya girseyên gel bilind be.**

Di şoreşa civakî de ne tenê inisiyatîfa şoreşger rista sereke dileyîze. Kesên leheng dîrokê naafirînin, dîrok kesên leheng diafirîne. Di dîroka şoreşan de gelek têkçûnên inisiyatîfa şoreşger hene ku ligel ku desthilatê bi dest xistine, ji ber kêmasiya mercên şênber (ligel hemû lehengiyan) pêk hatine. **Ji tevgera Munzer heta Şêx Bedredîn û Komuna Parîsê** di

dîrokê de têkçûnên inisiyatîfên şoreşger ên ku bi mercên şênber ên dema xwe re ne di nava hevsengiyê de bûn, hene.

Pêngaveke şoreşgerî ya di demeke diyar de çiqasî xurt bibe jî, heger ew dema dîrokî rê nede ku ew pêngav bi ser bikeve; heger mercên şênber ên jiyanê negihabin asta serkeftina wê pêngavê, wê di encamê de têkçûn çê bibe.

Dema ku tevgera Munzer dinirxîne, Engels bi awayekî hosteyî behsa yekitiya diyalektîk a di navbera **inisiyatîfa şoreşger û determînîzma dîrokî û civakî** de dike:

"Ji bo serokekî ne di cihê xwe de hatiye ser kar belaya herî mezin ew e ku, tevgera wî neçar bimîne ku di demeke ku hêj ew çîna ku tevger nûnêrtiya wê dike, desthilatdariya çînî pêk neaniye û serweriya vê çînê hêj nehatiye wê astê ku amadekariyên pêwîst bike de desthilatê bi dest bixe. Tiştê ku ji destê vî serokî tê, bi vîna wî ve ne girêdayî ye. Merhaleya ku dijberiya di navbera hin çînan de gihayê; asta geşedana têkoşîna di navbera çînan de; mercên debarê, têkiliyên hilberînê û têkiliyên pevguherînê yên ku asta geşedana dijberiyên çînî xuya dikin, vê yekê diyar dikin... Bi vî awayî ew, dikeve nava nepeniyekê ku çareseriya wê ne pêkan e. Tiştên ku ji destê wî tên, dijberî çalakiyên wî yên berê ne, dijberî hêmanên wî û berjewendiyên rojane yên partiya wî ne. Tiştê ku dixwaze bike jî, tiştekî ku pêkanîna wê ne gengaz e." (Li Almanyayê Şerê Gundiyan, rpl:127)

Di teoriya şoreşê de têkilî û nakokiyên di navbera **inisiyatîfa şoreşger û determînîzma aborî û civakî** de ji hêla Marks ve wiha tê ravekirin:

"Kes, dîroka xwe bi xwe çê dikin, lê ev yek li gorî kêfa wan û di nava mercên ku wan hilbijartiye de pêk nayê; ev, di nava mercên ku pêşeroj rasterast ji wan re anîne û mîrate hiştine de pêk tê." (Darbeya Louis Bonaparte, rpl:21)

Û Marks li hemberî kesên paşverû yên ku dibêjin şoreş, berhema komên biçûk ên fitnekaran e, sedemên şoreşê bi vî awayî rave dike:

"Êdî dema baweriyên bêbin ên ku dixwazin şoreşan weke berhemên fitnekarên nêtxerab nîşan bidin derbas bûye. Êdî divê herkes zanibe ku li cihên ku hejandinên şoreşgerî lê pêk tên, ev hejandin ji ber pêdiviyên civakî yên ku ji aliyê saziyên kevn ve nayên têrkirin derdikein holê." (Ji Axaftina Marks a Li Pêşberî Endamên Lijneya Dadê ya Kolonyayê, 1851; çavkanî Henri Lefebre, Civaknasiya Marks, rpl:189)

Mijar, aşkere ye. Ji bo ku inisiyatîfa şoreşger bi ser bikeve, pêwîst e ku ew şoreş, li ser bingeheke şênber were rûniştandin. Ango pêwîst e ku avaniya bingehîn ji bo serkeftina wê pêngava şoreşger bigihêje asteke diyar.

"Ji bo şoreşan bingeheke şênber pêwîst e. Heger teorî nûnertiya pêkanîna pêdiviyan neke, şoreş jî di nava gel de pêk nayê. Têr nake ku raman, berê xwe bide çalakiyê; pêwîst e çalakî jî berê xwe bide ramanê." (Marks)

II.

MERHALEYA ŞOREŞÊ, MERHALEYA WERARÊ Û TEORIYA QEYRANAN

Marks, ji Engels re wiha nivîsiye: *"Dema ku geşedanên dîrokî yên mezin di meriyetê de bin, 20 sal ji rojekê jî hesêb nabin, lê paşê dibe ku hin roj werin ku 20 salên mezin jî di nava xwe de kom bikin."* (Lenîn, Taktîka Têkoşîna Çînî ya Proleteryayê, Çavkaniya Marksîzmê, rpl:44)

Marks û Engels, têkoşîna şoreşger a proleteryayê di du merhaleyan de dinirxînin. Merhaleyên **werar û şoreşê.**

Di herdu merhaleyan de jî taktîkên şoreşger ên proleteryayê cuda ne.

Merhaleya şoreşê, merhaleyeke demkurt e. Di vê merhaleyê de pergala civakî ya heyî serûbin dibe. Di vê merhaleyê de taktîka proleteryayê û pêşengên wê, êrîş e; di rojevê de tenê yek xal heye: SERHILDAN! Di vê heyamê de taktîka proleteyayê, parçekirina mekanîzmaya heyî ya dewletê û avakirina desthilata şoreşger a proleteryayê ye. Marks û Engels, ji ber pêngavên şoreşger ên Fransî û kevneşopiyên wê, navê **axaftina bi Fransî** li vê taktîkê kiriye. Li gorî Marks û Engels serhildan, huner e.

"Di roja me de serhildan, bi rastî jî hunereke şer e û heger were paşguhkirin, wê di encamê de wê partiya ku wê paşguh dike, tune bike... Heger mirov bi temamî ji encamên leyîstoka xwe ne amade be, divê bi serhildanê neleyîze... Heger serhildan carekê dest pê bike, wê ***bi cehdeke mezin û di çarçoveya êrîşê***

de *bimeşe. Çalakiya parastinê, tê wateya kuştina serhildaneke çekdarî... Weke ku hosteyê herî mezin ê polîtîkaya şoreşgerî Danton dibêje:* ***'êrîşbazî, êrîşbazî û dîsa êrîşbazî'.****"* (Friedrich Engels, Germany, Revolution and Counter-Revolution, International Publishers 1932, rpl:100) **(6)**

Weke ku tê dîtin bêyî ku şert û merc guncan bibin, divê kes bi şoreşê neleyîze. Lê heger riya şoreşê carekê vebe, ji bo kesên dudil jî tev li şoreşê bibin û dijmin nikaribe amadekariyê bike, pêwîst e ku hertim **êrîş** hebe û çiqasî biçûk bin jî serkeftin werin bidestxistin.

Di dema şoreşê de taktîka proleteryayê ev e.

Heta dema merhaleya şoreşê ya demkurt gelo peywira pêşengên proleteryayê çi ye; gelo peywira wan rûniştin û bendewarî ye? Bêguman peywir ne ev e. Marks û Engels di derbarê peywirên partiya proleteryayê yên di vê merhaleya demdirêj de wiha dibêjin:

"Taktîka proleteryayê di her merhale û kêliyên werarê de pêwîst e ku vê diyalektîka dîroka mirovahiyê ji ber çavan derbas bike: li aliyekî pêwîst e ku ji serdemên sekinandina siyasî, ango ji geşedanên aştiyane sûde werbigire û ji bo zêdekirina hişmendî, hêz û şerkeriya çîna pêşeng, bi gavên hêdî bimeşe; li aliyê din jî pêwîst e ku tevahiya vê xebatê li gorî armanca dawî ya çîna pêşeng sererast bike û bike ku çîna karkeran bîst salên mezin di nava xwe de vehewîne û di karên mezin de têrî biserxistina karên mezin bike." (Taktîka Têkoşîna Çînî ya Proleteryayê, Çavkaniya Marksîzmê, rpl:44)

Di nava vê pêvajoya demdirêj a têkoşîna şoreşger de pêwîst e ku li **hundir** li dijî oportunîzmê têkoşîneke mezin a bîrdoziyê were dayîn; pêwîst e hêz û hişmendiya çîna pêşeng were xurtkirin û ev çîn were perwerdekirin; li **derve** jî ji rêxistinkirina têkoşîna sendîkayan a proleteryayê heta li hemberî rêveberiya paşverû cihgirtina di eniya herî çepgir a artêşa demokratîk de û beralîkirina opozisyona siyasî, pêwîst e hemû cûreyên çalakiyan werin lidarxistin. Ji ber bilindbûna asta bîrdoziyê û teorîk a proleteryaya Almanî û ji ber behremendiya wê ya kişandina girseyên gel a nava refên xwe, Marks û Engels ji zimanê şoreşger ê vê merhaleyê re dibêjin **axaftina bi Almanî**. Weke ku tê dîtin, taktîkên proleteryayê li gorî merc û rewşên şênber teşe digirin. Dema ku şert û merc têne guhertin, taktîk jî diguherin.

Şoreşgerên proleter, li gorî cih û demê, herdu zimanan jî bi kar tînin. Marks, ji Ludwig bi bandor dibe û wiha dibêje: şoreşger, ew şervanên ku xwediyê "dilê Fransî û mejiyê Almanî" ne. Partiya proleteryayê jî ew rêxistina şerker e ku ji tevgereke herî biçûk a reformîst heta terora şoreşger her cûre çalakiyan di cih û demên xwe de dike rojeva xwe û li ser bingeha materyalîzma diyalektîk û dîrokî ava bûye.

Di nava tevgera şoreşê de di bingeha hemû jirêderketinên rastgir û "çepgir" de ev hene: taktîkên herdu merhaleyan tevlihev dibin; yan di merhaleya werarê de hewl didin bi Fransî biaxivin an jî di merhaleya şoreşê de hîn jî bi Almanî diaxivin an jî di herdu merhaleyan de jî zimanên xerab ên wê merhaleyê bi kar tînin. (Bi vegotineke din, sedema hemû jirêderketinan ew

e ku dualîbûna teoriya şoreşger an jî hêlek ji wê tê paşguhkirin an jî gelekî tê nepixandin).

Marks û Engels di hemû jiyana xwe de li dijî van herdu jirêderketinan têkoşîn meşandine. Kesên weke Blanquistan û Bakunin, bêyî ku mercên şênber pêk werin hewl dane bi Fransî biaxivin, bi vî awayî ji girseyan qut bûne û bi komployan hewl dane dest deynin ser desthilatê. Marks û Engels di hemû jiyana xwe de li dijî wan û li dijî Komunistên Tund ên Almanî yên ku Marks û Engels ew weke simyagerên şoreşê bi nav dikirin; li dijî reformîstên Proudhon û Lassalle û reformîstên Ingilîz û Almanî yên ku hewl didan têkoşîna siyasî ya proleteryayê bixin nava qadeke ku li gorî daxwazên sermayedariyê ye têkoşîna teorîk û bîrdoziyê meşandine û Sosyalîzma Zanistî jî di nava vê têkoşînê de teşe girtiye.

Diyardeyên ku merhaleyên werar û şoreşê diyar dikin çi ne? Qonaxên şoreşê bi pîşatan (tesaduf) ve girêdayî ye? Bêguman na. Zagonên şoreşan hene. Marks û Engels, merhaleya şoreşê bi **qeyrana şoreşgerî** ve girê didin. (Pêwîst e ku asta hişmendî û rêxistinê ya proleteryayê jî ji bo şoreşê têr bike).

Têgeha **qeyrana şoreşgerî** demeke dirêj li cem Marks û Engels jî ne zêde zelal bû. Ji ber vê nezalalbûna têgehên qeyrana şoreşgerî, Marks û Engels di şoreşên 1848'an de şaş bûne.

Di Sosyalîzma Zanistî de bernameya qeyrana şoreşgerî di nava xwe de qeyrana aborî, qeyrana civakî, qeyrana siyasî û qeyrana berdewamî dihewîne.

Weke ku meli jor jî diyar kiriye di Sosyalîzma Zanistî de teoriya qeyranan, heta pirtûka **Kapîtal**'ê ne zelal e. Marks û Engels di **Manîfesto**'yê de wiha dibêjin: *"Bes e ku em behsa qeyranên bazirganiyê bikin ku car caran derdikevin holê û hebûna civaka bûrjûwaziyê her kêlî bêtir dixin xetereyê".* (rpl:54) Ev qeyranên aboriyê, qeyranên dil ên aboriya bûrjûwaziyê ne ku her carê xetereya wan zêdetir dibe û wê heta dawiya jiyana aboriya bûrjûwaziyê berdewam bikin. Ev qeyran di heman demê de qeyranên civakî jî diafirînin. Lê ji bo ku şoreşek pêk were, hebûna van herdu qeyranan têr nake; ji bo ku mercên şênber ên şoreşê guncav bibin, pêwîst e ku li gel qeyrana aboriyê, qeyrana civakî jî kûr bibe **(7)** û qeraneke polîtîk jî hebe ku rêveberiya bûrjûwaziyê serûbin bike. (Qeyraneke wiha ya polîtîk, bi kûrbûna qeyrana civakî û hebûna qeyrana aboriyê ve girêdayî ye).

Heger ev hersê qeyran bi vî awayî negihêjin asta xwe ya jorîn, şoreş pêk nayê. (Ji bo şoreşê, pêwîst e ku mercên şênber ên şoreşê pêk werin.)

Marks û Engels di dema şoreşên 1848'an de têgeha qeyranên şoreşger bi kar tînin û qeyrana abaorî û qeyrana civakî ya ku kûr nabe jî di nava vê têgeha qeyrana şoreşger de ne. Marks û Engels, dema ku şoreşên 1848'an pêk hatin, gotin qey ew dema ku li bendê bûn êdî hatiye. Û difikirîn ku qeyrana ku derket holê, qeyrana **domdar û dawî** ya sermayedariyê ye. Di wan rojan de Marks û Engels hêvî dikirin ku bêyî ku paşdeketin û sekinandin çê bibe desthilata polîtîk dikare were bidestxistin û veguhertina civakî dikare pêk were. Di vê mijarê de Engels wiha dibêje:

"...ji bo me di wê demê de tu guman tune bû ku di nava wan mercan de êdî têkoşîna mezin dest pê kiriye û di vê heyama şoreşa tevlihev û demdirêj de (behsa şoreşa bênavber dike) pêwîst e ku bi encam bibe, lê wê di dawiyê de serkeftina proleteryayê pêk were." (Pêşgotina Li Fransayê Têkoşînên Çînî, rpl:12)

Û dîsa Engels bi dilekî vekirî dibêje ku di salên 1848-1850'yî de kesên ku weke wan difikirin şaş bûne:

"Dîrokê em û kesên ku weke me difikirin şaş derxistin. Dîrokê nîşan da ku li parzemîna Ewropayê rewşa geşedana aborî, ji geşedana ku rê li ber tunebûna hilberîna sermayedariyê veke, gelekî dûr e (...) Û careke din hate çespandin ku bîst sal piştî vê heyama ku em behsa wê dikin jî desthilatdariyeke çîna karkeran ne gengaz e." (rpl:16-18, her wiha bnr, Pêşgotina Ji Bo Çapa Ingilîzî ya Manîfestoyê, 1888)

Marks jî dibêje ku di salên 1850'yî de ji ber kêmasiyên mercên şênber, şaş e ku bendewariya şoreşeke proleteryayê hebe:

"Di nava bereketa ku mercên bûrjûwaziyê derfet dide de ji ber ku aramiyeke gelemperî ya ku tê de hêzên hilberîner ên civaka bûrjûwayê pêş dikevin, mirov nikare behsa ***şoreşeke rastîn*** *bike. Incex dema* ***ev herdu hêma, ango hêzên heyî yên hilberîner û şêweyên hilberînê yên bûrjûwaziyê bikevin nava rewşa pevçûnê*** *şoreşeke wiha dikare bikeve meriyetê... Şoreşeke nû incex piştî qeyraneke nû dikare çê bibe û hatina yekê çiqasî*

teqez be, hatina ya din jî ewqasî teqez e." (Li Fransayê Têkoşînên Çînî, rpl:159)

Marks dibêje ku di salên 1848-1850'yî de ji ber ku mercên şênber lawaz bûn, her pêngaveke şoreşgerî ya proleteryayê lawaz man û vemirîn:

"Her ku tevger ber bi serkeftinê ve çû, (proleteryayê) hewl da ku cihê xwe yê li pêş bigire, lê her carê bêtir lawaz bû û encamên ku bi dest xistin jî her carê lawaztir bû." (Darbeya Louis Bonaparte, rpl:28)

Piştî van gotinan **têgeha qeyrana şoreşger**, ji **Manîfesto**'yê bêtir zelal dibe. Weke ku Marks dibêje heta nakokiya di navbera taybetmendiya civakî ya hilberînê û xwedaniya taybet a amûrên hilberînê de negihêje asta **antagonîzmayê** (dijberiya di asta dijminahiyê de) û heta ku sermayedarî karibe hêzên hilberînê pêş bixîne, qeyranên demkî yên sermayedariyê nabin sedema şoreşekê. Aşkere ye ku pergala hilberînê, yekparebûneke diyalektîk e. Weke hemû yekparebûnên diyalektîk, di nava vê yekparebûnê de jî yekbûn, hevrebûn, cudabûn û dijberî hene.

Li aliyekî, di demeke diyar a dîrokê de têkiliyên hilberînê yên heyî li gorî hêzên hilberînê tevdigerin û wan bi ğêş ve dibin, lê li aliyê din jî di demeke din a dîrokê de dibin dijberê hêzên hilberînê û pêşketina wan asteng dikin; diyalektîka pergala hilberînê wiha ye.

Ji nakokiya di navbera hêzên hilberînê û têkiliyên hilberînê de hin pevçûn derdikevin holê. Di navbera hilberîn û xerckirinê de pevçûnên **aboriyê** rû didin; di navbera çînan de, di navbera

proleterya û kedkaran û bûrjûwazî û hin beşên bûrjûwaziyê de pevçûnên **civakî** derdikevin û di navbera proleterya û bûrjûwaziyê de ji bo hilweşandin û parastina dewlet û pergala bûrjûwaziyê, pevçûnên **siyasî** derdikevin holê.

Di kêliya şoreşê de ev nakokiyên sereke digihêjin lûtkeya xwe; ev hersê qeyran dibin yek û kûr dibin, ango qeyrana şoreşgerî dest pê dike. Incex wextê ku ev yek pêk were serhildan dikare bikeve meriyetê.

Marks dibêje ku ji bo ku li Fransayê (salên 1848-1850) têkoşîna çînî berfireh bibe û bikaribe bigihêje şoreşa Ewropayê (di wateya şoreşa cîhanê de) pêwîstî bi şerekî cîhanî heye ku hemû neteweyên Ewropayê werin himberî hev. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, şoreşa proleter a yekemîn a cîhanê pêk hat. Mirov li vê rastiyê binêre dikare bêje ku ev ramana Marks, berbêjiyeke (kehanet) mezin e, lê berbêjiyeke zanistî ye. (Lê tê zanîn ku Marks gotibû ku wê şoreş li Ingiltereyê dest pê bike û bi vî awayî wê şoreşa proleter li hemû welatên Ewropayê belav bibe. Ev berbêjî pêk nehat. Di vir de ya girîng ew e ku Marks çavdêrî kiribû ku wê şerekî cîhanî rê li pêşiya şoreşa proleter veke). Di vê mijarê de Marks wiha dibêje:

"Wê têkoşîna çînayetiyê ya di nava civaka Fransî de, weke ***şerekî cîhanî*** *ya ku tê de hemû neteweyên Ewropayê wê werin himberî hev berfireh bibe. Mirov dikare bêje ku belavbûneke li ser asta cîhanê, wê şerekî cîhanî bîne sere neteweya ku li ser bazara cîhanê serdest e, ango Ingiltereyê; lewra wê proleterya li vir serwer bibe. Şoreşa ku li wir hêj bi dawî nebûye û hêj di destpêkê de ye, ne şoreşeke demkurt e. Ev nifşê niha, dişibe*

Yahûdiyên ku Mûsa ew birin çolê. Ne tenê neçar in ku cîhaneke nû vebigirin, neçar in ku ji bo rê li pêşiya mirovên ku dikarin li pêşberî cîhana nû bisekinin vekin, xwe feda bikin." (Li Fransayê Têkoşînên Çînî, rpl:132)

Piştî ku Marks van gotinan dibêje bi 30 salî û beriya şoreşa pêşîn a proleter bi 30 salî, di 15'ê berfanbara 1887'an de Engels, ji bo şoreşgerên proleter ên piştî xwe, dema şoreşê radigihîne. (Tenê li Rûsyayê Lenîn û Bolşevîk li gorî vê hişyariya Engels tevgeriyan).

Engels di vê mijarê de wiha dibêje:

"...êdî ji bo Prûsya û Fransayê ji bilî şerekî cîhanî, şerekî din ne gengaz e û wê ev şer di ast û tundiyeke ku heta niha nehatiye xeyalkirin de be. Wê heşt heta deh milyon leşker hevdu qir bikin û ji keriyên kuliyan bêtir hemû Ewropayê bi kîneke mezin bixwun û daqurtînin. Wê wêranbûnên şerê sih salî, di 3-4 salan de pêk werin û wê ev wêranî belavî hemû parzemînê bibe; wê birçîbûn û nexweşî di nava artêşan û girseyên gel de bigihêjin asta herî bilind û êş û xetere wê hilweşandinekê ava bikin; wê pergala çêkirî ya ku me bi bazirgan,yê, pîşesaziyê û bankageriyê ava kiribû bi gelemperî têk biçe û di encamê de wê tevliheviya bêhevîbûneke mezin ava bibe; wê dewletên kevn û felsefeya wan a kevneşop wiha hilweşin ku wê bi dehan tac, li riyan bigindirin û wê ne pêkan be ku mirov zanibe wê kî bi ser bikeve; lê tenê encamek teqez e: bêzariyeke gelemperî û ***amadebûna mercan a ji bo serkeftina dawîn a çîna karkeran****.*

Dema ku pergala pêşbeaziya çekdariyê bigihêje asta herî bilind, wê rewş wiha be... Dibe ku şer me ji bo demeke derbasdar bi paş ve bixe û gelek mewziyên ku me bi dest xistine ji me biqetîne. Lê heger hûn ew hêzên ku dîsa hûn ê nikaribin wan kontrol bikin carekê vala bihêlin, dibe ku hertişt li gorî xwezaya xwe tevbigere: Di dawiya vê dramayê de hûn ê perîşan bibin û yan wê serkeftina proleteryayê pêk were yan jî wê jêneveger be."
(Lenîn, Sosyalîzm û Şer, rpl:172-173)

III.

TEORIYA QEYRANA DOMDAR Û ŞOREŞA DOMDAR

Di pêvayoja 1848'an heta payîza 1850'yî de perspeftîfa şoreşê ya Marks û Engels, şoreşa domdar e. Di encama nirxandina şaş a wê demê de ev nêrîna stratejîk derketiye holê. Marks û Engels li du qeyranên mezin ên 1847'an (qeyrana bazirganî û pîşesaziyê ya cîhanê û qeyrana çandiniyê yên 1847'an) nerîne û gotine qey ku êdî demên dawî yên sermayedariyê hatine, êdî têkoşîna mezin dest pê kiriye û serdema şoreşên sosyalîst dest pê kiriye. Ango Marks û Engels gotine qey ev qeyrana aboriyê ya sermayedariyê ya cîhanî ya 1847'an, **qeyrana domdar û dawî** ya pergalê ye. Ev teoriya şoreşa domdar, berhema qeyrana domdar e.

Di heyama 1847-1850'yî de Marks û Engels difikirîn ku wê li Fransa û Ewropayê di demeke nêz de şoreşa proleteryayê pêk were û dixwestin ku proleterya pêşengiya şoreşa derengmayî ya Almanyayê ya demokratîk a bûrjûwaziyê bike. Di vê demê de Marks û Engels di xebatên xwe yên teorîk û pratîk de giranî dabûn Almanyayê:

"Komunîst herî zêde bala xwe didin Almanyayê, ji ber ku ev welat di nava mercên pêşdetir ên şaristaniya Ewropayê de gelekî nêzîkî şoreşeke bûrjûwaziyê ye ku wê ji hêla proleteryê ya ji proleteryaya Ingiltereya sedsala 17'emîn û Fransaya sedsala 18'emîn pêşketîtir e ve were lidarxistin û ji ber ku ***şoreşa bûrjûwaziyê ya Almanyayê, wê bibe gava pêşîn a şoreşa***

proleteryayê ya ku wê piştî wê were.” (Marks-Engels, Manîfesto, rpl:91)

Weke ku tê dîtin Marks û Engels, ji bo Almanyayê **şoreşa domdar** pêşbîn dikin. Û ev şoreş, ne şoreşeke bê merhale ye, lê belê **şoreşa bi merhale** ye. Ev der gelekî girîng e. Lenîn, di dema emperyalîst de ev teorî xist meriyetê û cudahiya vê teoriyê û teoriya şoreşa domdar a Troçkîst ev e. Ji bo Almanyaya sala 1849’an ne tenê Marks û Engels şoreşeke domdar pêşbîn dikir. Gosttschalk û alîgirên wî jî şoreşa domdar pêşbîn dikir, lê şoreşa wan a domdar, şoreşeke bê merhale yan jî şoreşeke bi yek merhaleyê bû. **(8)** (Ev teorî, potansiyela şoreşger a gundiyan biçûk dibîne û hevalbendên proleteryayê napejirîne) Her wiha bi tundî li dijî pêşniyara şoreşa bi merhale (pêşî şoreşa bûrjûwaziyê, paşê şoreşa proleter) ya Marks derdiketin û digotin: *“Em ê çima xwîna xwe birijînin? Mîrze axaftvan (behsa Marks dikin), weke ku we jî kerem kiriye, ji bo ku em ji dojeha serdema navîn rizgar bibin... Gelo divê em ber bi aliyê sermayedariyê ve baz dabana?.”*

Gottschalk û alîgirên wî dixwestin desthilata şoreşger a proleteryayê demildest were avakirin û bi riya şoreşa domdar, derbasbûna komunîzmê pêk were. Li hemberî wan, Marks û Engels digotin ku peywira “şoreşa bê” ya Almanyayê ew e ku bermahiyên feodalîzmê werin paqijkirin û demokrasiya bûrjûwaziyê were kûrkirin û ne pêkan bû ku ji ser vê peywira dîrokî were qevastin.

Marks û Engels, şoreşa bi merhale pêşbîn dikir; li gorî vê yekê pêwîst bû ku proleterya, bûrjûwaziya lêberal deyne himberî

xwe, bi demokratên bûrjûwaziya biçûk re hevbendiyê ava bike û şoreşa derengmayî ya bûrjûwaziyê pêk bîne û bêyî ku bisekine pêwîst bû ku proleterya, şoreşê domdar bike û derbasî sosyalîzmê bibe. Li gorî vê teoriyê pêwîst bû ku bûrjûwaziya lîberal li derve were hiştin; lewra bûrjûwaziya lîberal tirsonek û lawaz e; ev bûrjûwazî, piştî bûyerên li Fransayê tirsiyane û wan bi feodalan re li hev kiriye û xiyaneta şoreşê kiriye. Ji ber vê jî pêwîst bû ku bûrjûwaziya lîberal li derve were hiştin û li dijî wê, şoreşa bûrjûwaziyê ya Almanyayê pêk were.

Wê ev şoreş, nebûba şoreşeke sosyalîst û wê bûba şoreşeke "komarparêz û civakî". Wê aristokrasiya feodal û herêmî hatiba hilweşandin; wê herkes bûba mafdarê dengdayînê; wê gundî ji rênçberiyê rizgar bûbana û wê demokrasiya bûrjûwaziyê hatiba kûrkirin. Lê wê xwedaniya taybet, mêtîngeriya sermayedar û têkoşîna di navbera çînan de berdewam bikirana. Her wiha bi qasî ku proleterya tev li rêveberiyê bibe, wê li gel xwedaniya taybet, xwedaniya dewletê jî hebûya. Ango wê di sererastkirina aborî û hilberînê de, mafê gotinê yê proleteryayê jî hebûya. Wê taybetmendiya çînî ya dewletê têkel bûya. Wê desthilatiya hevpar a karkeran, gundiyan û bûrjûwaziya biçûk a radîkal hatiba avakirin. Bi vî awayî wê mercên pêngava "demokrasiya sosyalîst" hatibana afirandin. Lê divê neyê jibîrkirin ku piştî li gundewaran xwedaniya feodal were tunekirin, bûrjûwaziya biçûk a demokratîk, wê hewl bide hilberîna (û xwdaniya) sermayedariya biçûk belav bike û hewl bide serweriya xwe ava bike. Ango wê hewl bide "di demeke herî zû de" şoreşê bisekinîne. Pêwîst e ku proleterya, vê derfetê nede bûrjûwaziya

biçûk û demildest partiya xwe ya serbixwe ava bike û şoreşê domdar bike.

"Demokratên bûrjuwaziya biçûk wê hewl bidin şoreşê di demeke nêz de bi dawî bikin. Heta ku hemû çînên xwedî mal ji desthilatê neyên dûrkirin; heta ku desthilata dewletê nekeve destê proleteryayê; ne tenê li welatekî, lê heta ku li hemû welatên sereke rêxistinên proleteryayê bi qasî ku rikberiya di navbera proleteran de bisekinînin, pêş nekevin û heta ku hêzên hilberîner, qet nebe hêzên diyarker nekevin destê proleteryayê, peywira me ew e ku em şoreşê domdar bikin." (Gotina Bi Riya Komîteya Navendî ya Ji Bo Lîgaya Komunîst a Marks û Engels, çavkanî Stalîn, Hêmanên Lenînîzmê, rpl:38)

Teoriya şoreşa domdar a Marks û Engels, a ku wê paşê di dema emperyalîst de bibe teoriya şoreşê ya Marksîzmê, ev e.

Em bala xwe bidinê, di nava teoriya şoreşa domdar a Marks û Engels de 4 hêmayên sereke hene:

1) Di encama teoriya qeyranên domdar de, teoriya şoreşên domdar derketiye holê. (Qeyrana domdar, nayê wateya qeyrana ku qut nabe. Ev tê wê wateyê ku carinan qut bibe jî, qeyrana mezin a sermayedariyê winda nabe. Ango sermayedarî di nava livînên mirinê de ye; carinan nexweşiya wê sivik dibe, lê ji nava livînan ranabe).
2) Teoriya şoreşa domdar, xwe dispêre nêzîkbûna şoreşa Ewropayê.
3) Teoriya şoreşa domdar, xwe dispêre wê ramanê ku gundiyên ku berê weke artêşa bûrjûwaziyê dihatin dîtin, êdî artêşa

proleteryayê pêk tînin. Ev teorî pêşbîn dike ku girseyên berfireh ên gundiyan, ne ji hêla bûrjûwaziyê ve, lê belê pêwîst e ji hêla proleteryayê ve li hemberî feodalîzmê werin bikaranîn. Ango di teoriya şoreşa domdar de dahûrandina Marksîst a potansiyela şoreşger a gundiyan heye.

4) Teoriya şoreşa domdar a Marks û Engels, xwe dispêre wê raman ku pêwîst e proleterya li Alamnyayê pêşengiya şoreşa bûrjûwaziyê bike û ev proleterya, bi alîkariya proleteryaya Ewropayê -bi taybetî jî proleteryaya Fransayê- nesekine û berê xwe bide şoreşa sosyalîst.

Bi kurtasî li gorî vê teoriyê pêwîst e ku potansiyela şoreşger a gundiyan rast were nirxandin û bi pêşengiya proleteryayê, ev potansiyel ji bo şoreşê were bikaranîn.

Di şoreşa domdar a Gottschalk û "Komunistên Tund" ên li dora wî de potansiyela şoreşger a girseyên gundiyan biçûk tê dîtin û diyarkeriya determînîzma aborî û civakî girîng nedihat dîtin (li gorî van kesan serdemeke dîrokî dikare neyê jiyîn). (Jirêderketina çepgir). Di teoriya şoreşa domdar a Trotçkî de jî ev raman heye. Weke ku em ê di beşên bê de jî bibînin hemû oprtunîst û pasîfîstên ku ne xwediyê inisiyatîfa şoreşger in, her tim di dirûvê de xwe bi proleteryayê ve girê didin, potansiyela şoreşger a girseyên gundiyan biçûk dibînin û hewl didin ji pasîfîzma xwe re rûpoşeke bîrdoziyê ava bikin.

Weke ku tê dîtin jirêderketinên "rastgir" û "çepgir", barekî giran datînin ser milê proleteryayê û şoreşgeriya gundiyan biçûk dibînin. Taybetmendiyên wan ên hevpar, ev e. (Ji ber vê yekê, di heyama Şoreşa Demokratîk a Rûsî ya 1905'an de, Trorçkî'yê

ku di eniya herî “çepgir” de xuya dikir, xwedî cewhereke menşevîk bû).

Weke ku me di destpêkê de jî diyar kiriye Marks û Engels, paşê dev ji vê teoriyê berdaye. (Piştî 1850’yî) Ji ber ku ev teorî, xwe dispêre teoriya qeyrana domdar a sermayedariyê. Lê di salên 1850’î de sermayedariyê hêzên hilberîner pêş xistine û di wateya bûrjûwayê de civak di nava aramiyê de bû. (Weke ku tê zanîn, di heyama emperyalîst de sermayedarî kete nava qeyrana domdar). Marks û Engels digotin qey qeyrana aboriyê ya 1847’an7 qeyrana “domdar û dawî” ya sermayedariyê ye; lê belê ev ne qeyrana domdar bû û ne qeyrana dawî ya sermayedariyê bû.

Di payîza 1850’yî de Marks û Engels fêm kirin ku ew şaş bûne. (Bnr, Beşa Duyemîn). Û gotin ku ev, qeyraneke derbasdar e. Sermayedarî hîn neketibû heyama qeyranên domdar û bênavber. Di salên piştî vê de Marks, giranî da mijara qeyranên sermayedariyê. Û qeyranên derbasdar ên sermayedariyê û qeyrana giştî ya pergalê di **Kapîtal**’ê de bi awayekî berfireh lêkolîn kirin. Marks, di Rexneya Aboriya Polîtîk de behsa cewhera qeyranên derbasdar ên sermayedariyê dike û dibêje ku ev qeyranên derbasdar “xwe dispêrin nizmbûna karê”; ev qeyranên derbasdar, zêdebûnên hilberîna zêde dimijin û bi vî awayî aboriyê sererast dikin; avaniya heyî derman dikin û piştî her qeyrana derbasdar, heyameke aramiyê dest pê dike. (Bnr. Kapîtal, cild 5, rpl:694-695).

Piştî van dahûrandinan ji ber asta geşedana sermayedariyê ya wê demê, Marks fêm kir ku (ji bo wê demê) ne gengaz e ku

qeyraneke domdar pêk were û dev ji vê teoriya şoreşa domdar berda. Û ev teorî, weke teoriyeke jibîrkirî, bi salan li qorziyekê ma. Heta ku sermayedarî kete nava heyama qeyranên domdar (ên giştî), ango merhaleya emperyalîzmê. Di nava vê demê de di teoriya şoreşa Marksîst de (hêla determînîst) hêla determînîzma aborî û civakî li pêş bû.

Lênîn di destpêka sedsala 20'emîn de dît ku sermayedarî di qadên aboriyê û polîtîk de weke hev pêş nakeve -ev zagon, dema ku rexneya aboriya polîtîk dike, di razberkirinên Marks de jî tê dîtin- û weke merhaleya herî bilind a sermayedariyê, teoriya **emperyalîzmê** derxist holê; Lenîn dît ku serdema qeyranên domdar û dawî ya sermayedariyê dest pê kiriye û got ku "ew kêliya têkoşînên mezin" a ku Marks û Engels li bendî wê bûn êdî hatiye û diyar kir ku teoriya şoreşê ya proleteryaya Rûsî, **teoriya şoreşa domdar an jî bênavber** e.

Partî û berdevkên Enternasyonala 2'yemîn û bi taybetî jî menievîkên ku baskê vê avaniyê yê Rûsî bûn, gotinên Marks û Engels ên ku digotin ew di mijara **şoreşa domdar** de şaş bûne, bi awayekî mekanîk şîrove kirin. Van kes û partiyan, nirxandinên Marks û Engels ên wê demê -yên heyama beriya yekdestiyê- yên ku digotin di nava van mercên dîrokî de qeyranên dîrokî yên sermayedariyê pêk nayên, bêyî ku rastiya di mercên heyama emperyalîst de sermayedarî ketiye heyama qeyranên domdar li pêş çavan bigirin, weke dogmayekê weke ku di binê her şert û mercî de derbasdar in, girtin dest. (Taybetmendiya neguherbar a oportunîzm û pasîfîszma rastgir e ku vê yekê wiha bigire dest).

Ev kes, dahûrandina şênber a rewşa şênber danîn aliyekî û bi çarlepkan xwe bi dozîneyên Marks û Engels ên ku di mercên dîrokî yên cuda de ji bo welatên cuda pêşbîn kiribûn -ên ku digotin wê şoreş li welatê ku li wê sermayedarî herî zêde pêş ketiye û dibe ku derbasbûneke aştiyane pêk were- ve girê dan. Lê sermayedarî, ne sermayedariya dema Marks û Engels bû. Êdî sermayedarî ketibû heyama qeyranên bênavber û heyama şoreşên proleter. Ev teoriya şoreşên bênavber ên ku di heyama beriya yekdestiyê de ji hêla Marks û Engels ve weke şaş dihate nirxandin, di heyama qeyranên bênavber a sermayedariyê de dibû teoriya şoreşê ya Marksîzmê.

IV.

TUNDIYA ŞOREŞGER Û DERBASBÛNA AŞTIYANE

Marks û Engels, bi gotina Lenîn xwe bi mijarên derbasbûna sosyalîzmê, ango bi mijarên teşeyê ve girê nedane. Wan, tenê zagonên gelemperî pêşbîn kirine. Li gorî van zagonan ji bo ku proleterya karibe zorbaziya bûrjûwaziyê hilweşîne, pêwîst e ku serî li **tundî û zora şoreşger** bide. Zor, bi gotina Marks, dike ku ji civaka kevn, civaka nû çê bibe. Li gorî Marks, tenê riyeke şoreşa civakî heye: *"...Incex di pergaleke ku tê de çîn û nakokiyên çînî tune bin de wê werarên civakî êdî nebin şoreşên siyasî. Heta wê çaxê, di berbanga guhertin û sererastkirina bi giştî ya civakê de wê gotina dawî ya zanista civakî ev be:* ***Yan têkoşîn an mirin, an şerekî bi xwîn an jî tunebûn****."* (Xizaniya Felesefeyê, rpl:195)

Lê ji bo ku li hemberî piralîbûna jiyanê nekevin nava dogmatîzmê, Marks û Engels bi awayekî sînordar behsa wê yekê kirine ku heger bi ajîtasyonên aştiyane mirov karibe bi leztir û ewlehîtir bigihêje armanca xwe, derbasbûna aştiyane pêkan e.

Marks û Engels, "derbasbûna sosyalîzmê ya bi riyên aştiyane" ji bo Ingiltere û Amerîkaya ku xwedî taybetmendiyên ji Ewropayê cudatir in, weke dibêtiyekê pêşbîn kiriye. Li gorî Marks û Engels, li van welatan taybetmendiyên derbasbûna aştiyane hene. Sermayedarî, li van welatan ji cihên din ên Ewropayê bêtir pêş ketibû. Proleterya, li van welatan -li Ingiltereyê- piraniya gelheyê pêk dianî û rêxistinbûna sendîkayan gelekî baş bû û li gorî deverên din ên Ewropayê, asta

çandî ya proleteryaya vî welatî gelekî bilind bû. Çîna sermayedar a van welatan, berjewendiyên xwe fêm kiribûn û xwedî kevneşopiyeke lihevkirinê bûn. Li gel van taybetmendiyan jî li van welatan dewleta bûrjûwaziyê, ango burokrasî û militarîzm, li gorî welatên din ên Ewropayê lawaztir bûn. Ji ber van sedeman, li Ingiltere û Amerîkayê proleterya, dikarîbû bi riya parlementoya bûrjûwaziyê, ango bi riya dengdayînê "sermayedaran bikire" û desthilatê bi dest bixe.

Marks, di gotareke xwe ya **nîsana 1851'ê ya rojnameya New York Tribune**'ê de di derbarê vê mijarê de wiha dibêje:

"Ji bo çîna karkeran a Ingiltereyê, mafê dengdayînê û desthilata siyasî têne heman wateyê. Proleterya, piraniya gelheyê pêk tîne. Li Ingiltereyê bidestxistina mafê dengdayînê, wê li Ewropayê ji navgîneke ku weke sosyalîst tê binavkirin gelekî zêdetir pêşketinê, angopêşketineke ber bi sosyalîzmê ve pêk bîne; di encama bidestxistina mafê dengdayîna giştî de, wê hegemonyaya polîtîk a çîna karkeran pêk were."

V.
"NETEWEYÎBÛN" Û ENTERNASYONALÎZM

Beriya ku em dest bi vê mijarê bikin, em behsa nêrînên Marks û Engels ên di derbarê vê mijarê de bikin.

Marks û Engels, dema ku dahûrandina şênber a rewşên şênber dikin, ji hêla hemû welatên sermayedar ve li şoreşa proleteryayê dinerin. Marks û Engels, rizgariya proleteryayê û kedkarên cîhanê, beriya hertiştî bi desthilata enternasyonalîzma proleter a li Ewropa û Amerîkayê -Enternasyonala 1'emîn- ve girê daye. Ew, hertim li dijî wê yekê derketine ku têkoşîna şoreşgerî di nava sînorên neteweyî de û di çarçoveya neteweyê de were sînordarkirin. Li gorî wan armanca têkoşîna şoreşgerî ya proleteryayê ew e ku sînorên ku ji hêla bûrjûwaziyê ve hatine xêzkirin werin xerakirin û enternasyonalîzma neteweyan pêk were; welatê proleteran tune ye, welatê wan enternasyonal e. **(9)**

"Proleter, li hemû welatan li dûv berjewendiyekê û li dûv heman berjewendiyê ne; li hemberî dijminekî û li hemberî heman dijminî ne; li hemberî şerekî û li hemberî heman şerî ne; gelek ji proleteran ji niha de ji pêşdaraziyên neteweyî rizgar bûne; hemû tevgerên wan, mirovî ne û li dijî neteweperestiyê ne. Tenê proleter dikarin neteweyê ji holê rakin." (Marks)

Lê ev nayê wê wateyê ku wê li her welatî, proleterya, di nava wan sînoran de şerê bûrjûwaziya xwe neke û desthilata xwe ava neke. Berovajî vê yekê, pêwîst e ku çîna karkeran a her welatî, beriya hertiştî li welatê xwe rêxistinê ava bike ku desthilatê bi

dest bixe; taktîkên xwe yên demkurt û demdirêj, li gorî mercên aborî, civakî û siyasî yên welatê xwe diyar bike, ango taktîkên xwe bispêre dahûrandinên hevgirtî yên avaniya civakî û nirxandina rast a şert û mercan.

Ji vê hêlê de têkoşîna çînayetiyê ya proleteryayê ne di hêla naverokê de, lê belê di hêla **teşeyê** de neteweyî ye.

Marks, ji ber ku mijarê di çarçoveyeke teng a neteweyî de digire dest, vê nivîsa ku bi bandora Lassale-perestan di **Bernameya Gotha** de derbas dibe rexne dike : *"Çîna karkeran dizane ku encama teqez a hewldanên hevpar ên karkerên hemû welatên hemdem, biratiya gelan a navneteweyî ye û ji bo rizgariya xwe beriya hertiştî di nava çarçoveya netewe-dewleta îro de xebatê dimeşîne"* û wiha dibêje:

"Berovajî Manîfestoya Komunîst û sosyalîzma beriya wê, Lassale, tevgera karkeran ji hêla herî teng a neteweyî ve fêm kiriye. Di pêşnûmeya bernameyê de ev riya Lassale hatiye şopandin û ev yek, piştî çalakiya Enternasyonal tê kirin!

Aşkere ye ku çîna karkeran, ji bo ku têkoşînê bimeşîne pêwîst e ku ***weke çînayetiyê*** *li welatê xwe bi rêxistin bibe û her welat, cuda cuda qada têkoşînê ya vê çînê ye. Ji vê hêlê ve têkoşîna çîna karkeran, neteweyî ye, lê ne ji hêla naverokê ve, weke ku* ***Manîfestoya Komunîst*** *jî dibêje 'ji hêla teşeyê ve' neteweyî ye".* (Rexneya Bernameyên Gotha û Erfurt'ê, rpl:36)

Marks û Engels, têkiliya enternasyonalîzm û "netewebûnê" bi vî awayî digirin dest.

VI.

ŞOREŞA PROLETERYAYÊ LI WELATEKÎ TENÊ YAN LI HEMÛ EWROPAYÊ?

Di heyama beriya yekdestiyê ya ku tê de derfet tune bû ku geşedana bêhevsengî ya sermayedariyê were dîtin de Marks û Engels, gotine ku ne pêkan e ku li welatekî tenê serkeftina şoreşê mîsoger bibe û piştî qeyraneke cîhanî, rizgariya hemû proleteryayên welatên sermayedar dikare bikeve meriyetê.

Marks dibêje ku ne pêkan e ku di nava sînorên teng ên neteweyî de şoreş were temamkirin û têkçûna proleteryaya Fransayê ya di pûşbera 1849'an de weke mînakekê diyar dike:

*"**Karker... digotin qey wê di nava sînorên neteweyî yên Fransayê de şoreşa proletertemam bikin.** Lê mercên hilberînê yên Fransayê, bi bazirganiya derve re, bi rewşa bazara cîhanî re û bi zagonên vê bazarê re hatine diyarkirin. **Fransa, bêyî ku têkoşîneke şoreşgerî ya ku tevahiya Ewropayê bixe nava xwe û li hemberî zorbazê bazara cîhanê Ingiltereyê bertekê nîşan bide bimeşîne wê çawa karîba van tiştan parçe bike?"*** (Li Fransayê Têkoşînên Çînî, rpl:48)

Weke ku tê dîtin di van salan de Marks, weke xala destpêkê ya şoreşa cîhanê -şoreşa Ewropayê-, **Ingiltereyê** dibîne. Li gorî Marks, ji bo ku qeyrana siyasî ya li Fransayê çareser bibe û proleterya rêveberiyê bi dest bixe, pêwîst e ku qeyraneke cîhanî pêk were û di dema vê qeyranê de li Ingiltereyê şoreşa proleteryayê pêk were.

"... Têkoşîna çînayetiyê ya di nava civaka Fransayê de, wê weke şerekî cîhanê yê ku tê de hemû netewe wê werin himberî hev, berfîreh bibe. Incex piştî şerekî cîhanî, proleterya li Ingiltereya ku neteweya serdest a bazara cîhanê ye, rêveberiyê bi dest bixe, wê çareseriyeke cîhanî pêkan be." (Karl Marks, Li Fransayê Têkoşînên Çînî, rpl:132)

Marks û Engels di navbera salên 1847'an û 1850'yî de digotin qey wê li Ewropayê şoreşa domdar pêk were, lê wan bi xwe jî got ku ew şaş bûne. Weke ku tê dîtin di salên 1850'yî de di teoriya wan a şoreşê de giranî ne li ser inisiyatîfa şoreşger e, lê belê li ser determînîzma aborî û civakî ye. Li gorî wan, wê şoreşa Ewropayê ji welatê ku tê de asta geşedanê ya hêzên hilberîner herî bilind e -ji welatê ku tê de mercên şênber herî zêde guncan e- ango ji Ingiltereyê dest pê bikira.

Marks û Engels di sala 1850'yî de li Ingiltereyê bi cih bûn û demeke dirêj bi vî çavî li Ingiltereyê nerîn. (Ev welat, weke xala destpêkê ya şoreşê hat dîtin). Lê piştî 1850'yî, tevgera karkerên Ingilîz, berê xwe da reformîzma bûrjûwaziya biçûk û çirava trade-union û di navbera karker û xwediyên kar de hêdî hêdî beşeke navîn, ango aristokrasiya karkeran ava bû. Marks û Engels dîtin ku ev aristokrasî, têkoşîna çînayetiyê li gorî daxxwazên sermayedariyê dimeşîne; ji ber vê yekê jî hêviyên xwe ji Ingiltereyê qut kirin û bala xwe dan parzemîna Ewropayê. Piştî ku li tevgera Komuna Parîsê karkerên Fransî bi awayekî hovane hatin çewisandin, Marks û Engels, hêviyên xwe bi têkoşîna li Almanyayê ve girê dan û serkeftinên li Almanyayê, weke destpêka şoreşa cîhanê dîtin.

Bi kurtasî Marks û Engels, şoreşa Ewropayê yekpare didît û li gorî wan wê şoreşa pêşîn a serkeftî ya proleteryayê, li welatekî Ewropayê yê ku tê de asta geşedana hêzên hilberîner bilind e, pêk bihata. Ango di teoriyên şoreşê yên Marks û Engels de giranî li ser determînîzma aborî û civakî ye; rista inisiyatîfa şoreşger di asta duyemîn de ye. Lê li gorî wan wê navenda şoreşê, ji rojava -ji Ingiltereyê- hêdî hêdî ber bi rojhilat ve hatiba û pê re jî wê girîngiya inisiyatîfa şoreşger zêdetir bûba. (Lê hêla determînîzma aborî û civakî, hertim diyarker e).

BEŞA DUYEMÎN

TEORIYA ŞOREŞÊ YA MARKSÎZMA DEMA EMPERYALÎST

I.

VEGUHERANDINA SERMAYEDARIYA RIKBER A BER BI SERMAYEDARIYA YEKDEST VE

Ji şerê Fransa û Prûsyayê û ji tevgera Komuna Parîsê heta destpêka sedsala 20'emîn, sermayedarî kete nava geşedaneke aştiyane. Em dikarin ji vê demê re bêjin, heyama aştiyane.

Di vê heyamê de sermayedariyê, hêzên hilberîner pêş xistin, di wateya bûrjûwaziyê de aramî pêk anîn û sermayedarî qelew kirin. Lê weke her hêzên ku xwe bi pêş ve dibe û xurt dibe, sermayedariyê jî di nava vê demê de lawazî û xerabûna xwe pêş xist û xurt kir. Ango ji aliyekî ve sermayedarî bilind dibû û ji aliyê din ve jî bi awayekî bilezûbez genî dibû, xwînmij dibû û ber bi yekdestiyê ve diçû.

Di vê heyamê de sermayedariya takekesî ji holê radibû; hêzên yekdest, kartel û şirîkatiyên yekdest li ser aboriyê serweriya xwe çê dikir û serweriya sermayedariya rikber a serbest, vediguherî desthilatdariya sermayedariya fînansê.

Lenîn, vê pêvajoyê di sê merhaleyan de dinirxîne (Lenîn, vê pêvajoyê ji sala 1860'î ve dide destpêkirin):

"...di dîroka yekdestiyê de merhaleyên diyar wiha têne xuyakirin: 1) Salên 1860 û 1880'yî yên ku tê de geşedana rikberiya serbest di lûtkeya xwe de ye: Di vê merhaleyê de hêzên yekdest, hêj di destpêka xwe de ne ku bi zorê têne dîtin. 2) Salên piştî 1873'yan yên ku tê de kartel gelekî pêş dikevin; lê hêj jî hejmara wan kêm e û sekenke wan a bi biryar û qewîn hêj tune ye; taybetmendiyeke derbasdar nîşan didin. 3) Pêşketina dawiya sedsala 19'emîn û heyama qeyrana 1900-1903'yan; di vê merhaleyê de kartel bi giştî dibin yek ji hêmayên sereke yên jiyana aboriyê û sermayedarî vediguhere emperyalîzmê." (Emperyalîzm, rpl:29)

Piştî qeyrana aboriyê ya salên 1857-1860'î, sermayedarî kete heyameke aramiya giştî (boom). Nûvedan û geşedanên zanist û teknîkê, kir ku sermayedarî bikeve nava pêvajoyeke pêşketin û bilindbûnê.

Sermayedariyê, nûvedanên dawî yên zanist û teknîkê anîn qada pîşesaziyê û ew pêş xistin; her wiha di kargehên mezin de hilberînên zêde kirin. Hilberîn, bi awayekî bilezûbez navendî bû û kom bû. Bankayan, karên xwe yên navbeynkariyê danîn aliyekî û veguherîn yekdestên mezin ên ku ew bixwe di qada aboriyê de razemeniyan dikin.

Kartel û şirîkatiyên yekdest, li ser jiyana aboriyê serweriya xwe çê kir û bankayan dest avêtin qada pîşesaziyê. Di encamê de hewldanên aboriyê yên biçûk û yên navîn ji holê rabûn. Bi riya pergala holdîngan, yekdestên mezin, bûn serwerên yekane yên aboriyê. Û bi vî awayî sermayedarî kete nava serdemeke nû, serdema sermayedariya fînansê.

"Hilberîn kom bû, ji vê yekê yekdest ava bûn û pîşesazî û banka ketin nava hevdu: dîroka sermayeya diravî û cewhera vê têgehê (têgeha sermayedariya fînansê) wiha ye." (Lenîn, Emperyalîzm, Merhaleya Herî Bilind a Sermayedariyê, rpl:60)

Di encama vê geşedanê de pêşketina bê hevsengî û qutber a sermayedariyê ya ku di heyama rikberiya serbest de zêde ne diyar bû, derket holê û gelekî diyar bû.

"Di pergala sermayedariyê de bi awayekî neçar hewldanên aboriyê, beşên pîşesaziyê û welatên cuda, ne weke hev û qutber pêş dikevin." (Heman berhem, rpl:77) Di encama vê geşedana newekhev de yekdest ava bûn û pê re di qada aboriyê de zêdebûna sermayeyê ya gelekî mezin ava bû. Sermayedarî, li gorî pîşesaziyê nikare çandiniyê pêş bixe û hilberîna ji bo kara zêde hertim kêmasiya xerckirinê -ji ber ku di nava girseyên gel de birçîbûn û xizanî zêde dibe- diafirîne. Ji ber vê yekê jî ev zêdebûn, ber bi welatên mêtîngeh ve hatin şandin. Polîtîkaya mêtîngeriyê ya ku xwe dispêre firotina malan, cihê xwe ji mêtîngeriya emperyalîst a ku xwe dispêre derxistina sermayeyê re hişt. Cîhan, ji hêla komeke biçûk a yekdestan ve hate parvekirin.

"Welatên ku sermayeyê derdixin derve, di wateya mecazî de cîhanê di nava xwe de par ve dikin. Lê sermayeya diravî, rê li ber wê yekê vedike ku cîhan, rasterast were parvekirin." (Heman berhem, rpl:83) Û hemû welatên cîhanê *"xelekên zincîra karên sermayeya diravî ya cîhanê pêk tînin."*

Dema ku ev tişt pêk dihatin nûvedanên di qada teknîk û zanistê de **(10)** mercên guncav ava dikirin ku cudahiyên astê yên

di navbera welatên sermayedar de werin girtin. Di nava mercên wiha de welatekî sermayedar ê ku paş de maye, bi geşedaneke pêngavî re xwe digihand welatekî pêşdetir û li gorû hevsengiya hêzên nû ya cîhanî, dixwest ku ev cîhan "bi awayekî dadwerî" were parvekirin. Di encamê de wê teqez şerên nû yên parvekiririna cîhanê dest pê bikirana.

Geşedana bêhevsengî û qutber a sermayedariyê ya di dema emperyalîst de, nakokiyên di navebra yekdestan de kûrtir û tundtir dikirin. Di encamê de di eniya empryalîst de qelş çê dibûn û di nava van qelşan de serkeftina sosyalîzmê pêkan dibû.

"Mirov dikare bi hêsanî fêm bike ku emperyalîzm, sermayedariya li mirinê ye û ji sosyalîzmê re riyên derbasbûnê ava dike; yekdestiya ku ji sermayedariyê derketiye û pêş ketiye, êdî mirina sermayedariyê ye. Û destpêka derbasbûna sosyalîzmê ye." (Lenîn)

Û êdî heyameke dîrokî bi dawî dibû. Dîrokê, rûpeleke nû vedikir. Ev rûpel, serdema şoreşên proleter bû. Êdî heyama "aştiyane" li paş dima. Êdî heyamek dest pê dikir ku tê de şoreşgerên proleter êdî ne tenê cîhan şîrove dikir, lê belê diguhert jî; êdî wê hertişt serûbinê hev bûbana û wê qeyranên domdar û gelemperî hatibana jiyîn.

Êdî ew dema ku "li bendê bûn" hatibû ku Marks û Engels digotin qey wê di salên 1840-1850'yî de dest pê bikira.

II.

XERAKIRINA “ORTODOKS” A MARKSÎZMÊ

Û

TEORIYA ŞOREŞA LENÎNÎST (I)

Rêxistina enternasyonal a dawiya vê dema ku tê de rikberî veguheriye yekdestiyê, Enternasyonala Duyemîn e. Di vê dema “aştiyê” ya ku tê de sermayedariyê di wateya bûrjûwa de aramiyê pêk aniye de, li Ewropayê partiyên Enternasyonala Duyemîn, di riyên parlementer de serkeftinên mezin pêk anîn. Bi taybetî jî partiya karkeran a Almanyayê serkeftinên mezin ên hilbijartinê bi dest xistin. (Li gelek herêmên hilbijartinê, ji sedî 50’yî zêdetir deng wergirtin.)

Di vê heyamê de weke hemû heyamên aştiyê, di eniya çepgir de tevgerên pasîfîst û rastgir mezin bûn. Serkeftinên parlementer ên ku hatin bidestxistin, kir ku hemû partiyên Enternasyonala Duyemîn ji ser hişê xwe ve biçin. Van partiyan, gotin qey wê rewş her tim wiha berdewam bike û xwe bi amadekariyên heyama şer re qet mijûl nekirin.

Stalîn, pasîfîzma Enternasyonala Duyemîn wiha rave dike:

“Ev heyam, heyameke wiha bû ku tê de sermayedarî bi awayekî aram pêş diket; nakokiyên aloz ên emperyalîzmê hêj bi awayekî aşkere dernediketin holê; grevên biarmancên aboriyê yên karker û sendîkayan, kêm zêde bi awayekî ‘asayî’ pêş diketin; têkoşînên hilbijartinê û komên parlementoyê, serkeftinên ku serê wan gêj dikir bi dest dixistin; pesindayîna

têkoşîna zagonî, dihate bilindkirin û pê bawer bûn ku wê sermayedarî, bi riyên zagonî têk biçe. Di vê heyamê de partiyên Enternasyonala Duyemîn xwe dikirin dermale û nedixwestin bi awayekî cidî di perwerdekirina girseyan a ji bo şoreşê de bifikirin." (Hêmanên Lenînîzmê, rpl:17)

Di salên dawî yên jiyana xwe de Engels, ev rewşa xerab dît û di derbarê reformîzma Enternasyonala Duyemîn de hewl da Wilhelm Liebknecht û Kautsky hişyar bike. Engels, di sala 1891'ê de di **Rexneya Bernameya Erfurt** de xeyalên pasîfîst û parlementer ên di derbarê "derbasbûna aştiyane" de bi zimanekî tund rexne kirin.

Lê hemû rexne û hişyariyên Engels, bê encam man; partiyên Enternasyonala Duyemîn, bêtir ketin çirava parlementerîzmê. Di salên 1900'î de, di destpêka serdema şoreşên proleteryayê de rewşa eniya çapgir a Ewropayê wiha bû.

Partiyên Enternasyonala Duyemîn di vê dema geşedana aştiyane ya sermayedariyê de di nava serxweşiya serkeftinên hilbijartinê de, ev heyama nû ya sermayedariyê qet fêm nekir. Wana got qey wê ev "heyama aştiyane" ya ku merhaleyeke derbasdar e, berdewam bike.

Van partiyan, dahûrandina şênber a rewşên şênber danî aliyekî; ji bîr kirin ku Marksîzm, rêbereke çalakiyê ye û di nava dîrokê dedewlemend û kûr dibe û pêşbîniyên Marks û Engels ên ji bo heyama beriya yekdestiyê, weke dogmayan nirxandin. Heta gotinên Marks û Engels ên ku ji bo mercên taybet anîbûn ziman, gelemperî kirin û ketin nava dogmatîzmeke giştî.

Van partiyan, li gorî rewşa xwe ya şênber, pêşniyarên Marks û Engels ên di derbarê heyama beriya yekdestiyê, ji hêla "ortodoks" ve parastin û ew cemidandin. Û ev dogmatîzm, ji bo xayintî û tirsonekbûna wan jî dibû rûpoşek. Van partiyan teoriya şoreşê, şêwazên xebatê û taktîkên ku Marks û Engels ji bo heyama geşedanê ya ku tê de hêzên hilberîner ên sermayedariyê hêj nû pêş diketin, ango ji bo "heyama werarê" pêşbîn dikirin, hewl dan ku di heyama qeyranên gelemperî, ango heyama şoreşên sosyalîst de bisepînin.

Gelo Marks û Engels negotibûn ku li welatekî û di nava sînorên teng ên neteweyî de şoreşeke proleteryayê pêk nayê? Gelo li gorî pêşniyarên Marks û Engels, wê li welatên sermayedar ên pêşketî de, şoreşa cîhanî "hemwext" pêk nehatiba? Gelo wê şoreşa pêşîn a proleteryayê, di welatê ku tê de hêzên hilberînê herî pêşketî ne, mercên şênber herî guncan in û demokrasî û asta çandî ya proleteryayê herî bilind in de dest pê nekiriba? Ji ber vê yekê jî hemû hewldanên şoreşger ên li welatekî ku asta geşedana hêzên hilberînê kêm e, weke têkçûnên pûşbera 1849'an û Komuna Parîsê, bi têkçûnê re wê rûbirû maba. Ji ber vê yekê jî pêwîst bû ku li bendî guncanbûna hêzên hilberînê mabana.

Van partiyan pêşbîniyên Marks û Engels ên di derbarê mercên cuda yên dîrokî derpêş dikirin, dogmatîk dikirin û pêşbîniyên wan ên ji bo rewşên "taybet" jî gelemperî dikirin. Marks digot ku li Ingiltereya ku piraniya gelheya wê proleter in, pêkan e ku şoreşa proleteryayê bi riyên aştiyane bigihêje serkeftinê. Lê van partiyan digotin ku ji bo pêkanîna

şoreşaproleteryayê pêwîst e ku piraniya gelheyê proleter bin. Li gorî van partiyan, wê proleterya bûba piraniya gelheyê û bi wergirtina piraniya dengan desthilatê bi dest bixin.

Partiyên Enternasyonala Duyemîn, di serdema şoreşên proleteryayê de Marks û Engels wiha şîrove dikriin.

Pasîfîstên Enternasyonala Duyemîn, wiha dogmatîk nêzîkî Marksîzmê dibûn, lê belê Lenîn Marksîzm weke rêbera çalakiyê dipejirand, dahûrandinên şênber ên mercên şênber dikirin û pêvajoya veguherandina sermayedariyê ya ber bi emperyalîzmê ve ji nêz ve dişopand. (Lenîn, pirtûka xwe ya bi navê **Emperyalîzm: Merhaleya Herî Bilind a Sermayedariyê** di sala 1916'an de nivîsî; lê hemû dahûrandinên Lenîn ên piştî sala 1900'î, xwe dispêrin dahûrandina rasterast a nakokiyên heyama emperyalîst.)

Li gorî Lenîn ev dem, ne dema Marks û Engels bû; sermayedarî êdî ketibû merhaleyeke nû. Êdî sermayedarî katibû pêvajoya qeyranên domdar û gelemperî û pêvajoya sekeratê. Lênîn, çavderiyeke rast li ser geşedana bê hevsengî û qutber a sermayedariyê ya ku di heyama yekdestiyê de bêtir aşkere bûbû kiribû û gihabû wê encamê ku tenê li welatekî jî serkeftina sosyalîzmê pêkan e:

"...geşedana sermayedariyê, di welatên cuda de ne weke hev dimeşe. Di pergala hilberîna metayan de ji vê pê ve çê nabe. Ji vir jî bi awayekî teqez ev encam derdikeve; li hemû welatan sosyalîzm di heman demê de nagihêje serkeftinê. Wê di destpêkê de li yak an jî çend welatan bigih^je serkeftinê; wê yên din jî heta

demekê di heyama bûrjûwaziyê yan jî heyama beriya bûrjûwaziyê de bimînin." (Bernameya Şer a Şoreşa Proleteryayê, Sosyalîzm û Şer, rpl:61)

Lênîn diyar dike ku *"zagona teqez a sermayedariyê ye ku geşedana aborî û polîtîk, ne di heman rêjeyê de ye. Ji vir ew encam derdikeve ku sosyalîzm, di destpêkê de li gelekî kêm welatên sermayedar, heta li tenê welatekî pêkan e"*. Û diyar dike ku pêşniyara *"wê şoreş li hemû welatan di heman demê de pêk were"* ya Marks û Engels, di heyama emperyalîst de kevn bûye. Li gorî Lenîn, partî û berdevkên Enternasyonala Duyemîn ên ku vê pêşniyara kevn a Marks û Engels bi awayekî dogmatîk dubare dikin, ji xizmeta bûrjûwaziyê pê ve tiştekî din nakin.

"Em bi hemû cûreyên wan kesan dizanin ku xwe zane dihesibînin û xwe weke sosyalîst nîşan didin û dibêjin ku heta ku şoreş li hemû welatan neteqe, em nikarin desthilatê bi têkoşînê bi dest bixin. Ev zilam nizanin ku bi van gotinên vala pişta xwe dane şoreşê û derbasî cem bûrj^wuaziyê bûne. Heger hinek li bendê bin ku wê çînên xebatkar, li ser asta navneteweyî şoreşê pêk bînin, ev tê wê wateyê ku wê hertişt di nava bendewariyekê de bisekine. Ev, tiştekî kelevajî ye." (Bnr. Çapa 4'emîn, cild:27, rpl:336, veguhêzerê Lenîn, Stalîn: Jirêderketinên Rastgir û Çepgir, rpl:220)

Li gorî Lenînîzmê êdî rêbazeke kevn e ku mirov weke mijareje geşedana hundirîn li şoreşa proleteryayê binêre û lêkolîn bike ku geşedana hêzên hilberînê têr dike yan na. Di heyama emperyalîst de li welatekî, mercên şoreşê bi asta geşedana hêzên hilberîner ve ne girêdayî ye. Ji ber ku

emperyalîzm, serxwebûna aborî hildiweşîne û aboriyên taybet ên neteweyî, dike xelekên zincîra aboriya cîhanê. Û ji bo tevahiya pergalê mirov dikare bêje ku li hemû welatan, mercên şênber ên şoreşê hene. Ji ber vê yekê jî şaş e ku mirov li bendê be ku şoreşa pêşîn a proleteryayê wê li welatê ku tê de sermayedarî herî zêde pêş ketiye û demokrasî û asta çandî herî bilind e. Pêşniyara Marks û Engels, ji bo heyama beriya yekdestiyê rast bû, lê di heyama emperyalîst de êdî kevn bûye. Û li gorî Lenînîzmê şoreşa pêşîn a proleteryayê wê ne li welatekî ku tê de sermayedarî û demokrasî pêş ketiye, pêk were; wê li welatekî ku zincîra emperyalîst tê de herî lawaz e, pêk were:

"Wê li cihê ku tê de zincîra emperyalîst herî lawaz e, eniya sermayeyê were qelişandin; ji ber ku şoreşa proleteryayê, encama şkandina zincîra emperyalîst a cîhanî ye û pêkan e ku ew welatê ku dest bi şoreşê bike û eniya sermayeyê biqelişîne, welatekî ku di warê sermayedariyê de ji welatên din ên pêşketî, kêmtir pêşketî be û di nava çarçoveya sermayedariyê de be." (Stalîn: Hêmanên Lenînîzmê, rpl:32)

Li gorî Lenîn, teoriya "derbasbûna aştiyane" ya partiyên Enternasyonala Duyemîn jî şaş e. Ji ber ku sermayedarî ketiye heyama sekeratê, burokrasî û milîtarîzm gelekî xurt bûne. Di heyama emperyalîst de tenê riyeke şoreşa civakî heye; ew jî "bi riya tundiyê", parçekirina "maşîneya burokratîk û leşkerî" ye. Dozîneya derbasbûna **aştiyane** ya ku Marks û Engels, ji bo Ingiltere û Amerîkaya beriya heyama yekdestiyê pêşbîn dikir, êdî kevn bûye û ne di meriyetê de ye.

Lenîn di vê mijarê de wiha dibêje:

"Îro... ev sînordarkirina Marx, ne derbsadar e. Weke Amerîkayê, Ingiltere jî, ev nûnerên herî mezin û dawîn ên azadiya Anglo-Sakson (tunebûna milîtarîzm û burokrasiyê) jî heta dawî ketin nava çirava tijî xwîn û gemar a Ewropayî û saziyên leşekrî û burokratîk ên ku her tiştî bi xwe ve girê didin û di binê giraniya xwe de difetisînin. Niha weke Amerîkayê, li Ingiltereyê jî 'şerta pêşîn a hemû şoreşên rastîn ên gel' (...) ***şkandin û parçekirina*** *'mekanîzmaya dewletê ya heyî' ye".* (Dewlet û Şoreş, rpl:52)

Di teoriya şoreşê ya Lenînîst de, li welatekî ku tê de çîna karkeran lawaz e û piraniya gelheyê ji gundiyan pêk tê, parçekirina zincîra emperyalîst, pêkan e. Di vir de tiştê sereke ew e ku hêza şoreşger a gundiyan, di binê rêveberiya proleteryayê û partiya wê de bikeve tevgerê.

"...Weke ku tê zanîn Lenîn, di têkiliyên proleteran ên li hemberî gundiyan de, bîrdoziya Marx temam kiriye û pêş xistiye." (G. Dimitrov, Di Pêşketina Partiyê De Merhaleyên Sereke, Ber Bi Komara Gel Ve, rpl:124)

Di teoriya Lenîn de rista vîna şoreşger (ji ber taybetmendiyên dema emperyalîst), ji teoriya Marx û Engels gelekî girantir e. Di heyama emperyalîst de ji ber ku bingehên şênber ên şoreşan amade ne, çareserkirina pirsgirêkê, ji pêngava dema guncav a vîna şoreşger re dimîne.

Di teoriya şoreşê ya sosyalîzma zanistî de her ku rista gundiyan zêde dibe û navenda şoreşê ber bi Rojhilat ve diçe, hêla volantarîst bêtir derdikeve pêş.

Ji ber ku xwesteka partiyên Enetrnasyonala Duyemîn a ji bo pêkanîna şoreşê tune bû, pirsgirêkeke wan jî tune bû ku hêza şoreşger a gundiyan beralî bikin û gundiyan tev li refên proleteryayê bikin. Wana şoreş taloqî demeke nediyar kiribû ku tê de wê piraniya gundiyan bibin proleter û piraniya gelheyê jî bibe proleter. Li gorî ramana "ortodoks" a Enternasyonala Duyemîn, pêwîst e ku mirov gundiyan di nava artêşa bûrjûwaziyê de binirxîne. Li gorî vê ramanê "gundî bi giştî, tenê hilberînerên xwarinê ne" û berjewendiyên wan û yên proleteryayê li dijî hev in. Oportunîzma Enternasyonala Duyemîn, bi hişmendiyeke "ortodoks" civakê dikir du eniyên dijber.

Pasîfîstên Enternasyonala Duyemîn, van dozîneyên xwe yên oportunîst tevan dispartin Marx û Engels. Wan qet fêm nekiribû ku di Marksîzmê de tiştê teqez çi ye. Bigotina Stalîn, ew, cewhera Marksîzmê, ango dahûrandina şênber a rewşên şênber danîbû aliyekî û Marksîzm cemidandibû.

Di salên destpêkê yên heyama emperyalîst de tenê Lenîn û Bolşevîkan cewher û gotinên Marksîzmê ji hev cuda dikirin, cewhera Marksîzmê diparast û li hemberî rastiyên jiyanê ew kûr û dewlemend dikir.

Lenîn di salên 1900'î de wiha digot:

"Em teoriya Marks, weke teoriyeke ku temam bûye û naguhere nabînin. Berovajî vê yekê, em difikirin ku vê teoriyê, tenê ***kevirên*** *sereke yên zanistê danîne; heger kesên sosyalîst naxwazin ku jiyan ji wan bibihure, pêwîst e ku ji her alî ve vê zanistê kûr bikin. Li gorî ramana me, ji bo sosyalîstan bi taybetî pêwîst e ku teoriya Marks, bi awayekî serbixwe bi kar bînin."*

III.
XERAKIRINA "ORTODOKS" A MARKSÎZMÊ
Û
TEORIYA ŞOREŞA LENÎNÎST (II)
TEORIYA ŞOREŞA BÊNAVBER A LENÎNÎST Û MENŞEVÎZM

Di destpêka sedsala 20'emîn de Lenîn dît ku sermayedarî veguheriye emperyalîzmê; li gorî Lenîn, ew *"kêliya têkoşîna mezin"* a ku Marks ji bo salên 1847-1850'yî pêşbîn dikir, êdî hatibû. Êdî *"li tevahiya Ewropayê, şerê di navbera bûrjûwazî û proleteryayê de di rojevê de ye"*. Û Lenîn, teoriya **şoreşa domdar** a ku Marks û Engels ji bo Alamnyaya sala 1850'yî pêşbîn dikir, weke teoriya şoreşa proleteryaya Rûsî radigihand.

Di navbera salên 1840-1850'yî Marks û Engels, di vê teoriya şoreşê de şaş bûbûn. Ji ber ku di qeyrana bazirganiyê ya sala 1847'an a cîhanî de wan gotibû qey ku sermayedarî ketiye heyama qeyranên giştî û domdar. Lê di wê serdemê de sermayedarî, di heyama xwe ya bilindbûnê de bû. Lewra ne pêkan bû ku li Ewropayê şoreşa proleter çe bibe. Ji ber vê yekê jî proleterya, pêşengiya şoreşa demokratîk a Almanyayê bike jî, ji ber ku li Ewropayê şoreşên hemwext ên proleteryayê tune bû, proleterya nikarîbû şoreşê domdar bike. Ji bo ku li Almanyayê, proleetrya ji merhaleya demokratîk a bûrjûwa, bêyî ku bisekine derbasî merhaleya şoreşa sosyalîst bibe, pêwîst bû ku

proleteryaya serkeftî ya ku li hin welatên Ewropayê desthilatê bi dest xistiye, alîkariya wê bike.

Lê belê di vê demê de (di heyama emperyalîst de) sermayedarî ketiye heyama qeyranên domdar. Ji bo ku proleteryaya Ewropayê were ser desthilatê, mercên şênber ji bo hemû pergalê guncan bûne. Ji ber vê yekê jî ev teoriya şoreşê ya ku Marks û Engels piştî salên 1856'an dev jê berdabû, di heyama qeyranên domdar û giştî yên sermayedariyê de, teoriya yekane û ya rast a proleteryaya welatekî ku nêzîkî şoreşa demokratîk a bûrjûwaziyê de ye yê weke Rûsyayê, ye.

Ango li gorî Lenîn, di destpêka sedsala 20'emîn de rewşa Rûsyaya Çarî, dişibiya rewşa Almanyaya salên 1840-1850'yî yên ku Marks û Engels li bendî şoreşeke Ewropayê bûn. Stalîn, ji bo vê yekê wiha dibêje:

"Tiştê ku hate serê Rûsyayê û Lenîn, di salên 1840-1850'yî de hatibû serê Almanyayê û Marx û Engels." (Hêmanên Lenînîzmê, rpl:15)

Dîsa Stalîn balê dikişîne ser gotinên Manîsfestoyê yên ku dibêjin "Şoreşa demokratîk a bûrjûwayê ya ku li Almanyayê pêk were, wê bibe destpêka şoreşa proleteryayê" û wiha dibêje:

"Pêwîst e ku mirov ji bo Rûsyaya destpêka sedsala 20'emîn de jî heman tiştan bêje; lê belê Rûsya, li gorî Almanyaya salên 1840-1850'yî di asteke bilindtir de ye. Pêwîst bû ku Rûsya vê şoreşê di çarçoveya Ewropayeke pêşketî de û bi proleteryayeke ji proleteryaya Almanyayê (Ingiltere û Fransa li aliyekî)

pêşketîtir pêk anîba; û her tişt nîşan dida ku wê ev şoreş, bibe heyvan û destpêka şoreşa proleteryayê.

Hîn di 1902'yan de, di rojên amadekirina şoreşa Rûsî de, Lenîn, di berhama xwe ya bi navê ***'Pêwîst e Çi Were Kirin?'*** *de paşerojê didît û wiha digot:*

'Dîrokê, peywireke lezgîn daye pêşiya me (ango Marksîstên Rûsî, J. Stalîn) ku di nava ***peywirên pêwîst e ku demildest bi cih werin*** *a proleteryaya welatekî de, peywira herî şoreşger e. Heger ev peywir bi cih were wê ne tenê keleha herî xurt a paşverûtiya Ewropayê hilweşe, her wiha wê keleha herî xurt a paşverûtiya Asyayê jî hilweşe û wê proleteryaya Rûsî, bibe pêşengê proleteryaya şoreşger a navneteweyî.' (c: 4, rpl:382)"*
(Hêmanên Lenînîzmê, rpl:15-16)

Ji ber ku Rûsyaya Çarî hemû dijberiyên ku gihane asta herî jor di nava xwe de kom dike, ango xeleka herî lawaz a zincîra emperyalîst e, wê proleteryaya Rûsî bibe pêşengê proleteryaya şoreşger a navneteweyî.

"Ji ber vê yekê pêwîst bû ku li Rûsyayê têkoşînek hatiba dayîn ku bi awayekî teqez dawî li nakokiyên emperyalîzmê bîne; ev, ne tenê ji ber wê yekê bû ku li Rûsyayê ev nakokî bi awayekî rezîl û nikarin werin rakirin dihatin jiyîn; ne ji ber wê yekê jî bû ku Rûsya, sermayeya diravî ya welatên Rojavayî bû û welatên Rojavayî bi mêtîngehên Rojhilatî ve girê dida; lê belê ji ber wê yekê jî bû ku ew hêza ku dikarîbû nakokiyên emperyalîzmê, bi riyên şoreşgerî çareser bike, tenê li Rûsyayê hebû. Lewra pêîst bû ku şoreşa Rûsyayê, bûba şoreşeke proleteryayê **(11)** *û her*

wiha ji roja pêşîn a geşedana vê şoreşê ve, pêwîst bû ku ev şoreş, xwedî taybetmendiyeke navneteweyî be û di encamê de emperyalîzmê ji bingeha xwe ve bihejîne." (Stalîn, Hêmanên Lenînîzmê, rpl:14)

Di encama xwezayî ya vê nirxandinê de wê proleteryaya Rûsî, du şerên cuda bi hev re meşandiba:

"Şerê di navbera bûrjûwazî û proleteryayê de, li tevahiya Ewropayê di rojevê de ye. Ev şer, ji zû ve gihaye Rûsyayê. Li Rûsyaya hemdem de hêzên ku naveroka şoreşê ava dikin, ne du hêzên ku di nava şer de ne, lê belê du şerên civakî yên heterojen û cuda ne. Şerê pêşîn, pêwîst e ku di nava pergala heyî ya otokratîk de were dayîn û xwe dispêre koledariyê; şerê din jî li pêş çavên me pêk tê û di nava pergala demokratîk a bûrjûwayê de cih digire. Yek ji van şeran ji bo azadiyê (azadiya civaka bûrjûwaziyê), demokrasiyê, ango ji bo serweriya teqez a gel û ji hêla gel ve tê meşandin; ya din jî bi armanca rêxistinbûna sosyalîst a civakê, têkoşîna çînayetiyê ye ku ji hêla proleteryayê ve li dijî bûrjûwaziyê tê meşandin.

Di vê demê de peywireke zehmet û giran li ser milên sosyalîstan e ku di heman demê de du şeran bidin meşandin ku ev şer, bi armancên xwe û ji hêla pêkhateyên hêzên civakî yên ku dikarin di têkoşînê de helwesteke teqez nîşan bidin ve bi temamî ji hev cuda ne." (Lenîn, Sosyalîzm û Kesên Gundî, Hevbendiya Karker û Gundiyan, rpl:15) **(12)**

Di berbanga şoreşa bûrjûwaziya Rûsî ya 1905'an de perspektîfa şoreşa bolşevîk, wiha bû. **(13)**

Mirov dikare taybetmendiyên cuda yên vê perspektîfê wiha rave bike:

1) Teoriya şoreşa bênavber a Lenînîst, di heyama sekeratê ya sermayedariyê de, teoriya şoreşê ye. Ev teorî, ne tenê ji bo Rûsyaya Çarî ya ku di destpêka qeyrana giştî ya sermayedariyê de ye derbasdar e, lê belê ji bo hemû welatên ku hêj neketine pêvajoya geşedana sermayedar û ji lewra jî nîv-mêtîngeh in jî derbasdar e.

2) Teoriya şoreşa domdar a Lenînîst, teoriya şoreşa domdar a Marks pêş xistiye û xwe dispêre beralîkirina potansiyela şoreşger a gundiyan a ber bi şoreşê ve. Û peywira proleteryaya ku dixwaze şoreşê domdar bike jî, fermandariya vê artêşê ye.

3) Ji bo ku li welatekî wekî Rûsyaya Çarî, şoreşa demokratîk a bûrjûwaziyê veguhere şoreşa sosyalîst, pêwîst e ku proleteryaya ku li Ewropayê bûye desthilat, alîkariyê bike.

Perspektîfa şoreşê ya **beşa menşevîk** a Partiya Karkeran a Demokratên Civakî ya Rûsî -ya ku baskê Enternasyonala Duyemîn ê Rûsî ye-, di encama hişmendiya şoreşê ya **fermî** ya Enternasyonala Duyemîn de bi temamî berovajî perspektîfa Bolşevîk bû.

Li gorî nêzîkatiya "ortodoks" a Enternasyonala Duyemîn, şoreşa pêşîn a proleteryayê, wê li welatê ku tê de sermayedarî û demokrasî herî zêde pêş ketiye û piraniya gelheyê proleter in, pêk were. Û şoreşa ku li vî welatî pêk were, wê belavî welatên din bibe. Bi vî awayî wê bi awayekî hemwext, şoreşa cîhanê pêk were.

Menşevîzm, li gorî vê hişmendiyê tevdigeriya û li gorî menşevîzmê, di salên 1900'î de mercên şênber tune bûn ku li ser asta cîhanî şoreşa proleter pêk were û ji ber ku piştî bidestxistina desthilatê, kadroyên rêveber ên proleteryayê ne amade ne, proleterya nikare pêşengiya şoreşa demokratîk a Rûsyayê bike. Heta ku ev merc ava bibin, pêwîst e ku bûrjûwaziya lîberal a Rûsı, şoreşa bûrjûwaziyê pêk bînin û proleterya jî piştgiriya vê yekê bike. Heta ku ew dema ku li bendê ne were "di nava mercên demokratîk ên bi şêwazê rojavayî de" proleteryaya Rûsî, bi riyên têkoşîna parlementer, dikare hêza xwe kom bike (xurt bike).

Teoriya şoreşa bolşevîkan (li gorî wan) tewş e û teoriyeke anarşîst e. Ev teorî, xwe dispêre şaşitiyên Marx û Engels ên salên 1840-1850'yî. Paşê Marx û Engels jî gotine ku di vê mijarê de ew şaş bûne û dev ji vê teoriyê berdane. Gelo Marks, di 1859'an de di **Pêşgotina Destekdayîna Rexneya Polîtîka Aboriyê** de bi ravekirina şoreşê, vê teoriyê mehkûm nake?

Proleterya, tenê dikare bi şoreşekê mijûl bibe; ew jî şoreşa wê ya resen e, ango şoreşa sosyalîst e. Ji bo vê yekê jî pêwîst e ku bûrjûwazî şoreşa xwe pêk bîne û hilberîna sermayedar pêş bixe. Bêyî ku hêzên hilberîner pêş bikevin; bêyî ku proleterya bibe piraniya gelheyê û bêyî ku pergal û civaka bûrjûwa li Rûsyayê serwer bibe, ne pêkan e ku desthilata proleteryayê pêk were.

Teoriya şoreşê ya ku Menşevîzm ji bo proleteryaya Rûsî pêşbîn dikir, wiha bû.

Herdu teorî jî, weke ku em ê di beşa bê de li ser bisekinin, bingeha hişmendiya partiyê û şêwazê xebatê ya partiyên bolşevîk û menşevîk pêk tînin.

Aşkere ye ku hêzên ku cîhanê cuda dinirxînin, wê amûrên cuda yên guhertinê bi kar bînin!

IV.
HIŞMENDIYÊN PARTIYÊ YÊN BOLŞEVÎK Û MENŞEVÎKAN

Teoriya şoreşa domdar a Lenînîst, ji bo welatekî ku tê de proleterya lawaz e, xwe dispêre wê yekê ku inisiyatîfa şoreşger, derfetên cuda -derfeta herî girîng, potansiyela şoreşger a gundiyan e- ji bo şoreşê bi kar bîne.

Taybetmendiya çînî ya merhaleyeke diyar a dîrokî û di vê merhaleyê de cudahiyên rista çînan, bingeha vê teoriyê pêk tînin. Di encama taybetmendiya volantirîst a teoriya şoreşger a Lenînîst de, ev cudahî derdikeve.

Di teoriyên şoreşê yên Marx û Engels de -ji ber mercên şênber ên wê demê- hêla determînîst a aborî û civakî, ji hêla volantirîst girantir e. di teoriya Lenînîst de polîtîka, ji aboriyê bêtir diyarker e. Ango inisiyatîfa şoreşger, bingeh e. (Lê ev nayê wê wateyê ku bi tena serê xwe diyarker e).

"Polîtîka, vegotina tîrbûyî ya aboriyê ye. Nabe ku di navbera polîtîka û aboriyê de mirov pêşekiya polîtîkayê nepejirîne. Fikirîna berovajî vê yekê, tê wateya jibîrkirina ABC'ya Marksîzmê." (Lenîn, cild:42, rpl:278, çapa Fransî)

Di teoriya şoreşê ya Lenînîst de giranî li ser inisiyatîfa şoreşger û polîtîkayê ye û ve yek, hişmendiya partiyê ya Lenînîst ava dike.

Li gorî Lenîn, du rêxistinên proleteryayê hene: rêxistina karkeran û rêxistina şoreşgeran.

"Rêxistina karkeran, beriya her tiştî divê rêxistineke pîşeyî be; heta ku jê tê divê ji veşartîbûnê dûr be û vekirî be. Li gel vê yekê rêxistina şoreşgeran divê wan kesan himbêz bike ku karê wan ên sereke beriya her tiştî çalakiya şoreşger be..." (Lenîn, Pêwîst e Çi Were Kirin?, rpl:340)

Li gorî vê hişmendiyê pêwîst e ku partiya proleteryayê, bi temamî ji şoreşgerên profesyonel pêk were. Partî, rêxistineke şer e ku ji şoreşgerên profesyonel pêk tê. Ev şoreşgerên profesyonel, *"hemû girêdanên xwe yên bi pergala heyî re qut kirine; ne tenê şevên xwe yên vala, lê belê hemû jiyana xwe dane şoreşê; ji teşegirtinên marksîst derbas bûne û di hin mijaran de berê xwe dane pisporiyê."* Û di destpêkê de di nava partiya ku ji şoreşgerên profesyonel pêk tê de cudahiya bingeha çînî nayê kirin: *"Li himberî taybetmendiya rêxistineke wiha,* ***di navbera karker û rewşenbîran de*** *û di navbera pîşeyan de her cûre cudahî divê werin* ***rakirin.*** *Aşkere ye ku pêwîst e ev rêxistin berfireh be û heta jê were, veşartî* ***be****".* (Lenîn, Pêwîst e Çi Were Kirin?, rpl:140)

Weke ku tê dîtin, di destpêkê de têkiliyên di navbera çînan de bi piranî objektîf in, ango têkiliyên bîrdoziyê ne. Bingeha pêşengiya partiyê, bîrdozî ye. Bi gotina Lenîn, tiştê ku di destpêkê de girîng e, ne ew e ku endamên partiyê karker an jî xwendekar bin; tiştê girîng ew e ku endamên partiyê şoreşgerên profesyonel bin. Divê rêxistina ku ji şoreşegrên profesyonel pêk tê, bi awayekî şênber, nûnertiya vîna şoreşger a proleteryayê

bike. Û wê hişmendî, bi riya vê rêxistinê, ji derve ve ji bo proleteryayê were veguhestin. Ji ber ku ev rêxistin, nûnertiya tevgera sosyalîst dike. *"Demokrasiya Civakî ya Şoreşger, nûnertiya Jakobenan dike ku bi rêxistina proleteryayê re (behsa rêxistina pîşeyî dike) bi awayekî xurt girêdayî ye."* (Lenîn)

Ev rêxistin, rêxistineke nîv-leşkerî ye. Ango di hêmana navendîbûna demokratîk de ne hêla demokratîk, lê belê hêla navendîbûnê li pêş e. (Ev yej, ji bo hemû welatên ku tê de demokrasiya bûrjûwayê tune ye derbasdar e).

"Hêmanên rêxistinbûnê yên Demokrasiya Civakî ya Şoreşger; li hemberî demokrasiyê, avaniya hiyerarşîk û li hemberî otonomiyê, navendîbûn e. Ev hêman, berovajî tiştên ku kesên berjewendîperest diparêzin in. Ji ber ku hêmana ku ev kes diparêzin dixwaze ji binî ber bi jor ve hilkişe, heta otonomî û demokrasiya herî dûr... Lê Demokrasiya Civakî ya Şoreşger ji ber ku têkoşîna desthilatê ji jor ve dest pê dike, li hemberî beşan, mafên rêxistina navendî û berfirehkirina desthilatê diparêze." (Lenîn, Gavek Ber Bi Pêş Ve, Du Gav Ber Bi Paş Ve)

Taybetmendî û bikêrhatina rêxistina partiyê ya ku Lenîn bi gotinên ***"Rêxistineke şer bidin me, em Rûsyayê serûbinê hev bikin"*** behsa wê dike, ev e.

Partiyeke ku li gorî hêmanên rêxistina şer ava bûye, ji bo ku karibe bibe rêxistina şer, pêwîst e girseyên berfireh ên proleteryayê bikişîne nava têkoşînê.

Ne pêwîst bû ku di destpêkê de karker, piraniyê pêk bînin. Ya girîng ew bû ku bingeha wan a çînî çi dibe bila bibe, rêxistin, ji

şoreşgerên profesyonel pêk were. Lê belê di merhaleya duyemîn de pêwîst e ku bi awayekî teqez, **karker**, piraniyê pêk bînin. **(14)** Lenîn, di 1902'yan de dibêje ku pêwîst e partî, bibe rêxistina kêmaran û teng were girtin; lê belê di 1905'an de dibêje ku pêwîst e di nava rêxistina partiyê de "bi sedhezaran karker" cih bigirin.

"Di Kongreya 3'yemîn de min anîbû ziman ku pêwîst e di Komîteyên Partiyê de, li hemberî 2 rewşenbîran, 8 karker hebin. Êdî dema vê jî derbas bû. Niha, di rêxistinên Partiyê de, li hemberî rewşenbîrekî ku bi Demokrasiya Civakî ve girêdayî ye, tê xwestin ku bi sedan karkeran Demokrat ên Civakî hebin." (Çavkanî: Clif, Rosa Luxemburg, rpl:58)

Incex wextê partî, bibe partiya siyasî ya girseyî ya proleteryayê, mirov dikare behsa rêxistinbûna partiyê ya şer bike. Û taybetmendiyeke dualî ya endamên vê rêxistina şer heye:

"Lenîn digot ku, pêwîst e avanî û avabûna Partiyê ji du beşan pêk were. a) Kadroyên bi rêkûpêk ên karkerên pêşeng ên partiyê yên şoreşgerên profesyonel; ango karkerên ku ji bilî xebatên partiyê, bi karekî mijûl nabin; karkerên ku xwedî zanebûn û serboriyên pêwîst bin û di şerê bi polîsên çar re de û di rizgarbûna ji destê wan de şareza bin; b) Tevna rêxistinbûna partiyê ya herêmî ya ku hezkirin û piştgiriya bi sedhezaran kedkarî bi dest xistiye û hejmareke zêde ya endamên partiyê." (SBKPT. Rpl:353)

Hişmendiya partiyê ya Bolşevîkan, wiha ye.

Teoriya şoreşê ya menşevîk, di navbera şoreşa proleteryayê û şoreşa bûrjûwaziyê de Benda Çînê ava dikir û pêngava şoreşger a proleteryayê taloqî demeke ne diyar dikir ku tê de li Rûsyayê sermayedarî û demokrasî pêş bikeve û proleterya jî bibe piraniya gelheyê. Ev nêzîkatî, xwe di mijara partiyê de jî dida der.

Li gorî Menşevîkan, çîna karkeran a Rûsî hêj lawaz bû. RSDİP ya ku bi awayekî veşartî hatibû avakirin jî hêj bi proleteran re bi awayekî zindî têkilî ava nekiribûn. Ev rêxistin, tenê ji rewşenbîrên ku "di hêmanan de nûnertiya karkeran dikin" pêk dihat. Ji ber vê yekê jî hêj nebûbû partiyeke rastîn a proleteryayê. (Weke ku tê dîtin hilmendiya menşevîk, weke şertekî derpêş dike ku di merhaleya pêşîn a rêxistinbûnê de karker, piraniyê pêk bînin).

Wê şoreşa bûrjûwaziyê, Lİ Rûsyayê zagonîbûneke diyar ava bikira û wê karkerên ku werin cem hev, sendîka, rêxistin û partiyên xwe ava bikirana. Peywira rewşenbîrên şoreşger jî tenê alîkariya avabûna vê yekê ye. Çênabe ku marksîstên ku şoreşa piraniyê, ango şoreşa sosyalîst biparêzin, têgeha partiya şoreşger a profesyonelan bi kar bîne. Ev têgeh ji hêla Jakobenên ku şoreşgerên şoreşeke kêmaran e û ji hêla şoreşegrên bûrjûwaziya biçûk ve tê bikaranîn. Ev yek, dibe ku bibe partiya Blanquistên komploger, lê belê nikare bibe partiya kesên ku dixwazin şoreşa piraniyê pêk bînin û şoreşê bispêrin girseyan. Ramana ku dibêje kesên ku ne proleter bin di binê navê şoreşgeriya profesyonel de dikarin nûnertiya proleteryayê bikin û wan zane bikin, berhema ramaneke ne marksîst e. **(15)**

Li gorî Mihrî Bellî, kesên ku di merhaleya pêşîn de proleteryayê zane û bi rêxistin bike, ne şoreşgerên profesyonel in. (Ji bo van tevan bnr. Mihrî Bellî, **Şoreşa Demokratîk a Neteweyî,** rpl:49-50-51-52)

Mihrî Bellî, wekî rewşenbîrekî sosyalîst (!), heta dawiyê bi dûv vê nêrînê de çûye. Ji ber vê yekê jî di tevahiya jiyana xwe de bi mijara zanekirin û rêxistinkirina proleteryayê mijûl nebûye; ji ber ku li gorî nêrîna wî ya ekonomîst, wê proleterya ji ber xwe ve zane bibe. Peywira sosyalîstên ku ne proleter in, ne ew e ku ji derve ve wan zane bikin.

Wê çaxê li gorî vê hişmendiyê, peywira sosyalîstên (!) weke Mihrî Bellî yên ku ne ji bingeha proleetr hatine ew e ku çînên şoreşger ên weke bûrjûwaziya biçûk ên derveyî proleteryayê zane û bi rêxistin bikin. Û Mihrî Bellî "sosyalîstek" e ku di hemû jiyana xwe ya polîtîk de ji bo pêkanîna vê peywirê bi dil û can xebitiye. Ji bo xebatên wî yên di vê mijarê de mirov li pirtûka wî ya bi navê **Nivîs** binêre, bes e.

Rêveberiya proleetryayê, rêveberiya herî demokratîk e. Partiya wê jî, partiya herî demokratîk e û bi awayekî herî demokratîk, ji jêr ber bi jor ve tê avakirin.

Di mercên azadiyê yên şoreşa bûrjûwaziyê ya 1905'an de, ne tenê karker, pêwîst e ku girseyên berfireh ên gel jî xwe di nava sowyetên "non-partîzan" de bi rêxistin bikin. Nûnêrên şaredariyên ku xwe bi rê ve dibin û rêxistinên karkeran, wê Kongreya Neteweyî ava bikin ku ev kongre, gava destpêkê ya "meclîsa avaker" e. Bi vî awayî wê mercên parlementer ên

bûrjûwayê yên rastîn, li Rûsyayê ava bibin û wê proleteryaya ku tev li hilbijartinên herêmî yên şaredariyên ku xwe bi xwe bi rê ve dibin, bibe û **gel** bikişîne cem xwe.

Hişmendiya rêxistina menşevîk ev e.

Weke ku tê dîtin ev herdu têgihiştinên cuda yên rêxistinê, encamên du têgihiştinên cuda yên şoreşê ne.

V.

ŞOREŞA 1905'AN Û ŞOREŞA GEL A DEMOKRATÎK A KU LENÎN EW PÊŞBÎN DIKIR

Taybetmendiyên şoreşa ku Lenîn pêşbîn dikir, wiha ne:

1) Di heyama emperyalîst de, lokomotîfa ku dîrokê bi pêş ve dibe, proleterya ye. Ji ber vê yekê bûrjûwaziya lîberal a Rûsî, ji dîrokê dûr ketine. Pêşengê şoreşa bûrjûwayê, heta dawiyê çîna yekane ya şoreşger, ango proleterya ye.

*"Proleterya, li gorî taybetmendiya xwe ji ber ku **çîna** herî pêşverû û çîna yekane ya hevgirtî û şoreşger e, pêwîst e ku li Rûsyayê, di tevgera şoreşger a demokratîk de rista sereke bileyîze."* (Biryara Kongreya 3'yemîn a RSDİP'yê, Du Taktîk, rpl:80)

2) Hêzên sereke yên şoreşa gel a demokratîk karker in, gundî ne û bûrjûwaziya biçûk a bajarî ye.

*"...Hêza yekane ya ku li ser Rûsyaya Çarî karibe serkeftina teqez pêk bîne, **gel** e; ango -heger em **hêzên sereke yên mezin** negirin dest û bûrjûwaziya biçûk a bajarî û gundî jî di nava van **hêzên sereke** de belav bikin (ji ber ku bûrjûwaziya biçûk jî "gel" e)- proleter û gundî ne."* (Lenîn, Du Taktîk, çapa 2'yemîn, rpl:58)

3) Yekitiya hêzê ya sereke ya şoreşger, hevbendiya karker û gundiyan e.

Em hinekî behsa vê mijara hevbendiya karker û gundiya bikin. Lenîn, dahûrandina herêma **gundewar** a Rûsyaya Çarî dike û polîtîkaya şoreşger wiha diyar dike:

"Di rastiyê de bi armancên xwe yên nêz û dûr, li pêşberî me sê çînên cuda yên civakî hene; xwediyên zeviyên mezin, gundiyên dewlemend -û gundiyên navîn- û proleterya. Di rewşeke wiha de pêwîst e ku du aliyên peywira proleteryayê hebin... Pêwîst e ku bi bûrjûwaziya gundan re, li dijî her cûre hişmendiya koledariyê û feodalên çandiniyê be û bi bûrjûwaziya bajaran re, li dijî bûrjûwaziya gundan û hemû hêmayên bûrjûwaziyê be; proleteryaya gundan û ramangerên wan ên Demokratên Civakî, pêwîst e vê 'xeta siyasî' bişopînin!." (Proleterya û Gundî, Hevbendiya Karker û Gundiyan, rpl:10)

Û Lenîn ji gundiyên xizan û proleteryaya çandiniyê re diyar dike ku, ew ê bi şoreşê rizgar bibin û rêxistina wan, partiya proleteryayê ye:

"...RSDİP, partiya çîna karkeran e û di riya rêxistinbûna serbixwe ya proleteryaya gundî de, bêyî ku biweste, dixebite; tu carî ji bîr nake ku peywira wê ew e ku ji proleteryaya çandiniyê re nakokiyên di navbera wê û berjewendiyên bûrjûwaziya gundan de rave bike û diyar bike ku incex bi têkoşîna hevpar a proleteryayên bajar û gundan a li hemberî tevahiya civaka bûrjûwayê, bi pêkanîna serkeftina şoreşa sosyalîst hemû girseya gundiyên xizan dikare ji xizaniyê û mêtîngeriyê bi rastî rizgar bibe." (Heman berhem, rpl:13)

Piştî van dahûrandinên Lenîn, mijara hevbendiya karker û gundiyan a Şoreşa Gel a Demokratîk a Rûsî, bêtir ronî dibe. Hevbendiya karker û gundiyan, him di nava partiyê de him jî li derveyî partiyê ye.

Di nava partiyê de hevbendiya proleteryaya bajar û gundan û hêmayên nîv-proleter û gundiyên xizan heye. Hevbendiya bi gundiyên navîn û yên dewlemend re jî li derveyî partiyê û li ser bingeha çînên cuda wê were kirin. Bi vegotineke din, wê ev hevbendî, di navbera partiyên çînî yên herdu aliyan de were kirin. **Wê şoreş, di encama yekitiya hêzê ya partiya karker û gundiyan de pêk were. Lê di vê hevbendiyê de proleterya, di asta serweriyê de ye. Partiya ku vê hevbendiyê beralî dike û di nava şoreşê de serweriyê ava dike, partiya çînî ya proleteryayê ye.**

Lenîn di vê mijarê de wiha dibêje:

"Drûşmeya me ya taktîkî ya ku di Kongreya 3'yemîn a RSDİP'yê de formûle bû û drûşmeyên bûrjûwaziya komarparêz, di nava hevsengiyekê de ne. Ev bûrjûwazî û bûrjûwaziya biçûk, hêj li Rûsyayê partiyeke mezin a gel ava nekiribû. Lê heger hinek gumanê ji hebûna hêmayê vê partiyê bikira, wê ev yek hatiba wê wateyê ku ji tiştên ku niha li welat pêk tên, tiştekî fêm nekirine. Armanca me ew e ku (heger şoreşa mezin a Rûsî serkeftî bibe), em ne tenê proleteryaya ku ji hêla Partiya Demokrat a Civakî ve hatine birêxistinkirin, bi rê ve bibin, lê belê armanca me ew e ku em bûrjûwaziya biçûk a ku dikare li kêleka me bimeşe jî bi rê ve bibin." (Du Taktîk, çapa 2'yemîn, rpl:46)

WÊ ŞOREŞ, JI BAJARAN BER BI GUNDEWARAN VE BIMEŞE

Zorbaziya Çarî, di encama serhildana proleteryaya çekdarî ya li bajarên mezin de hilweşiya. Û şoreş -ji jor ber bi jêr ve- ji bajaran, ber bi gundewaran ve hate birêxistinkirin.

Lenîn wiha dibêje:

"Ji ber ku ev tevger, ji niha de gihaye pêwîstiya serhildaneke çekdarî:

Ji ber ku wê di vê serhildana çekdarî de proleterya, rista herî çalak bileyîze û wê tevlêbûna proleteryayê çarenûsa Şoreşa Rûsyayê diyar bike;

Ji bo çekdarîkirina proleteryayê û di heman demê de ji bo amadekirina serhildana çekdarî û plansaziyên rêbertiya rasterast a vê serhildanê, pêwîst e ku amadekariyên herî çalak werin kirin û bi vê armancê, heger pêwîst bike, komên milîtanên partiyê yên taybet werin avakirin." (Du Taktîk, rpl:80-81)

Li gorî Lenîn, wê di vê serhildanê de proleterya, rista sereke bileyîze û wê ev şoreş, di encama serhildana hêzên milîs ên karker û artêşa karkeran (Artêşa Sor) de bigihêje serkeftinê. Lê ji bo serkeftina çîna karkeran, piştgiriya gundiyan pêwîst e.

DESTHILATA KU WÊ WERE AVAKIRIN, WÊ BIBE DESTHILATA HÊZÊN SEREKE;

ZORBAZIYA ŞOREŞGER A KARKER Û GUNDIYAN

"Serkeftina teqez a şoreşê ya li hemberî Çarî'yê; zorbaziya şoreşger a proleteryayê û gundiyan e." (Lenîn, Du Taktîk, rpl:58)

Li vir em li ser mijareke gelekî girîng bisekinin: Xwendekarekî ku **Du Taktîk**'ê bi baldarî bixwîne wê bibîne ku, Lenîn, gundiyan û bûrjûwaziya biçûk a bajaran, carekê tenê di nava hêzên sereke de tîne ziman. Û li derveyî vê, weke hêza sereke, hertim behsa proleteryayê dike.

Her wiha Stalîn di **Hêmanên Lenînîzmê** de, ji bo merhaleya şoreşa demokratîk, weke hêza sereke tenê behsa proleteryayê dike û gundiyan jî weke hêza şûngir bi nav dike.

Gelo Lenîn, di wê beşê de gundiyan û bûrjûwaziya biçûk, bi xeletî xistin nava hêzên sereke? Yan jî pênûsa wî şaş bû?

Bêguman, na. Di navbera formulasyona Lenîn a wê beşê û formulasyonên din ên ku ji hêla wî û Stalîn ve hatine kirin de lihevnekirinek an jî nakokiyek tune ye; lihevkirineke temam û wekheviyek heye.

Mijar wiha ye; şoreşa demokratîk a gel a ku bûrjûwaziya biçûk a gund û bajaran jî di nava hêzên wê yên sereke de ye, wê bi serhildana gel a çekdarî ya li bajaran bigihêje serkeftinê. Wê di vê serhildanê de proleterya, weke **beşdara çînî** rista herî çalak bileyîze. Wê proleterya, girseyên gel bikişîne cem xwe û di

encama serhildana çekdarî de şoreşa gel a demokratîk pêk bîne û bi vî awayî wê zorbaziya şoreşger a karker û gundiyan ava bibe.

Weke ku tê dîtin hêza girseyî ya sereke ya şoreşê, çîna karkeran e. Rista gundiyan a di şoreşê de, di asta duyemîn de ye.

"Prolterya, hêza sereke ye, gundî jî hêza şûngir in", ji ber ku navenda şoreşê bajar in û di encamê de proleterya, hêza sereke ya girseyî ya şoreşê ye, Lenîn û Stalîn gihane vê formulasyonê.

Heman rewş, di formulasyonên Mao yên bicihbûna çînan ên Şoreşa Nû ya Demokratîk de jî hene. Di Şoreşa Nû ya Demokratîk a Mao de carinan tê gotin ku "hêza sereke gundî ne", carinan jî tê gotin ku "hêza sereke karker in, gundî ne û bûrjûwaziya biçûk e". Di nêrîna pêşîn de weke nakokiyê xuya dike, lê belê ev formulasyon, weke formulasyona Lenîn, ne nakok e. Dema ku Mao dibêje "hêza sereke gundî ne", bêguman rista bûrjûwaziya biçûk a bajaran û bi taybetî jî rista proleteryayê ya di şoreşê de biçûk nabîne.

Ji ber ku şerekî gel tê meşandin û ji gundewaran, ber bi bajaran ve diçin, şoreş wiha hatiye formulekirin; ango navenda şoreşê cuda ye. Ji ber ku li gundewaran, girseya gel gundî ne, hêza sereke ya girseyî ya şoreşê jî, gundî ne. Ji ber ku hêza sereke ya girseyî ya şoreşê, gundî ne, formulasyona "proleterya, hêza pêşeng e; gundî, hêza sereke ne" tê kirin.

Cudahiya di navbera Şoreşa Demokratîk a Gel a Rûsî û welatên mêtîngeh û nîv-mêtîn geh de, wiha ye.

Ev cudahî, gelekî girîng e. Nêzîkahiya şoreşê, hişmendiya rêxistinê û şêwazê xebatê ya di navbera herdu formulasyonan de ji bingeha xwe ve cuda ne. Ev cudahî, ne cudahiyeke jirêzê yan jî cudahiyeke di asta duyemîn de ye; lê belê hêmaya **sereke** ye ku xeta me ya bîrdozî, polîtîk û çalakiyê diyar dike. (Em ê di beşên bê de li ser vê mijarê bi awayekî berfireh bisekinin).

Formulasyona şoreşa domdar a di **Du Taktîk'ê** de heye, ji bo Tirkiyeya ku di binê dagirkeriya emperyalîzmê de ye jî tê pêşbînkirin. Doktor Hikmet Kivilcimli, bi awayekî aşkere hewl dide ku formulasyona **Du Taktîk'ê** li gorî taybetmendiyên çînî yên Tirkiyeyê bixe meriyetê.

Em li dahûrandinên Hikmet Kivilcimli yên ku di pirtûkên xwe de dike dinêrin û digihêjin vê encamê. Di pirtûkên Hikmet Kivilcimli de:

1) **Pêwîst e ku di Partiya Karkeran de, karker piraniyê pêk bînin. Her wiha li derveyî partiya çînî ya proleteryayê, pêwîst dike ku partiyeke gundiyan jî hebe.**

   Di vê mijarê de Dr. Kivilcimli wiha dibêje:

   "Partiya Gel, hêj ji wê yekê gelekî dûr e ku bibe Partiya Gundiyan." (Planên Şerê Gel, rpl:19)

   "Lê belê heta ku di nava rêxistina TİP'ê ya ku ji bajaran heta hin navçe û gundan belav bûye û rêxistinên şûngir ên TİP'ê de gelek hemwelatiyên karker cih negirin û piraniyê pêk neynin û bi awayekî çalak, venêrînê bi dest nexin, Partiya Karkeran jî hêj ji wê yekê dûr e ku bibe PARTIYA PROLETERYAYÊ." (Heman Berhem, rpl:19)

"Pêwîst e ku di nava rêxistinê de em bikin ku hejmara endamên çîna karkeran zêdetir be." (Oportunîzm Çi Ye?, rpl:11)

2) **Bajar, weke qada sereke ya têkşîna şoreşgerî tê hilbijartin û di encama vê de di bicihbûna çînan de proleterya weke hêza sereke tê diyarkirin û rêbertiya wê ya çalak (ne ya bîrdoziyê) tê parastin.** (Ango weke tevlêbûna çînayetiyê, proleter, dibin hêza sereke ya girseyî ya şoreşger). (Bnr: Planên Şerê Gel, rpl:188-189)

Lê belê teoriya şoreşê ya marksîst-lenînîst, ji nirxandinên di nava **Du Taktîkê** de û heya roja me ya îro, li hemberî hin guhertinên jiyanê, rastî guhertinan hatiye û bi serboriyên nû, dewlemend û kûr bûye. Ev dema ku em tê de ne, ne heyama destpêka qeyrana sermayedariyê ye. Tirkiye jî ne weke Rûsyaya Çarî, ya ku yek ji 5-6 welatên mêtînger ên cîhanê ye; berovajî vê yekê Tirkiye, di binê dagirkeriya emperyalîst de ye û nîv-mêtîngeh e.

Heger hinek rabin û teoriya şoreşa domdar a marksîst-lenînîst, bi formulasyona **Du Taktîk**'ê sînordar bikin; wê weke mînakeke ku ji bo hemû deman derbasdar e bigirin dest û hewl bidin wê li ser taybetmendiya çînî ya welatekî bimeşînin; weke ku em ê di beşên bê de jî bi awayekî berfireh binirxînin, wê ew kes, bikevin nava jirêderketina rastgir.

Mihrî Bellî jî nêzîkî farmulasyona Lenîn a di **Du Taktîk**'ê de dibe. (Mînak; partiya CHP'yê weke partiya gundiyan û Ecevit jî weke serokê gundiyan dinirxîne û hwd.)

Lê belê bi rastî jî gelekî zehmet e ku mirav Mihrî Bellî li cihekî bide rûniştandin. Ji ber ku xeteke wî ya diyar û bergeheke wî ya hevgirtî tune ye. Carinan dibêje ku mirov pêşengiya çîna karkeran, weke rastiyeke teqez binirxîne, wê ev yek bibe dogmatîzm û carinan jî pêşengiya çîna karkeran, weke pêşengiyeke çalak dinirxîne. Dîsa di hin nivîsên xwe de dibêje ku di nava mercên demokrasîbûna Filipînê de nabe ku partiya proleteryayê were avakirin û di nivîseke xwe ya din de jî kesên ku heman tiştan tîne ziman, bi rehetî bi oportunîzmê tawanbar dike. Di nivîseke xwe de nivîsa şoreşgerekî ku dibêje di merhaleya Şoreşa Demokratîk a Neteweyî de pêşengiya bîrdoziyê ya çîna karkeran bingeh e, şaş nîşan dide û bi fen û fûtan wê encamê derdixe ku hinek hewl didin ku bêyî ku çîna karkeran hebe şoreşê pêk bînin; û li aliyê din jî bi rehetî dibêje ku bêyî ku çîna karkeran hebe jî di binê rêbertiya bûrjûwaziya biçûk de şoreşek dikare were lidarxistin!...

Mirov dikare gelek mînakên din jî bide.

Bi kurtasî, ne diyar e ku Mihrî Bellî çi dibêje. Yekane tiştê diyar ew e ku, ew kesekî nediyar e. Mihrî Bellî, ji xwe pê ve ji kesekî û tiştekî bawer nake (Sosyalîzma Zanistî û avakarên wê jî tê de); ew, "sosyalîstekî" ku "kerametê di xwe de dibîne" ye.

Ew, "siyasetmedarekî reel" e ku bi dûv hesabên biçûk de diçe. (Di wateya bûrjûwa de siyasetmedarekî rastbîn e). Û weke her siyasetmedarên reel, di lûtkeya tolaziyê de, weke mayîneke bêserî digere!

VI.

MERHALEYA WERARÊ, MERHALEYA ŞOREŞÊ

Mijarên merhaleya werarê, merhaleya şoreşê û mercên şênber ên şoreşê yên Marks û Engels, bi dahûrandinên Lenîn gelekî zelal dibin. Bêguman bandora wan heye ku Lenîn, di serdema şoreşên proleter de dijiya û du serboriyên şoreşê yên Lenîn hebûn.

Li gorî Lenîn, di heyama emperyalîst de, di nava hişmendiya şoreşa bênavber de li hemû welatan, mercên şênber ên şoreşên proleteryayê hene. Asta hêzên hilberîner ên cîhanê, ji bo lidarxistina şoreşê guncav in. Mercên sûbjektîf ên şoreşê, ne amade ne. **Xalên sereke yên Lenînîzmê, ji aliyekî ve amadekirina mercên sûbjektîf e. (16)** Em ê di beşên bê de bibînin ku fêmkirina vê rastiyê, cewhera mijarê ye.

Lenîn, Marx û Engels, di cudahiyên merhaleyên werar û şoreşê de, ji ber cudabûnen rewşên şênber, hin guhertin kirin.

Li gorî Marx û Engels, dema ku li ser asta cîhanê mercên şênber ên şoreşê amade bibin, pêwîst e ku zimanê sosyalîstan, Fransî be.

Weke ku tê zanîn di serdema emperyalîst de, li ser asta cîhanê mercên şênber ên şoreşan, amade ne. Li gorî hişmendiya rasterast, di encama pêşbîniyên Marx û Engels de, peywira sosyalîstan ew e ku her tim bi Fransî biaxivin û bêyî ku bisekinin, bêyî ku bêzar bibin, bênavber êrîş bikin! (Hişmendiya Troçkîst, ji aliyekî ve xwe dispêre vê yekê).

Lê ji bo hişmendiya diyalektîk, rewş ne wiha ye. Wê şoreşa cîhanê, ne hemwext be. Wê di destpêkê de li welatekî yan jî li çend welatan pêk were. Ji ber vê yekê jî pêwîst e ku proleteryaya her welatî, di nava sînorên xwe de têkoşîneke bi merhale bimeşîne. Ji ber ku serkeftina proleteryaya her welatî, wê bibe berhema proleteryaya wî welatî. Şoreş ji bo derve nayên veguhestin û ji derve jî nayên kirîn.

Ji bo ku li welatekî, mercên şênber ên şoreşê amade bibin, li gel qeyrana srrmayedariyê ya li ser asta cîhanê, pêwîst e ku li wî welatî **qeyrana neteweyî** jî hebe.

Li gorî Lenînîzmê, ji bo merhaleya şoreşê pêwîst e ku a) asta hişmendî û rêxistinbûnê ya prolteryayê, ji bo şoreşê têr bike. (Pêwîst e ku mercên sûbjektîf ên şoreşê amade bin). b) pêwîst e ku qeyraneke neteweyî hebe ku bandorê li bindestan û serdestan jî bike. **(17)** Nakokiyên gelemperî yên sermayedariyê bandorê li wî welatî dikin û qeyrana neteweyî wiha pêk tê.

Kêliyê şoreşê, kêliyeke kurt e. Merhaleya werarê, pêvajoyeke dirêj e.

HEYAMA WERARÊ

Di heyama werarê de zimanê şoreşger, Almanî ye. Di heyama axaftina Almanî de cihê pêngava şoreşgerî tune ye. Şêwazê xebatê yê vê demê yê şoreşger, zanekirin û rêxistinkirina proleteryayê ye; xurtkirina girêdana di navbera prolteryayê û pêşengê wê de ye; tevlêkirina girseyên gelê kedkar a li nava proleteryayê û perwerdekirina wan e.

Heger partiya proleteryayê hatibe avakirin xebata şoreşgerî, veguherendina wê partiyê ya partiya girseyî ya siyasî ya proleteryayê ye; bi riya hin rêxistinên pîşeyî, xurtkirina girêdanên zindî ya bi girseyan re ye; bilindkirina hişmendiya çînî ya proleteryayê û gelê kedkar e; meşa li eniya herî çepgir a opozîsyonê û bi propogandayeke polîtîk a mezin, teşhîrkirina çînên serdest e.

Heger partiya proleteryayê hêj nehatibe avakirin, peywira sereke, avakirina yekîneya pêşeng a proleteryayê ye. Di merhaleyeke ku tê de partiya çînî ya proleteryayê tune be de, heger rewşa şoreşger hebe jî zimanê şoreşger ê proleter, nabe Fransî!

Lênîn, wiha behsa şêwazê xebatê yê şoreşger ê proleter ê vê demê dike :

"Propoganda û zanekirin, zanekirin û propoganda ***di wê demê de*** *ji hêla mercên şênber ve bi rastî jî bi pêş ve hatibûn dafandin. Weşandina rojnameyeke siyasî ya heftane ya ku hefteyê carekê were weşandin wê baş hatiba dîtin a ku xîtabî hemû welat dikir, weke kevirê sereke yê xebatên amadekariyên şoreşê dihate dîtin.* ***(Pêwîst e Çi Were Kirin,*** *mijarê wiha datanî holê.) (****Li dewsa*** *Çalakiya Çekdarî) drûşmeya avakirina mercên civakî û derûnî yên serhildanê,* ***di wê demê de*** *drûşmeya yekane ya rast a demokrasiya civakî ya şoreşger bû."* (Du Taktîk, rûpel 78)

Stalîn, wiha behsa taktîka vekişînê ya piştî têkçûna 1905-1907'an dike:

"Di heyama 1907-1912'an de Partî neçar ma ku derbasî taktîka vekişînê bibe; ji ber ku çalakiya şoreşger hêdî bûbû, şoreş vedikişiya û taktîk jî neçar bû ku vê diyardeyê bigire ber çavan. Di encamê de şêwazên têkoşînê û yên rêxistinê careke din hatin guhertin. Li dewsa boykotkirina Dûmayê, tevlibûna Dûmayê çê bû; li dewsa çalakiya derveyî parlementoyê ya veşartî, destwerdanên li Dûmayê û xebata li Dûmayê çê bûn; li dewsa grevên giştî yên siyasî, grevên taybet ên bi armancên aborî yan jî bêtevgerbûn çê bûn." (Hêmanên Lenînîzmê, rpl:83)

Weke ku tê dîtin di heyamên werarê de boykotkirina parlementoyê, lidarxistina grevên siyasî yên gelemperî û her cûre çalakiyên çekdarî, ne karên şoreşger in. Di vê heyamê de karên wiha, têne wateya oprtunîzma rastgir. Rêbazên xebata şoreşgerî, di serî de proleteryayê, zanekirina girseyên kedkar e, propoganda ye, grevên bi armancên aboriyê yên taybet in û opozîsyona demokratîk e.

MERHALEYA ŞOREŞÊ

Di merhaleya şoreşê de şêwaz û drûşmeyên partiya proleteryayê bi giştî têne guhertin. Di merhaleya Şoreşa 1905'an de Lenîn, di derbarê drûşm û taktîkên heyama werarê de wiha dibêje:

"...bûyerên niha, ji van drûşmeyan dibuhirin; lewra tevger pêş ketiye; ev drûşm, êdî kevn in û weke amûrên ku hatine bikaranîn û xizmeta xwe bi dawî kirine ne." (Du Taktîk, çapa 2'yemîn, rpl:79)

Pêwîst e ku ev heyama kurt a ku 20 salan xistiye nava rojekê, gelekî baş were nirxandin: Pêwîst e baş were fêmkirin ku "Demjimêra şoreşê, ji demjimêrên din ên jirêzê cudatir e, ji demjimêrên amadekirina dîrokê cudatir e û di demjimêrên şoreşê de rewşa derûniyê ya girseyan ji hundir ve dikele û bawerî, **vediguhere çalakiyê**.

Di nav rojên nadir de girse, bi yek dengî stranên şoreşê dibêjin. Êdî dem, dema pêngava şoreşgerî ye. Di vê demê de girse tenê ji zimanekî fêm dikin: Ew jî Fransî ye. Û axaftina bi vî zimanî, bi tena serê xwe hunerek e... Girîngiya rista **dilê Fransî** yan jî **pêngava şoreşgerî ya Rûsî** li vir xuya dike. Gelek şoreşerên serkeftî û gelek şoreşgerên zanebûnê yên heyama werarê ku tê de pêngaveke wiha tune bû, di merhaleya şoreşê de di nava çirava bêçarebûnê, tirsonekiyê û xiyanetê de digevizin.

Ev heyama demkurt jî her wiha di nava xwe de dibe sê beş: **beşa derbasbûnê, beşa êrîşa taktîkî û beşa êrîşa stratejîk**.

a) Fransiya dema derbasbûnê:

Di dawiya heyama werarê de dest pê dike. Taktîka axaftina bi Fransî ya demê ye ku tê de pêla şoreşê hêdî hêdî bilind dibe û girseyan himbêz dike û baweriya girseyan vediguhere çalakiyên girseyî.

Di dema şoreşa 1905'an de, devokê zimanê Fransî wiha ye; grevên siyasî yên herêmî, xwepêşandan, grevên siyasî yên gelemperî û boykota Dûmayê.

Stalîn, di vê demê de taktîka Bolşevîkan wiha rave dke:

"Bi xwepêşandan û drûşmeyan, pêşeng, fêrî çalakiyên kolanê dibûn û di heman demê de di eniya paş de bi riya

sowyetan û li eniyê jî bi riya komîteyên leşkerî, hêzên şûngir bi pêşengan ve dihatin girêdan." (Hêmanên Lenînîzmê, rpl:85. Ev beşa ku hatiye destnîşankirin, taktîka axaftina bi Fransî ya heyama derbasbûnê ya Şoreşa 1917'yan e).

b) Heyama Êrîşa Taktîkî:

Di vê heyama demkurt de pêşeng, fêrî çalakiyên bajaran dibin, lewra jî dikarin pêşengiya girseyên gel bikin û girseyên gel, fêrî taktîkên rast ên serhildanê dikin. Di vê heyamê de potansiyela şoreşgerî ya gel gelekî bilind dibe, pêla şoreşê nêzîkî asta herî jor dibe û beriya êrîşa dawî, êrîşên taktîkî yên pêşengan zêde dibin. Armanca sereke ya vê heyamê, avakirina bêzarî û tirsê ya di nava refên dijmin de û belavkirin û qelişandina eniya dij-şoreşê ye.

Taktîkên şoreşgerî yên heyama êrîşên taktîkî yên Şoreşa 1905'an wiha ne; şerên kozikan (şerên kolanan) û gerîlayên bajaran. Gerîlayên bajaran, ji proleteryaya bajaran pêk tê.

Yek ji peywirên gerîlayên bajaran jî, girseyên gel fêrî taktîkên serhildanê dikin e. Di vê mijarê de Lenîn, di nivîsa xwe ya bi navê **Dersên Ku Ji Serhildana Moskowayê Werin Girtin** de wiha dibêje:

"Şerê gerîla û tevgerên gelekî mezin ên tundiyê yên ku ji meha berfanbarê û vir ve li Rûsyayê pêk tên, bêguman wê di fêrbûna taktîkên rast ên serhildanê de alîkariya girseyan bikin."

c) Heyama Êrîşa Stratejîk,

Derbasbûna Artêşa Bipergal û Serhildan:

Lenîn, di 10'ê pûşbera 1905'an de wiha dibêje:

"Raperîn, xwepêşandan, pevçûnên kolanan û yekîneyên artêşa şoreşger: Merhaleyên geşedana serhildana gel, ev in. Êdî em gihane merhaleya dawî."

Qeyrana aborî û polîtîk, gelekî kûr bûye û gihaye asta herî jor. Êdî sekinandin, bi gotina Lenîn, cinayet e. Û êdî serhildan, bûye xala destpêkê ya rojevê. Êrîşa stratejîk, bi artêşa birêkûpêk, bi artêşa bipergal tê kirin. Beriya êrîşa dawî, hemû hêzên belavbûyî têne komkirin û Artêşa Sor tê avakirin. (Artêşa Sor, artêşa proleteryayê ye). Şerên kozikan û taktîkên gerÎlayên bajaran, cihê xwe ji taktîka serhildanê ya Artêşa Sor re dihêlin.

Lenîn, taktîka serhildana Cotmehê wiha diyar dike:

"...ji bo ku em karibin serhildanê bi awayekî marksîst, ango weke hunerekê fêm bikin, pêwîst e ku em di heman demê de bêyî ku kêliyekê jî bisekinin ***fermandariya giştî*** *ya yekîneyên şoreşê bi rêxistin bikin; hêzên xwe bi cih bikin; alayên xwe yên pêbawer bişînin cihên herî girîng; şanoya Aleksandrayê dorpêç bikin; keleha Pier Paul dagir bikin; lijneya fermandariya giştî û endamên hikûmetê derdest bikin; cerdên (mufrezeyên) leşkerî yên ku amade ne bimirin, lê nehêlin ku dijmin bikeve navendên jiyanî yên bajaran bişînin ser xwendekarên leşkerî û tûmena hov; pêwîst e ku em karkerên çekdar, seferber bikin; bang li wan bikin ku tev li têkoşîna dawî ya tund bibin; di heman demê de navendên telefon û telgrafê dagir bikin; fermandariya* ***me*** *ya giştî ya şoreşê, li navenda telefonê bi cih bikin û bi riya telefonê bikin ku fermandariya me ya giştî xwe bigihêjîne hemû kargehan,*

hemû alayan, hemû navendên têkoşîna çekdarî û hwd." (Marksîzm û Şoreş, Dozîneyên Nîsanê û Dersên Cotmehê, rpl:167-168)

Serhildana sowyetîk, pêvajoyeke wiha dişopîne. Bêguman jiyan li gorî pergalkirinan nameşe. Hemû razberkirin û plansazî, **beşeke** ji rastiyê paşguh dikin, **beşeke** jê jî gelekî mezin nîşan didin. Lê belê dahûrandina teorîk dike ku tevlihevî û piralîbûna jiyanê, bi awayekî hêsantir were fêmkirin û peywira xwe ya rêbertiya çalakiyê, bi cih tîne.

Ji ber vê yekê jî, pêwîst e ku ev heyamên di vê pergalê de, bi awayekî mekanîkî ji hev qut neyên dîtin, lê belê weke xelekên pêvajoyekê yên ku ketine nava hev werin dîtin.

* “Şoreşa Bênavber-1, ew nivîsa teorîk e ku ji hêla avakar û pêşengê THKP-C’yê Mahir Çayan ve hatiye nivîsîn. Cara pêşîn di Nîsana 1971’ê de ji hêla weşanên KURTULUŞ’ê ve hatiye weşandin. Di salên din de jî gelek caran hatiye weşandin.

Jêrenot:

(1) Têgeha şoreşê, li vir, di wateya şoreşa proleteryayê an jî hegemonyaya proleteryayê de tê biakranîn.

(2) Di şoreşa sosyalîst de proletrya, zorbaziya xwe ava dike; di şoreşa demokratîk de jî gel, zorbaziya xwe ava dike.

(3) Gel, têgeheke siyasî ye. Gel, li gorî heyama şoreşegrî ya heyî tê cem hev û berjewendiyên gel, li dijî çînên heyî ne.

(4) Li gorî Marks û Engels heger şoreşeke polîtîk, veguhertina civakî pêk bîne, ew, di heman demê de şoreşeke civakî ye jî. Heger nikaribe pêk bîne, weke şoreşeke polîtîk dimîne. Di Pêşgotina Manîfestoyê ya sala 1888’an a bi zimanê Ingilîzî de, karkerên komunîst wiha têne pênasekirin: “Hemû beşên çîna karkeran, ên ku pê bawer in ku şoreşên polîtîk kêm in û pêwîst e ku guhertineke gelemperî ya civakî pêk were, ji xwe re digot ‘komunîst’” (Manîfesto, rpl:24)

(5) Ev pîvan dike ku em karibin li welatên nîv-mêtîngeh û mêtîngeh, nûkirinên rêveberiyê yên ku di gotinê de pêşverû û dij-emperyalîst in, lê belê di cewherê xwe de guhertineke desthilatdariyê ya emperyalîst e û detshilateke şoreşger a pêşverû û neteweparêz a bûrjûawaziya biçûk ji hev derxînin.

(6) Çavkanî, Pomeroy, Şerê Gerîla û Marksîzm, rpl:52)

(7) Kûrbûna Qeyrana Civakî: Di nava civakê de xizanîbûna kedkaran digihêje asta herî jor. Ango di civaka bûrjûwaziyê de dijberiya çînan, kûr dibe. Têkiliyên hilberînê, li hemberî geşedana hêzên hilberînê gelekî dibin asteng.

(8) Cewhera teoriya şoreşa domdar a ku Troçkî dixwaze bispêre Marks, a Komunîstên Tund, Gottschalk û Weitling e. Ango teoriya şoreşa domdar a Troçkîst, ne teoriyeke Marksîst e.

(9) Divê ev yek wiha neyê şîrovekirin ku Marks, li dijî welatparêziyê ye. Li gorî Marks û Engels, proleterya, dema ku welatê wan di binê xetereyê de be her dem û li her cihî di eniya herî pêş de şer kirine. Û divê şer bikin jî. Ji vê hêlê de yekana çîna ku heya dawiyê welatparêz e, proleterya ye. Marks'ê ku dibêje welatê karkeran tune ye, di derbarê Komuna Parisê ya ku hikûmeteke karkeran e de wiha dibêje: "Komun, bi vî awayî dibû nûnerê rastîn ê hemû beşên tendurist ên civaka Fransî û lewra jî dibû **hikûmeta rastîn a neteweyî** ya Fransayê. Di heman demê de weke şervanekî wêrek ê hikûmeteke kedkar û rizgariya kedê jî, di wateya rastîn a gotinê de xwedî taybetmendiyeke **enternasyonal** bû." (Li Fransayê Şerê Navxweyî, rpl:86)

Di vê navberê de yên ku li dijî dagirkeriya artêşên Prûsyayê, ala welat û neteweyê bilind dikir û bi awayekî egîdane welat diparast jî ne bûrjûwaziya Fransî bûn, lê belê proleteryaya Fransî bûn. "Serkeftina Fransayê ya li hemberî dagirkeriya Prûsyayê, wê bûba serkeftina kedkarên Fransî ya li hemberî sermayedarên Fransî û xwînmijên dewletê. Di vê nakokiya di navbera peywirên neteweyî û berjewendiyên çînayetiyê de, **hikûmeta parastina neteweyî** (hikûmeta bûrjûwayê)

kêliyekê jî dudil nebû ku veguhere hikûmeteke xayintiya neteweyî." (Heman berhem, rpl:46)

(10) "Teoriya Kuantûmê" ya Planck û Teoriya Îzafiyetê ya Einstein, bingeha fîzîka atomê ya hemdem ava kir. Her wiha di pîşesaziyê hilberîna lezgîn (hilberîna lezgîn a Ford'ê ya otomobîlan), bikaranîna motorên elektrîkê û yên ku ji hundir ve dişewitin û hwd.

(11) Veguhertina şoreşa bûrjûwaziyê ya şoreşa sosyalîst; behsa wê yekê tê kirin ku di nava pêvajoyekê de du şoreş pêk werin.

(12) Weke ku tê dîtin, cewhera şoreşa bênavber a Lenînîst, di heyama emperyalîst de, xwe dispêre wê yekê ku sosyalîstên welatekî ku şoreşa xwe ya demokratîk a bûrjûwa pêk aniye, du şerên şoreşê yên ku ji hêla taybetmendî, armanc û hevbendiyên xwe ve bi giştî ji hev cuda ne, di nava pêvajoyekê de bimeşînin. Ango di heyama emperyalîst de li tevahiya van welatan yekane hêza ku dikare vê şoreşê bigihêjîne serkeftinê, prolterya ye. Ango tenê proleterya dikare pêşengiya şoreşa demokratîk bike. Û di heyama emperyalîst de, şert û merc çi dibin bila bibin, welatekî ku şoreşa xwe ya demokratîk a bûrjûwayê pêk anîbe, ber bi sosyalîzmê ve diçe.

Cewherê vê şoreşê, ev e. Ev dozîne, ji Lenîn û vir ve, weke ku em ê di beşên pêş de nîşan bidin, kûr û dewlemend bûye. Di heyama emperyalîst de, rewşa konjonktura cîhanê çi dibe bila bibe, li pêşiya welatekî ku şoreşa xwe ya demokratîk pêk aniye, tenê riya sosyalîzmê heye. Li Tirkiyeyê hinek kes, bi navê sosyalîzma zanistî, li dijî vê yekê derdikevin.

Yek ji nûnerên vê nêrîna menşevîzmê û kesê ku vê nêrînê herî baş formule dike, Mihrî Bellî ye. Li gorî Mihrî Bellî, çarenûsperestî ye ku mirov mijarê bi vî rengî (weke ku Lenîn nirxandiye) deyne holê; her wiha nabe ku hinek kes bêjin tenê yek pêşengê şoreşa demokratîk heye û ev pêşeng jî proleterya ye; ev yek, pirsgirêkê dike mijara bazarê; di şoreşê de nabe ku bûrjûwazî bibe pêşeng, lê belê bûrjûwaziya biçûk dikare bibe pêşeng. (Bnr. Li Tirkiyeyê Şoreşa Dijber, Kovara Turk Solu, hejmar:64, rpl:21, Aydinlik, hejmar:9, rpl:270 û hwd.)

(13) Em armanca nivîsê digirin ber çavan û pêvajoya şoreşa çandî ya ji civaka sosyalîst heta civaka bêçînayetî ya teoriya şoreşa domdar, li derveyî dahûrandinên xwe digirin.

(14) Ev hêman, ji bo welatên ku neçar in ku şerê gel bimeşînin, ne derbasdar e. Ango ji bo van welatan ne derbasdar e ku di merhaleya duyemîn de di nava rêxistinê de karker, piraniyê pêk bînin. Heger şerê gel were meşandin, pêwîst e ku ev şer, beşên gundiyên xizan ên berfireh ên herêmên gundewar himbêz bike. Li van welatan di nava kedkarên partiyê de gundî, di warê hejmarê de ji karkeran zêdetir in. Ev têgihiştina partiya Lenînîst, di nava demê de kûr bûye û hêla volantirîst a teoriya şoreşê bêtir derketiye pêş.

(15) Mijara veguhestina hişmendiyê ya ji hundir û teoriya Benda Çînê, parçeyên heman bîrdoziyê ne. Kesên ku teoriya Benda Çînê xist nava şoreşa bûrjûwa û şoreşa sosyalîst, bi gotinên cuda her tim û li her cihî li dijî wê yekê derdikevin ku hişmendî, ji derve ve were veguhestin. Ne tenê ekonomîstên Rûsyaya Çarî yên 1900'î û koma menşevîk a ku ev raman

paşê kete nav wan, wiha ne. Menşevîzm, di hemû heyamên serdema emperyalîst de û li hemû welatan bi rûpoşên cuda, di nava eniya çepgir de ji xwe re cih dîtiye û bûye tevgereke oportunîst. Li Tirkiyeyê jî yek ji teorisyenên Benda Çînê, Mihrî Bellî jî li dijî wê yekê derdikeve ku hişmendî, ji derve ve were veguhestin. Li gorî Mihrî Bellî, şaş e ku were gotin ku hişmendî ji derve ve were veguhestin. Lenîn jî ramana Kautsky veguhestiye û tenê carekê û ew jî gelekî kurt behsa vê ramanê kiriye û careke din jî behsa vê mijarê nekiriye (ango Lenîn, paşê dev ji vê ramanê berdaye)! Li gorî vê nêrînê Lenîn, li dijî veguhestina hişmendiyê ya ji derve ye û veguhestina hişmendiyê ya ji hundir diparêze!

(16) Dimitrov, dibêje ku amadekirina hêmaya sûbjektîf a şoreşê, bingeha Lenînîzmê ye û wiha dibêje: "Partiya me, di binê pêşengiya Partiya Bolşewîk û nemir Lenîn de, tev li avakirina Enternasyonalê bû. Ango daxuyaniya bernameyeke nû pejirand û şoreşa proleteryayê, ne weke armanceke demeke nediyar fêm kir; lê belê weke peywirekê fêm kir ku mercên wê yên şênber amade ne; pêkanîna wê bi hêmaya sûbjektîf a şoreşê ve, ango bi rêxistinkirina şoreşê ya partiyê û amadekarî û behremendiya Partiyê ya rêvebirina şoreşê ve girêdayî ye." (Di Geşedana Partiyê De Merhaleyên Sereke, Ber Bi Komara Gel Ve, rpl:129)

(17) Lenîn, qeyrana neteweyî (qeyrana şoreşger) wiha şîrove dike: "Ji bo Marksîstan, heger mercên guncav ên şoreşê tune bin, ne pêkan e ku şoreşek pêk were; her wiha her rewşên şoreşgerî, rê li ber şoreşekê venakin. Di wateya gelemperî de nîşaneyên rewşa şoreşekê çi ne? Heger em van hersê

diyardeyên sereke rêz bikin, wê ne şaş be: 1. Heger çînên serdest, bêyî ku guhertinekê bikin nikaribin serdestiya xwe berdewam bikin; heger di nava ‘çînên jorîn’ de bi awayekî qeyran hebe; heger ev qeyrana polîtîkaya çînên serdest, qelşekê ava bike ku nerazîbûn û hêrsa çînên bindest derkevin holê; ji bo lidarxistina şoreşekê gelek caran têr nake ku ‘çînên jêrîn’ êdî ‘nexwazin’ weke berê jiyan bikin, her wiha pêwîst e ku ‘çînên jorîn’ jî weke berê ‘nikaribin bijîn’. 2. Heger pirsgirêk û pêdiviyên çînên bindest bigihêje asta jorîn. 3. Di encama sedemên jorîn de heger xebatên girseyên ku di dema aştiyê de dengê xwe ji diziyê re nedikirin, lê di dema tevliheviyê de ji ber mecên qeyranê û him jî bi beralîkirina ‘çînên jorîn’ a ber bi çalakiyeke serbixwe ya dîrokî re zêde bibin.

Ne tenê yek bi yek kom û partiyan, heger ev guhertinên şênber ên ku ji vîna hin çînan serbixwe ne, pêk neyên, weke rêgezeke gelemperî, ne pêkan e ku şoreşek pêk were. Tevahiya van guhertinên şênber, weke rewşa şoreşê têne binavkirin.” (V. I. Lenîn: **Sosyalîzm û Şer**, rpl:118-119)

ŞOREŞA BÊNAVBER II-III (*)

DESTPÊK

Weke ku tê zanîn, di nava Çepê Tirkiyeyê de revîzyonîzm, bi dahûrandinên xwe yên ku pratîkê ronî nakin, bi şêwazê xwe yê dûvelangiyê û bi têkiliyên xwe yên kirêt re, bû hêmaya çalak û beralîker.

Mafên demokratîk ên sînordar ên ku makezagona 1961'ê ava kiribûn, ji bo vê tevgerê (*revîzyonîzmê*) mercên madî afirandibûn ku di tu demên dîrokê de nehatibûn dîtin.

Tevgera şoreşger kete pey bergeheke şoreşger-neteweperest û di binê siya wê de dahûrandinên siyasî yên ku di asta entelektuel de beriya salan ji hêla hosteyên sosyalîzmê ve hatibûn nivîsîn û her yek ji wan berhemên pratîkeke diyar a şoreşger in, ji hêla "teorisyenên" herêmî ve ji nû ve hatin vedîtin! Gelek sal derbas bûn ku tê de di derbarê têkoşîna şoreşgerî ya di nava welat de û di derbarê bersivdayîna pirsa "divê ji ku û çawa were destpêkirin" de tiştekî şênber nehate nivîsîn. Derxistina pirtûk û broşûran (tevî bazirganiyê) bi tena serê xwe weke çalakiyekê dihate nirxandin.

Nifşên ciwan ên nû jî di nava têkiliyên vê hawirdorê de çavkaniya xwe ya sosyalîst wergirtin.

Li welatê me rewşeke wiha sosret derket holê ku dibe ku li tu welatên din ên mêtîngeh tune ye. Nîqaşên teorîk (ku beriya salan ji hêla hosteyan ve hatibûn kirin) ên di asteteke gelekî bilind de û spekulasyonên bîrdoziyê beşa çepgiriyê ji hev de xistibûn; û

pratîk jî tenê li ser pişta çend xwendekarên zanîngehê dima ku ew jî çend çalakiyên ciwanan ên bûrjûwaziya biçûk dikirin.

Bi nêzîkahiya revîzyonîst re weke ku Amerikayêji nû ve keşif dikirin; "kadroyên pêşeng ên teorisyên" xwe bêhesab diavêjin nava mercên dîrokî yên welat ên ku herkesên ku xwedî asteke diyar in, dikarin kêm zêde bi awayekî rast şîrove bikin. Gav bi gav nîqaşên weke "Di nava İmparatoriya Osmanî de gelo şêwazê hilberînê yê Asyayî hebû yan şêwazê hilberînê yê feodal hebû?" û "Gelo di Tirkiyeya salên 1960'î de feodalîzm an têkiliyên sermayedariyê serdest in?" di nava eniya çep de belav dibûn.

Kovarên ku tê de nakokiyên weke "feodalîzm serdest e" û "sermayedarî serdest e" dihatin weşandin û li dora van kovaran şerê fraksiyonan bi hemû tundiya xwe bi salan berdewam kir. Tawanbariyên revîzyonîzm û oportunîzmê li her derê belav bûn. Her kovara ku derdiket xwe weke nûnereke tevgereke "cidî" didan xuyanîkirin û helwesta xwe ya li hemberî dewleteke ku di nava eniya sosyalîst de ye nîşan didan û nêrînên xwe yên di derbarê pêvajoya geşedana têkiliyên hilberînê yên ji Osman Gazî û vir ve, di hejmara xwe ya yekemîn de bi broşûrên 80-100 rûpelî (hinek ji wan, bêtir jî) datanîn holê. (Di rastiyê de ji bilî çend cudahiyên têgehan û nuansê, di cewhera xwe de nirxandinên wan weke hev bûn) Hêmayên jidil ên di nava eniya çepgir de jî bi gelemperî li gorî vî bayî diçûn. Bi awayekî domdar, herkes her roj li bende bû ku di kovaran de ya jî di veqetandinên nû de Amerîka ji nû ve were keşifkirin. Lê belê li tu welatên cîhanê, tevegra şoreşger, di warê teorîk de berê bi hezaran rûpel nenivîsîbûn û paşê derbasî pratîkê nebûbûn.

Hêmayên jidil, di nava nivîsên "zaneyan" de êdî nizanîbûn bê wê çibikin. **(1)**

Me vê rastiyê, di hejmara pêşîn a Kurtuluş'ê de wiha anîbû ziman:

"*Ev tevger, di nava mercên ku revîzyonîzmê salen dirêj bandora xwe berdewam dikir de şax da û pêş ket. Ji ber vê jî wê heya demekê, bermahiyên revîzyonîzmê (pasîfîzmê) di nava xwe de bihewîne. Wê ev bermahî, di nava şer de û bi şerkirinê werin avêtin."*

(Ji ber ku nivîs ne di destê me de ye dibe ku me peyv bi peyv weke wê nenivisîbe; bi qasî ku di bîra me de maye, me nivîsî).(*)

Dîsa di wê nivîsê de me diyar kiribû ku nivîsên ku ji niha û pê ve werin nivîsîn, wê nivîsên kurt, cewherî û zelal bin û wê nirxandinên teorîk, ne li ser maseyan, lê bi ceribandin û serboriyên dewlemend ên pratîkê û bi rêberiya Marksîzm-Lenînîzmê werin hûnandin.

Niha, dema ku em hêmanên bîrdozî, polîtîk, rêxistinî û stratejîk ên partiya xwe yên ku me berê xetên wê yên gelemperî diyar kiribûn datînin holê jî, jêdera me wê ev xala şoreşger be.

Bêguman em dikarin bi gelek rastiyên gelemperî û bi nivîsên bi sedan rûpelî yên gotinên Marksîzmê van hêmanên xwe deynin holê. Û dîsa gengaz e ku em li ser maseyan rûnên û di derbarê qaşo pratîkê de nirxandinan bikin.

Lê, na! Di nava partiya me de cihê dahûrandinên wiha yên entellektuel tune ye. Divê zimanê me, termînolojiya me û

dahûrandinên me bi gelemperî berhemên pratîka şoreşger a cîhanê bin û bi taybetî jî berhemên pratîka me bi xwe bin.

Divê em pirsgirêkên xwe yên di derbarê xeta xwe ya gelemperî de bi awayekî zelal, cewherî û bi awayekî ku pratîka me ronî bike bigirin dest.

Partiya me, partiyeke Lenînîst e ku li ser hêmanên materyalîzma diyalektîk û dîrokî ava bûye.

Partiya me, bi rêberiya Marksîzm-Lenînîzmê nakokî û têkiliyên serdema qeyrana 3'yemîn a emperyalîzmê û bandora wan a li ser Tirkiyeyê (taybetmendiyên dîrokî, civakî, aborî û derûnî yên welatê me) bi awayekî şoreşger nirxandine û **Stratejiya Şerê Leşkerî yê Polîtîkbûyî**, weke stratejiya xwe ya şoreşê diyar kiriye.

Ev xeta stratejîk, gundewar û bajaran û şerê çekdarî û şêwazên din ên têkoşîna girseyî ya polîtîk weke komeke diyalektîk digire dest.

Weke ku tê zanîn têgeha "şerê gerîla", bi tena serê xwe çawaniyê diyar nake.

Zorbazên herêmî jî dikarin li hemberî otorîteya navendî şerê gerîla bimeşîne; artêşeke ku yekîneyên wê yên birêkûpêk têk çûbin jî dikare li hemberî dijminê xwe şerê gerîla bike. Heger şerê gerîla, bi armancên polîtîk ên şoreşger were meşandin; heger şerê gerîla, weke amûrekî kampanyaya vegotina rastiyên siyasî were meşandin, ango weke têkoşîna polîtîk a girseyê were nirxandin, wê çaxê dibe Stratejiya Şerê Leşkerî yê Polîtîkbûyî. Çavkaniya xeta teorîk a Stratejiya Şerê Leşkerî yê Polîtîkbûyî û

xeta wê ya tevgerê, di nava dahûrandinên şênber ên rewşên şênber de ye. Ango bi awayekî gelemperî di nava taybetmendiyên cuda yên serdema qeyrana 3'yemîn de û bi awayekî taybet jî di nava mercên bandorbûna Tirkiyeyê ya ji van nakokî û taybetmendiyan de ye.

Hêmaya rêxistinî ya rêxistineke ku stratejiya xwe ya şoreşê bi vî awayî diyar kiriye jî, **hêmana yekitiya pêşengiya polîtîk û leşkerî** ye ku hêmaneke rêxistinî ya xeta Lenînîst e.

Beriya ku em van bingehên teorîk, bi awayekî kurt û cewherî rave bikin, em bawer dikin ku wê sûdwer be ku em di derbarê teoriya Maksîst-Lenînîst de hin agahiyên pêşek bidin.

BEŞA YEKEMÎN

RAVEKIRINÊN PÊŞEK

I

MARKSÎZM-LENÎNÎZM, RÊBEREKE ÇALAKIYÊ YE

"Marksîzm, doktrîneke gelekî kûr û tevlihev e."

Marksîzm, bîrdoziyeke wiha ye ku li hemberî rastiyên jiyanê hertim xwe kûr dike, dewlemend dibe û li xwe zêde dike. Di Marksîzmê de ya girîng, ne gotin e, lê naverok e. Yekane tiştê ku di Marksîzmê de nayê guhertin, bi gotina Lenîn, rêbaza wê ya diyalektîk e. Heke herdu hêmanên bingehîn ên diyalektîkê, têgehên **dem û cihê** werin paşguhkirin, mirov wê bêje li gorî Marks û Engels, Lenîn; li gorî Lenîn û Stalîn, Mao Tse Tung û li gorî Mao jî şoreşgerên serkeftî yên serdema qeyrana 3'yemîn a emperyalîzmê tev de revîzyonîst in!

"Di berovajîkirina sosyalîzma zanistiyê de du rêbazên oportunîzmê hene: Ya bêyî ku têgehên dem û cihê bigirin ber çav xwe bi wan dozên ku hosteyên Marksîzmê ji bo mercên cuda yên dîrokî pêş xistine û di dema niha de kevn bûne, girê didin û hewl didin van dozan, ji jirêderketinên xwe re bikin destek an jî dozên Marksîzm-Lenînîzmê yên ku di binê her şert û mercî de derbasdar in, bi gotinên weke "Dem û cih guherîne; ji bo wê jî ne derbasdar in" revîze dikin." (Bnr. **Şoreşa Bênavber 1**)

Revîzyonîzm û oportunîzm, teoriyê weke hilatinekê (dogma) digirin dest. Ne tenê di hişmendiya şoreşê, çalakiyên çînî û mijarên rêxistinê de, lê belê di rêbazên xebatê de jî nêzîkahiya

revîzyonîzmê ya li hemberî pirsgirêkan wiha ye. Li gorî kesên oportunîst, di dema berê de hebûna rêbazên têkoşînê yên ku ji hêla hosteyan ve dihatin pêşkêşkirin, revîzyona teoriyê bû. Weke mînak, di serdema serhildanên 1905-1907'an de di heyama lawazbûna pêla şoreşê de Bolşevîkên ku serî li şerê gerîla dabûn, ji hêla Kadetan (partiya bûrjûwaziyê) û Menşevîkan ve bi anarşîzm, narodnîzm û blanqûîzmê dihatin tawanbarkirin. Menşevîkan digotin ku ev şêwazê têkoşînê, di berhemên Marks û Engels de tune ye.

Her wiha Mao jî di Şoreşa Çînê (ya ku ne bi serhildanê, lê bi şerê gel giha serkeftinê) ya ku tê de proleteryaya bajar, rista sereke nedileyîst de, şerê gerîla ji xwe re kir bingeh û riyek ji mînaka Şoreşa Sowyetê cudatir meşand. Ji ber vê yekê jî Mao, ji hêla pasîfîstan ve bi dijberiya Lenînîzmê, narodnîzmê û revîzyonkirina Lenînîzmê hate tawanbarkirin. Hinceta wan jî ew bû ku riya şoreşê û şêwazên têkoşînê yên Mao, di pirtûkên Lenîn û Stalîn de tune bûn.

Di heyama sêyemîn a qeyranê de, bertekên pasîfîstan dîsa bi heman awayî bûn. Ji bo oportunîstên ku rewşa dîrokî ya guherbar paşguh dikirin, xeta Marksîst-Lenînîstên ku teoriyê bi awayekî diyalektîk digirtin dest û bi vî awayî derbasî pratîkê dibûn û rêbazên ku di nava têkoşîna çalak de dihatin pêşxistin, ji ber ku di pirtûkên Lenîn, Stalîn û Mao de cih nedigirtin dij-lenînîst bûn û xeta jirêderketina çepgir û anarşîzmê bûn.

Di her heyamên dîrokî de oprtunîzma rastgir, teoriyê ji hêla "ortodoks" ve dicemidînin; giyanê zindî yê Marksîzmê yê ku rewşên şênber, bi awayekî şênber dinirxînin diavêjin aliyekî; xwe ne bi cewherê Marksîzmê ve, lê bi gotinên wê ve girê didin.

II

DOZÊN LENÎNÎZMÊ YÊN GERDÛNÎ

Bêyî ku em mijarê fireh bikin û gotinê dirêj bikin, em dikarin hêmanên gerdûnî yên di derbarê pratîka siyasî de bi vî awayî diyar bikin:

Bi kurtasî ev hêman, di teoriyên şoreş, partî û dewletê de veşartî ne. Li gorî rêzê, ev hêman wiha ne:

- Amûr, burokrasî û milîtarîzma dewletê, bi awayekî komî rêxistineke pêkutiyê ya çînên serdest e.
- Şoreş, bi hewldana şoreşger a gel re -ji jêr ber bi jor ve- parçekirina amûra dewletê, bidestxistina desthilatdariya polîtîk û bi riya vê desthilatê -ji jêr ber bi jor ve- rêxistinkirina pergaleke hilberînê ya pêşketîtir e.

Ji bo vê jî:

1) Pêwîst e qeyrana neteweyî hebe

2) Pêwîst e pêşeng hebe

3) Pêwîst e ku girse, bi awayekî zanebûnî û rêxistinî tev li şer bibin.

- Di heyama emperyalîst de dibe ku li welatekî tenê şoreş pêk were. Di vê heyamê de bûrjûwazî, taybetmendiya xwe ya şoreşger winda kiriye. Êdî nikare şoreşa xwe pêk bîne. Ji ber vê yekê jî li welatên ku paş de hatine hiştin, proleterya di nava pêvajoyekê de rastî du peywirên şoreşger tê. (nêzîkahiya Şoreşa Bênavber)
- Bêyî ku partiya siyasî ya proleteryayê hebe, şoreşa proleteryayê pêk nayê.
- Partiya proleteryayê, ew eniya pêşeng a proleteryayê ye ku di eniyên bîrdozî, aborî-demokratîk û polîtîk de şer

dike û li ser bingeha materyalîzma diyalektîk û dîrokî ava bûye.

- Şoreş, berdewam e û bênavber e. Desthilat bi dest bikeve û binesazî ava bibe jî şoreş bi dawî nabe; heta ku di avaniya jorîn de nakokiyên civakên çînayetiyê ji holê ranebin, şoreş berdewam dike. (Şoreşa Çandê)
- Heger hinek kes bêjin ku ev dozên Lenînîzmê yên gerdûnî kevn bûne, lewra jî ji meriyetê rabûne, çi ji eniya çepgir (Debray) bin, çi jî ji eniya rastgir (revîzyonîzma klasîk) bin, dij-lenînîst in û revîzyonîst in.

III

MERHALEYÊN WERAR Û ŞOREŞÊ Û ŞÊWAZA XEBATÊ

Marx, Engels û Lenîn têkoşîna şoreşgeriyê di du merhaleyên de dinirxînin: **Heyama werarê û heyama şoreşê.**

"Marx û Engels, têkoşîna şoreşger a proleteryayê di du merhaleyên weke merhaleyên werar û şoreşê de şênber dikin. Di herdu merhaleyan de jî taktîka şoreşger a proleteryayê cuda ye. Merhaleya şoreşê, heyameke kurt e. Di vê merhaleyê de pergala civakî ya heyî serûbin dibe. Di vê merhaleya kurt de taktîka prolterya û pêşengê wê, êrîş e. Di rojevê de tenê xalek tê nivîsîn : SERHILDAN. Di vê heyamê de taktîka proleteryayê ew e ku avaniya dewletê ya heyî were parçekirin û dewsthilata şoreşger a proleteryayê were avakirin. Marx û Engels, ji ber pêngavên şoreşger û kevneşopiyên Frensiyan, navê 'axaftina bi Frensî' li vê taktîkê kirine (...)

Di heyama şoreşê de taktîka proleteryayê, ev e." (Bnr. **Şoreşa Bênavber 1**)

Merhaleya werarê jî, heyameke dirêj e. Di vê heyamê de peywira partiya proleteryayê ew e ku proleteryayê û hevalbendên wê bike xwedî hişmendî, wan birêxistin bike û mercên civakî û derûnî yên merhaleya şoreşê ava bike.

Marx û Engels, wiha behsa şêwaza xebata şoreşger a heyama werarê dikin:

"Di çarçoveya têkoşîna şoreşger a vê heyama dirêj de li hundir, li hemberî oportunîzmê têkoşîneke xurt tê meşandin û li derve jî ji têkoşîna sendîkayê ya proleteryayê heta têkoşîna aborî û demokratîk a girseyên gelan, di rêxistinkirina têkoşîna rojane

ya girseyan de li hemberî rêveberiya paşverû ya heyî, di cihê herî çepgir ê opozisyonê de cih tê girtin û beralîkirina opozisyona siyasî jî tê de her cûre çalakî tê pêşxistin (yên ne çekdarî). Marx û Engels ji ber bilindbûna asta bîrdozî û polîtîk a proleteryaya Almanî û ji ber jêhatîbûna wê ya di kişandina girseyên gel a ber bi xwe ve de, navê ***'axaftina bi Almanî'*** *li zimanê şoreşger ê vê heyama proleteryayê kiriye."* (Bnr. **Şoreşa Bênavber 1**)

"Mijarên merhaleya werarê, merhaleya şoreşê û mercên şênber ên şoreşê yên Marx û Engels, di dahûrandinên Lenîn de bêtir aşkere dibin. Di vir de rista wê yekê gelekî heye ku heyama ku Lenîn lê jiyan dikir, serdema şoreşên proleter bû û Lenîn, xwediyê tecrubeya du şoreşan bû.

Li gorî Lenîn, di heyama emperyalîst de di çarçoveya hişmendiya şoreşa bênavber de li hemû welatan mercên şênber ên şoreşa proleteryayê hene. Li ser asta cîhanê, asta ku hêzên hilberîner gihanê, ji bo lidarxistina şoreşê guncav in. Mercên sûbjektîf ên şoreşê jî, ne amade ne. ***Bingehên Lenînîzmê, mercên sûbjektîf ên şoreşê amade dikin... Lenîn, di cudakirina merhaleyên werar û şoreşê yên Marx û Engels de, ji ber cudahiyên mercên şênber, hin guhertin kirin.***

Li gorî Marx û Engels, li ser asta cîhanê heger mercên şênber ên şoreşê hebin, pêwîst e ku zimanê sosyalîstan Frensî be.

Weke ku tê zanîn, di serdema emperyalîst de li ser asta cîhanê mercên şênber ên şoreşê hene. Li gorî hişmendiyeke rasterast, di encama pêşniyarên Marx û Engels de di vê heyamê de pêwîst e ku kesên sosyalîst hertim bi Fransî biaxivin. Pêwîst e bêyî ku bisekinin û biwestin, êrîş bikin.

Lê ji bo hişmendiya diyalektîk, rewş ne wiha ye. Şoreşa cîhanê wê ne hemwext be. Wê di destpêkê de li çend welatan şoreş pêk were. Ji ber vê yekê jî wê azadiya welatekî, berhema proleteryaya wî welatî be. Şoreş, ji bo derve nayên veguhestin û ji derve jî nayên wergirtin.

Ji bo ku li welatekî mercên şênber ên şoreşê ava bibin, ligel qeyrana giştî ya sermayedariyê, pêwîst e ku qeyrana neteweyî ya wî welatî jî pêk were. Li gorî Lenînîzmê, ji bo merhaleya şoreşê: a) Pêwîst e ku asta hişmendî û rêxistinbûnê ya proleteryayê têrî şoreşê bike. (Pêwîst e ku mercên sûbjektîf ên şoreşê ava bûbin) b) Pêwîst e ku ***qeyraneke neteweyî*** *hebe ku bandorê li bindest û zordestan bike. (...)*

Merhaleya şoreşê, kêliyeke kurt e. Merhaleya werarê jî, pêvajpyeke demdirêj e...”

(Bnr. **Şoreşa Bênavber 1**)

Di merhaleya werarê de li gorî Lenîn, şêwazê xebatê ya bolşevîk wiha ye:

“Di heyama werarê de zimanê şoreşger Almanî ye. Di heyama axaftina Almanî de cihê pêngava şoreşgerî tune ye. Şêwazê xebatê yê şoreşger ê vê demê zanekirin û rêxistinkirina proleteryayê yê; xurtkirina têkiliyên proleteryayê û pêşengên wê ye; bilindkirina hişmendiya çînî ya proleteryayê û gelê kedkar e; meşa li eniya herî çepgir a opozisyona demokratîk û bi propogandaya zêde ya polîtîk, teşhîrkirina çînên serdest e.”

Heger partiya proleteryayê hêj nehatibe avakirin, peywira sereke avakirina yekineya pêşeng a proleteryayê ye. Di merhaleya ku tê de partiya çînî ya proleteryayê tune be, heger rewşa şoreşger çê bibe jî zimanê şoreşger nabe Frensî.

Lênîn, wiha behsa şêwazê xebatê yê şoreşger ê proleter ê vê demê dike : *"Propoganda û zanekirin, zanekirin û propoganda di wê demê de ji hêla mercên şênber ve bi rastî jî bi pêş ve hatibûn dafandin. Weşandina rojnameyeke siyasî ya heftane ya ku hefteyê carekê were weşandin wê baş hatiba dîtin a ku xîtabî hemû welat dikir, weke kevirê sereke yê xebatên amadekariyên şoreşê dihate dîtin. ('**Pêwîst e Çi Were Kirin**', mijarê wiha datanî holê.) (**Li dewsa Çalakiya Çekdarî**) drûşmeya avakirina mercên civakî û derûnî (**li dewsa serhildana herêmî) yên** serhildanê, di wê demê de drûşmeya yekane ya rast a demokrasiya civakî ya şoreşger bû.* (Du Taktîk, rûpel 78)*"* (Bnr. **Şoreşa Bênavber 1**)

Lenînê ku merhaleya werarê û şêwazê xebatê wiha rave dikir, di merhaleya Şoreşa 1905'an de wiha digot:

"..Bûyerên niha, ev drûşm derbas kirine, ji ber ku tevger pêş ketiye. Ev êdî kevn bûne, hatine bikaranîn û amûrên ku xizmeta xwe bi dawî kirine ne (ango di derbarê merhaleya werarê de ne)." (Du Taktîk, rûpel 78)

Di merhaleya şoreşê ya demkurt de jî taktîk û drûşmeyên bolşevîk, ne serhildana demildest e.

*"Ev heyama kurt jî di nava xwe de dibe sê beş**: heyama derbasbûnê, heyama êrîşa taktîkî û heyama êrîşa stratejîk***.

a) ***Frensiya heyama derbasbûnê**: Di dawiya heyama werarê de dest pê dike. Dema ku pêla şoreşê hêdî hêdî bilind dibe, ev pêl girseyan himbêz dike û baweriya girseyan vediguhere çalakiyên girseyî, taktîka axaftina bi Frensî ye.*

Di pêvajoya 1905'an de devoka xîtaba Frensî wiha bû: ***grevên siyasî yên herêmî, xwepêşandan, grevên siyasî yên giştî û boykotkirina Dûmayê****. (...)*

b) ***Heyama Êrîşa Taktîkî****: Di vê heyama kurt de pêşeng fêrî çalakiyên bajar dibin, bi vî awayî dikarin rêbertiya girseyên gel bibin û girseyên gel fêrî taktîkên rast ên serhildanê dikin. Di vê heyamê de potansiyela gel a şoreşgerî gelekî bilind dibe, pêla şoreşê nêzîkî asta herî jor dibe û beriya êrîşa dawî êrîşên taktîkî yên pêşengan zêde dibin. Armanca sereke ya vê heyamê di nava refên dijmin de afirandina bêzarî û tirsê ye, belavkirin û parçekirina eniya dij-şoreşger e.*

Di heyama êrîşa taktîkî ya 1905'an de taktîkên şoreşgerî wiha bûn : şerên çeperan (şerên kolanan) û gerîlayên bajar. Gerîlayên bajar, avakirina proleteryaya bajar e.

Yek ji peywirên gerîlayên bajar jî di derbarê serhildanê de pêşengiya gel e. di vê mijarê de Lenîn, di nivîsa xwe ya bi navê ***Dersên Ku Ji Serhildana Moskowayê Werin Wergirtin*** *de wiha dibêje: 'Şerê gerîla yê ku ji berfanbarê û vir ve berdewam dike û tevgerên mezin ên tundiyê, bêguman wê di mijara fêrkirina taktîka rast a serhildanekê de alîkariya girseyan bike.'*

c) ***Heyama Êrîşa Stratejîk, Derbasbûna Artêşa Bipergal û Serhildan:*** *Di 10'ê pûşbera 1905'an de Lenîn wiha dibêje: 'Hêrs, xwepêşandan, pevçûnên kolanan û yekîneyên artêşa şoreşger...* ***Merhaleyên pêşketinê yên serhildana gel, ev in.*** *Êdî em gihan merhaleya dawî.'*

Qeyrana aborî û polîtîk gelekî kûr bûye û gihaye asta herî jorîn. Bendemayîn, bi gotina Lênîn êdî cinayet e.Û êdî serhildanü bûye xala destpêkê ya rojevê. Êrîşa stratejîk, bi artêşa bipergal re tê kirin. Ji bo êrîşa dawî, beriya her tiştî hêzên belav têne komkirin û Artêşa Sor tê afirandin (Artêşa Sor, artêşa

proleteryayê ye). Şerên çeperan û taktîkên gerîlayên bajar, cihê xwe ji taktîka serhildanê ya Artêşa Sor re dihêle." (Bnr. **Şoreşa Bênavber 1**)

Lênîn, di nava Rûsyaya ku yek ji şeş welatên mêtînger bû de pêvajoya şoreşê û taktîkên proleteryayê wiha diyar dikirin.

Stalîn, di **Hêmanên Lenînîzmê** de ji bo taktîkên merhaleyên Şoreşa 1905'an dibêje "taktîkên **merhaleya dirêjkirinê**".

Her wiha dibêje ku piştî têkçûna Şoreşa 1905'an, careke din ew ketine heyameke dirêj a werarê û bilindbûna şoreşê dest pê kiriye.

Weke ku tê dîtin, merhaleyên şoreş û werarê û taktîkên wan ji bo Marx, engels û Lenîn bi **xetên stûr** ji hev cuda ne.

Ev pêvajoya ku ji hêla Marx û Engels ve hatibû dahûrandin, ji bo civaka bûrjûwaziyê bû; lê ya Lenîn di derbarê Rûsyaya Çar bû ku yek ji şeş welatên herî mezin ên mêtînger bû û xwediyê sermayedariyeke wiha bû li gorî welatên din ên Ewropayê lawaztir bû, lê bi dînamîkên xwe yên hundirîn pêş diket.

Weke ku aşkere xuya dike di herdu merhaleyan de jî xebatên şoreşgerî, drûşm û taktîk ji hev cuda ne. Drûşm û rêbazên taktîkî yên ji bo merhaleya werarê têne pêşxistin, ji ber zimanê Almanî ne. Û çalakiya çekdarî, tu carî nabe rêbaza sereke ya merhaleya werarê. Di merhaleya şoreşê de jî, ji ber ku pêla şoreşê bilind dibe, çalakiya çekdarî jî dibe çalakiya sereke.

Di Marksîzm-Lenînîzm'ê de şêwazên têkoşîna polîtîk cûrbecûr in. Ev şêwaz, di ferhengê de di binê du sernivîsên sereke de têne nirxandin: a) Çalakiya çekdarî b) Şêwazên têkoşînê yên li derveyî çalakiya çekdarî. Di welatên ku pêvajoya şoreşê weke "werar û şoreşê" bi xetên stûr ji hev hatiye cudakirin

de partiyên Marksîst-Lenînîst her tim yek ji van şêwazên têkoşînê li gorî merhaleyê ji xwe re dikin bingeh û ya din jî dikin riya duyemîn. (Di vê merhaleya ku em tê de ne de ev cudahî, ji bo welatên emperyalîst û sermayedar derbasdar e).

Li welatên ku di binê hegemonyaya emperyalîst de paş de hatine hiştin, ji bo şoreşê, şerê gel ê demdirêj û fetlanok, xaleke pêwîst e. Pratîkên şênber ên van welatan, di têkiliyên navbera van merhaleyên pêvajoya şoreşê de hin guhertin pêk anîne.

Li welatên ku di binê hegemonyaya emperyalîst de ne, (li welatên feodal û nîv-feodal ên ku tê de hegemonyaya emperyalîst a pêvajoya qeyrana 2'yemîn, diyardeyeke derveyîn e û li welatên ku paş de hatine hiştin ên ku di pêvajoya qeyrana 3'yemîn de hegemonyaya emperyalîst tê de diyardeyeke hundirîn e û têkiliyên hilberînê yên emperyalîst û sermayedar lê serdest in) merhaleyên werar û şoreşê (weke Rûsyaya Çar lawaz be jî), weke welatên ku sermayedarî tê de bi dînamîkên navxweyî pêş ketiye, bi xetên stûr ji hev cuda nabin.

Li welatên wiha, merhaleya şoreşê, ne merhaleyeke kurt e, lê merhaleyeke gelekî dirêj e. Ne gengaz e ku mirov bibîne ku pêvajoya werarê li ku diqede û pêvajoya şoreşê li ku dest pê dike. **Herdu merhale jî ketine nava hevdu**.

Li welatên wiha ji ber ku hegemonyaya emperyalîst rê nedaye ku bûrjûwaziyeke neteweyî pêş bikeve, welat, welatekî sermayedar be jî, ji ber ku sermayedariya heyî ne bi dînamîkên hundirîn pêş ketiye, berovajî ye û li gorî emperyalîzmê teşe girtiye. Hegemonyaya emperyalîst rê li ber wê yekê digire ku civak, bi hêzên xwe yên hundirîn pêş bikeve; ji ber vê yekê jî welat, ji têkiliyên avaniya jêrîn heta avaniya jorîn di nava **qeyraneke neteweyî** de ye.

Ev qeyrana neteweyî, bi awayekî temamî ne amade ye. Lê heta radeyekê heye. Kûrkirin û amadekirina vê qeyrana heyî, di destê şoreşgerên wî welatî de ye.

Bi kurtasî, **li hemû welatên ku di binê hegemonyaya emperyalîst de bi paş ve hatine hiştin, bi awayekî temamî pêk nehatibe jî, qeyrana neteweyî heye**. Ev jî tê wê wateyê ku şoreşa bênavber pêwîst e, merhaleyên werar û şoreşê di nava hev de ne û mercên şênber ên çalakiya çekdarî hene.

Partiya me ya ku li Tirkiyeya ku di binê hegemonyaya emperyalîst de ye şerê rizgariya çekdarî dimeşîne, di çarçoveya vê rastiyê de merhaleyên werar û şoreşê wiha dinirxîne:

"Pasîfîstên welatê me dibêjin ku em di merhaleya werarê de ne û ji ber vê yekê jî di vê heyamê de mercên şênber ên şerê çekdarî tune ne. Angaştên wiha, ji bingeha xwe ve seqet û şaş in. Yekane armanca dahûrandinên bi vî rengî ew e ku dixwazin teslimiyetkariya xwe bixin binê rûpoşê. Di welatên ku di binê dagirkeriya emperyalîzmê de ne de merhaleyên werar û şoreşê, bi xetên stûr ji hev cuda nabin. Ev merhale ketine nava hevdu. Her wiha dairkeriya emperyalîzmê, tê wateya zor, tundî û bikaranîna çekan a hêzên dijber. Ev jî tê wê wateyê ku mercên şênber ên şerê çekdarî hene.

Partiya me ya ku têkoşîna desthilatê dike, di vê demê de ne di wê hêzê de ye ku desthilatê bi dest bixe. Incex di merhaleya artêşên birêkûpêk de mirov dikareli ser asta welat behsa bidestxistina desthilatê bike. Û em tu carî nabêjin ku em îro di vê merhaleyê de ne. Ji bo şerê şoreşgerî yê gelê me bigihêje vê astê em dibêjin ku şerê gerîla şert e û em ji bo vê armancê şer dikin." **(Bnr. Stratejiya Şoreşê ya THKP'yê, Daxuyaniya Partiyê ya 1'emîn)**

Ne tenê pasîfîstên welatê me li dijî vê nirxandina şoreşger derdikevin. Pasîfîstên welatên ku paş de hatine hiştin ên di binê hegemonyaya emperyalîst de ne jî bi tundî li dijî vê nirxandinê derdikevin.

Cewherê mijarê ev e. Pasîfîstên hemû welatên ku paş de hatine hiştin ên ku li dijî şerê gerîla ne, xwe dispêrin ravekirina Lenîn a klasîk. Li gorî wan, ev şêwazê axaftinê yê şorşger ê di çarçoveya diyardeyên dem û cihê yên mijarê, maceraperestî, anarşîzm û fokoperestî ye.

Hinceta wan jî ew e ku li welat li gorî danasîna Lenîn a klasÎk, qeyraneke neteweyî tune ye.

Di vê mijarê de em ê mînakekê bidin. Li Cezayîrê dema ku şoreşgerên bûrjûwaziya biçûk, li hemberî emperyalîzma Fransî dest avêtin çekan û şerê gel berdewam dikirin, Partiya Komunîst a Cezayîrê xwe dispartin ravekirina klasîk a Lenîn, digotin ku li welat mercên şênber ên şerê rizgariya çekdarî tune ne û ew hîn di dema merhaleya werarê de ne û ji ber vê jî şêwazên têkoşînê yên dema werarê ji xwe re dikirin bingeh. Weke ku tê zanîn Şerê Gel ê Cezayîrê ne bi pêşengiya Partiya Komunîst a Cezayîrê, lê bi pêşengiya radîkalên bûrjûwaziya biçûk giha serkeftinê. Piştî şer, sekreterê Partiya Komunîst a Cezayîrê Beşîr Hecî Elî rexnedayineke balkêş dike û di vê mijarê de wiha dibêje:

"Yek ji sedemên wê yekê yên ku me rewş rast nenirxand ew e ku di derbarê geşedana rewşa şoreşgerî de nirxandinên ku me dikirin, seraser man. Partiya Komunîst ji wê yekê bawer bû ku di mijdara 1954'an de mercên heyî, ji bo pêşxistina şerê rizgariya neteweyî ne guncav bûn. Lewra me wê yekê ji bîr dikir ku mercên ku Lenîn datanî holê, bi welatên sermayedar ve

têkîldar bûn û cudahiyên çalakiyên leşkerî û serhildana giştî hebûn." (Bnr. **Pomeroy, Şerê Gerîla û Marksîzm**, rûpel: 320)

Piştî ku kar xelas dibe, pasîfîzm wiha gunehê xwe paqij dike!

BEŞA DUYEMÎN

SERDEMA QEYRANA 3'YEMÎN A EMPERYALÎZMÊ Û XETA LENÎNÎST

I

SERDEMA QEYRANA 3'YEMÎN A EMPERYALÎZMÊ

Emperyalîzma Amerîkayê ji şerê parvekirinê yê 2'yemîn weke welatê emperyalîst ê ku herî kêm westiya û herî zêde feydeyê dîr derket. Ji demên berê gelekî zêdetir sermayeyê derxist derveyî welatê xwe û bi vî awayî aboriyên welatên din ên emperyalîst û sermayedarxistin binê hegemonyaya xwe. Li hemberî têkoşînên gelan û eniya sosyalîst, rista leşkeriya eniya emperyalîst girt ser xwe. Wê ne şaş be ku em bêjin eniya sermayedar a cîhanê, di vê demê de veguherî imparatoriya Amerîkan. (Ji 5 parçeyan 2 parçeyên hilberîna cîhana sermayedar ji hêla DYA'yê ve tê kirin.)

Di vê serdema ku weke serdema qeyrana 3'yemîn a emperyalîzmê tê binavkirin de, têkilî û nakokiyên emperyalîst **di warê teşeyê de** di du eniyan de rastî guhertinê hatin.

1) **Ew derfet ji holê rabû ku pêşbaziya di navbera emperyalîstan de (nakokiyên lihevneker) rê li ber şerekî nû yê parvekirinê veke**.
2) **Şêwazê dagirkeriya emperyalîst hat guhertin. (Îro li cîhanê welatekî ku bigiştî mêtîngeh e hema hema nemaye**. Dagirkeriya aşkere, cihê xwe ji dagirkeriya veşartî re hiştiye.)

Piştî şerê parvekirinê yê 2’yemîn cîhan ket merhaleya ku lêkolînerên bûrjûwaziyê jê re dibêjin “şoreşa pêşesaziyê ya 2’yemîn” û lêkolînerên Marksîst jî jê re dibêjin serdema “**şoreşa zanist û teknîkê**”.

“Îro gumana tu kesî tune ye ku mirovahî ketiye serdemeke şoreşa zanist û teknîkê ya ku tê de wîza (enerjiya) atomê bi kar tîne, gerdûnê fetih dike, tê de kîmya pêş dikeve, hilberîn tê otomatîkkirin û di warê zanist û teknîkê de serkeftinên mezin pêk tên.”

Ligel geşedana mezin a eniya sosyalîst a cîhanê, emperyalîzm û bi taybetî jî emperyalîzma Yankee’yan teknîk û nûvedanên zanistî bikar tînin, heta radeyekê hilberînê zêde dikin û hatine asteke ku tê de dikarin bi hêza xwe ya nukleerî -eniya sosyalîst a cîhanê jî xwediyê van hêzan e- cîhanê tune bikin. **(2)**

(Li gorî hişmendiya rasterast a aborîzanên bûrjûwaziyê, ev “şoreşa zanist û teknîkê” ji bo qeyrana sermayedariyê bûye derman. Lê rewş, berovajî vê yekê ye. “Şoreşa zanist û teknîkê” nakokiyên heyî yên cewherê pergala sermayedar, gihandine asteke nedîtî û çarçoveya têkiliyên sermayedar dihejîne. Zêdebûna hilberînê, kombûna sermayeyê, yekbûna yekdestên taybet û yekdestên dewletan û kêmasiya daxwazê (daxwaza sûkê) ya derasayî qeyraneke mezin afirand.)

Li aliyekî sermaye di asteke gelekî mezin de zêde bûye û kom bûye û li aliyê din ji 3 parçeyam 1’ê cîhanê derketiye derveyî mêtîngeriya sermayedar; di encama van de ji bo sermayedariyê bazarên derveyî metropolan gelekî teng bûye.

Sedema zêdebûna asta qeyrana sermayedariyê û veguherîna wê ya hêzeke har û êrîşkar, ev e. Ev yek kiriye ku nakokiyên di navbera emperyalîstan de tûjtir û kûrtir bibe.

"Rîtma geşedana aboriya sermayedar, li gorî rewşa bazara sermayedar tê diyarkirin."

Ji ber ku hêzên nukleerî gihane asteke gelekî bilind û ji ber hebûna eniya sosyalîst, nakokiyên lihevneker ên di navbera emperyalîstan de gihaştibe asta herî jorîn jî ev nakokî, ji asta aborî, derbasî asta leşkerî nabin. Li aliyekî nakokî tûj û kûr dibin, li aliyê din jî entegrasyon tê pêşxistin.

Nakokiyên lihevneker ên di navbera emperyalîstan de gihane asta herî jor, lê nikarin van nakokiyên bi awayekî derbasdar bi şerekî nû yê parvekirinê çareser bikin û neçar dimînin ku entegrasyonê pêş bixin. Ev jî dike ku qeyrana sermayedariyê bigihêje asta herî tund.

Îro emperyalîzma Yankee'yan di nava qeyraneke giştî de ye. Di salên piştî şerê parvekirinê yê 2'yemîn de emperyalîzma Yankee'yan dostên xwe yên Ewropî û Japonî xistibû binê venêrîneke giştî ya aboriyê, bi vî awayî "istiqrara" aboriya xwe demeke dirêj berdewam kiribû û daxwazên xwe yên aborî û polîtîk bi wan dabûn pejirandin. Bi vî awayî di cîhana sermayedar de dolar, bûbû diravê sereke.

Lê zagona geşedana bêhevsengî ya sermayedariyê di nava vê demê de xebitî û emperyalîzma Ewropa û Japonyayê hate asta ku gefan li hegemonyaya Amerîkayê bixwe. Aboriya Amerîkayê -ji ber zagonên sermayedariyê- di van deh salên dawî de ketiye nava qeyranekê û di salên dawî de jî ev qeyran gihaye asta herî bilind. Qeyrana di nava aboriya Amerîkayê de ewqasî mezin

bûye ku Yankee'yan bêdilî xwe -du salan paş de mabe jî-destnedana dolarên xwe yên efsanewî xera kir. Diviyabû ku Amerîka, dolarên xwe di sala 1969'an de develue bike; lê piştî ku du salan zor dan dostên xwe jî ji bilî çend gavan encameke erênî bi dest nexist û di sala 1971'ê de develue kir.

Heger ev taybetmendiya serdema qeyrana 3'yemîn a ku me diyar kir tune bûya, wê Yankee'yan gavên dostên xwe têr nedîtibana û wê ji bo çareserkirina pirsgirêka bazarê riya çekdarî bi kar anîba. (Bi vî awayî wê bi kevirekî du çûk xistibana; lewra şer, dermanê nexweşiya kêmasiyê daxwazê ya sermayedariyê ye.) Lê hebûna eniya sosyalîst a cîhanê û asta mezin a pêşketina teknîkê tînin bîra wê ku polîtîkayên bi vî rengî têne wateya dawiya wê jî. (Divê prestîja sosyalîzmê ya ku di nava çînên kedkar ên di metropol û mêtîngehan de dijîn belav dibe jî neyê paşguhkirin. Ev hêma jî gelekî girîng e.)

Di vê demê de bazarên hundirîn û derveyîn ên emperyalîzmê gelekî teng bûne û li hemberî vê jî ev pirsgirêk bi şerekî nû yê parvekirinê nikare were çareserkirin û li gel vê yekê jî emperyalîzm bi giştî û bi taybetî jî emperyalîzma Yankee'yan li hundir û li derve serî li du rêbazan dide. Li hundir **aboriya xwe dike leşkerî** û li derve jî tevî rêbazên mêtîngeriya kevn, rêbazên mêtîngeriya nû jî bi kar tîne.

Weke ku tê zanîn bazara hundirîn, bi zêdekirina xerckirina takekesî ya kedkaran pêk tê. Incex dema ku dahatên rastîn ên gelheya xebatkar bilind bibe, bazara hundirîn dikare fireh bibe. Lê ev yek li dijî xwezaya sermayedariyê ye. Xwezaya cewherîn a yekdestan ew e ku, li dûv kara zêde bikevin. Dema ku sermaye li cihekî kom dibe, di nava civaka sermayedar de dahata rastîn a

çînên kedkar û karker kêm dibe. Piştî 1952'yan dahata rastîn a proleteryaya Amerîkayê hertim ketiye.

Li hemberî tengbûna bazara hundirîn û kêmasiya daxwazê, Yankee'yan aboriya xwe leşkerî kirine. **(3)** (Jiyan îro nîşanîme dide ku wê ev rêbaz jî nikaribe sermayedariyê rizgar bike).

Zêdebûn û kombûna mezin a sermayeyê, kir ku sermayedariya yekdest veguhere sermeyedariya dewletê ya yekdest. **(4)** Ev jî tê wê wateyê ku hêza yekdestan û hêza dewletê dikevin nava hev û vediguherin yek mekanîzmayê. (Weke ku tê zanîn Lenîn, merhaleya sermayedariya dewletê ya yekdest , weke merhaleya ku tê de mercên derbasbûna sosyalîzmê herî zêde pêş dikeve, dinirxîne. Ango nakokiyên lihevneker ên sermayedariyê di asta herî jor de ne.)

Emperyalîzma Yankee'yan a ku aboriya xwe di asteke gelekî bilind de leşkerî kiriye, di encama vê yekê de li ser asta cîhanê êrîşkarî û harbûna xwe zêde kiriye; Pantagon, ji aliyekî ve bi bêbextiyê CIA'yê li welatên mêtîngeh û nîv-mêtîngeh demokrasiya nûnertiyê jî ji holê radike û dike ku pergalên leşkerî ava bibe û li aliyê din jî welatên ku tê de şerê rizgariya neteweyî tê meşandin, vediguherÎne dojehê û ji bo vê yekê hemû hêza xwe seferber dike.

Emperyalîzm, di warê stratejîk de hildiweşe, lê di warê taktîkê de hêz û êrîşa xwe zêde dike.

Me gotibû ku di serdema "şoreşa zanist û teknîkê" de sermayedarî, ji ber tengbûna bazarê, ji bo ku qeyrana xwe ya ku gihaye asteke gelekî bilind ji bo demeke derbasdar biborîne, li derve di rêbazên xwe yên mêtîngeriya kevn de hin guhertin pêk anîne. (Ev nayê wê wateyê ku dev ji rêbazên xwe yên kev

berdane. Îro ev herdu rêbaz bi hev re di meriyetê de ne. Lê giranî li ser rêbazên nû ye.)

Em li ser vê mijarê bisekinin ku di asta yekemîn de têkildarî pratîka me ye.

Di serdemên qeyrana 1'emîn û 2'yemîn de bazarên sermayedariya navneteweyî, weke serdema qeyrana 3'yemîn teng nebûbû. Weke ku me berê jî diyar kiriye, kombûna teknolojî û sermayeyê ne di vê astê de bû. Ji ber vê yekê jî sermayedariya navneteweyî sermaye û mal dişandin welatên mêtînger û bi vî awayî pirsgirêka bazarê çareser dikirin. Cîhan hêj ewqasî biçûk nebûbû (bazar teng nebûbû) û kêmasiya daxwazê negihabû vê asta mezin. Ji ber vê jî ji bo emperyalîzmê ew pirsgirêk tune bû ku li welatên mêtîngeh bazara xwe fireh bike. Avaniya heyî dihat parastin -bêguman heta astekê feodalîzm dihate xerakirin û bûrjûwaziya komprador dihate afirandin- û bi vî awayî emperyalîzma ku bi feodalîzmê re hevbendiyê ava dikir, dikarîbû mêtîngeriya xwe bi hêsanî berdewam bike.

Dema ku bûrjûwaziya mezin û rêveberiya feodal -ango otorîteya lawaz-, têkoşîna şoreşgerên proleter ên ku li hemberî feodalîzmê serhildan û teqînên gelên mêtîngeh ên ku bi darê feodal têne birêvebirin û bi taybetî jî gundiyên ku hema hema di asta rênçberiyê de ne -nakokiyên wan gelekî kûr in- bi rêxistin dikin nikarin asteng bikin -gelek caran nikarîbûn asteng bikin jî- dagirkeriya emperyalîst, aşkere dibû. Jixwe li welatên wiha dewletên emperyalîst ji bo ku karên xwe yên bazirganiyê bixin binê ewlehiyê û nehêlin ku welatên din ên emperyalîst dest biavêjin bazarên wan li cihên stratejîk û bi taybetî jî li mînayan (lîmanan) û navendên sereke yên ragihandinê leşkerên xwe bi

cih dikirin û kontrola wir dixistin destê xwe. (Jixwe li navendên stratejîk ên welat, emperyalîzm heye.)

Di serdema qeyrana 3'yemîn de **têkiliyên di navbera emperyalîstan de guherîn**.

Kombûna sermayeyê ya mezin a li metropolan û "**kêmasiya daxwazê**" û bi taybetî jî **tevgerên dij-emperyalîst û neteweparêz** ên di demên dawî yên şerê parvekirinê yê 2'yemîn derketin holê, kirin ku di rêbaza mêtîngeriyê ya emperyalîzmê de hin guhertin çê bibin. Armanca van guhertinan ew e ku emperyalîzm rûyê xwe yê qirêj veşêre û li welatên mêtîngeh, bazara xwe fireh bike. Rêbazên mêtîngeriya nû ev in.

Di bingeha rêbazên mêtîngeriya nû de li gorî polîtîkaya mêtîngeriyê ya yekdestên çavbirçî yên emperyalîst, di welatên mêtîngeh de bazara malan tê firehkirin û li van welatan "sermayedariya ji jor ber bi jêr ve" dibe şêwazê serdest ê hilberînê. Di encamê de jî otorîteya bi hêz a navendî, li van welatan serdest dibe.

"Şoreşa demokratîk a ji jor ber bi jêr ve" heta radeyekê pêk hatiye; li avaniya jorîn, têkiliyên feodal bi gelemperî têne parastin (mêtîngeriya kedê ya feodal tê domandin û bîrdoziyên feodal têne parastin) û li avaniya jêrîn jî sermayedarî (**hilberîna ji bo bazarê**) dibe hêmana sereke.

Li welatên wiha pîşesaziya navîn û ya giran tê avakirin û bûrjûwaziya herêmî ya yekdest (weke hevalbendê herî baş ê emperyalîzmê) tê afirandin û pêşxistin. Lê bûrjûwaziya herêmî ya yekdest, ne bi tevgerên hundirîn, lê bi yekbûna bi emperyalîzmê re pêş dikeve. Bi vî awayî emperyalîzma ku ji bo van welatan di serdemên qeyranê yên 1'emîn û 2'yemîn de

diyardeyeke derveyîn bû, di vê serdemê de bûye diyardeyeke hundirîn. **(5) (Dagirkeriya veşartî**)

Em bi kurtasî behsa rêbaza mêtîngeriya nû ya ku dibe sedema van encaman, bikin.

Emperyalîzma Yankee'yan **bi taybetî** jî piştî 1946'an, rêbaza mêtîngeriya nû pêş xist. Û vê polîtîkaya mêtîngeriya nû bi doktrînên Trûman û Marshall û hevpeymanên leşkerî xist meriyetê.

Ev polîtîka di bingeha xwe de xwe dispêre van xalan; bi daçûneke hindik, derfeta bazareke firehtir ava dike; nabe sedema şerên neteweyî û bi pergal; pirsgirêkên emperyalîzma ku derketiye asteke jorîn, bêtir dixwaze çareser bike. **Rêbaza wê ya sereke ew e ku di bicihkirin û belavkirina sermayeyê de guhertinan ava dike**. Di nava 5-6 hêmanên sermayeyê de rêjeyeke nû ava kirine. Beriya şer ixraca sermayeya diravî, ji mafê bikaranîna nav, parçeyên şûngir, zanista teknîkê, xebatkarên teknîkê û hwd. bêtir cih digirt; lê di serdema piştî şer de û bi taybetî jî piştî 1960'î ev pergal berovajî bûye û hêmanên derveyî ixraca sermayeya diravî, giraniya xwe bêtir danîne.

Îro li welatên ku paşde hatine hiştin, sermayeya diravî ya biyanî, li gorî sermayeya xwecîhî ya diravî gelekî kêm e, lê li van welatan gelek avaniyên pîşesaziyê hene ku bi giştî bi derve ve girêdayî ne. (Weke pîşesaziya otomobîlan) Li van welatan, çend avaniyên pîşesaziyê yên ku ji sedî sed bi derve ve girêdayî ne têne sazkirin û pîşesaziya sivik û ya navîn a ku neçar in ku bi wan ve girêdayî bimînin têne pêşxistin. **(6)** (Di bingeha van avaniyên pîşesaziyê de, hêmanên derveyî sermayeya diravî yên sermayeya biyanî hene.)

Bi vê rêbaza mêtîngeriya nû ya ku me bi kurtasî behsa wê kir re ji aliyekî ve emperyalîzm li wî welatî xwe baş bi cih dike (ango emperyalîzm êdî ne tenê diyardeyeke derveyîn e, lê dibe diyardeyeke hundirîn) û li aliyê din jî li welatên ku paş de hatine hiştin, li gorî demên borî -li gorî demên ku feodalîzm serdest bû û mêtîngeriya kevn hebû- heta radeyekê bazar tê firehkirin û qaşo hilberîna civakî û aramiya civakî zêde dibe.

Di encamê de li welatên ku paş de hatine hiştin, nakokî di warê dirûvî de nerm bûne (li gorî dema feodal), di navbera berteka girseyên gel a li hemberî pergalê û olîgarşiyê de hevsengiyeke çêkirî hatiye avakirin. Ji ber ku dagirkerî hatiye veşartin -û emperyalîzm bûye diyardeyeke hundirîn- bertekên gel ên neteweparêz û dijberiya li hemberî *gawiran* bêbandor bûne. Amûra dewleta navendî, li gorî demên berê gelekî xurt bûye û bi projeyên hevbendiyê, bi hevpeymanên dualî û têkiliyên hevpeymanên leşkerî re amûra dewleta olîgarşîk, li hemberî têkoşîna hundirîn a şoreşger hatiye milîtarîzekirin. (Ji 4 parçeyan 3'yê alîkariyên emperyalîst, alîkariyên leşkerî ne).

Bi firehbûna bazarê ya di nava welat de bajarîbûn, ragihandin û veguhestin jî gelekî pêşketiye û weke tevnekê welat dorpêç kiriye. Di demên berê de li ser gel, venêrîneke lawaz a feodal hebû -rewşa heyî ya emperyalîzmê ne li tevahiya welat, lê li navendên bazirganiyê û cihên ragihandinê yên sereke hebû-, lê piştî vê yekê otorîteya dewletê ya gelekî xurt a olîgarşîk hate avakirin. Artêş û polîsên dewleta olîgarşîk û hemû cûreyên amûrên bêbandorkirin û propogandayê, li her deverên welat serdestiya xwe ava kiriye.

Bi ser de ji heyamên qeyrana giştî yên 1'emîn û 2'yemîn gelekî zêdetir, li van welatan emperyalîzm û olîgarşiyê amûrên

xwe yên propogandayê gihandine asteke gelekî bilind, rêbazên bêbandorkirinê pêş xistine û tecrûbeyan ji têkoşînên rizgariya neteweyî yên berê wergirtine.

Êdî li welatên ku paş de hatine hiştin amûra dewleta olîgarşîk hatiye wê astê ku dikare ji bo demeke dirêj têkiliyên heyî yên hilberînê -ji ber ku sermayedariya welat ne bi hêzên hundirîn pêş ketiye, mirov dikare jê re bêje "têkiliyên hilberînê yên emperyalîst"- biparêze; li wan welatan bertekên girseyên gel û bi taybetî jî yên girseyên fireh ên kedkar hatine bêbandorkirin û di nava van bertekan û olîgarşiyê de hevsengiyeke çêkirî hatiye avakirin. (Ev rewş, li van welatan bingeha şênber a pasîfîzm û revîzyonîzmê ava dike.)

II
DÎKTAYA OLÎGARŞÎK

Rêveberiyên welatên emperyalîst û sermayedar ên ku ji şoreşa pîşesaziyê derbas bûne jî olîgarşîk in û rêveberiyên welatên ku paş de hatine hiştin jî olîgarşîn in. Lê sermayedariya welatên emperyalîst û sermayedar, sermayedarî ne bi şêwazekî paşverû (ji jor ber bi jêr ve) pêş ketiye, lê bi hêzên hundirîn pêş ketiye û bicih bûye. Lewra ne tenê di avaniya jêrîn de, lê di avaniya jorîn de jî têkiliyên demokratîk ên bûrjûwa serdest bûne û têkiliyên feodal ji holê hatine rakirin. Lê di heyama yekdestiyê de sermayedariyê **rikberiya serbest, nijadperestî û hêmanên rêveberiya demokratîk danîne aliyekî û li dewsa wan yekdestî, kozmopolîtîzm û dîktaya olîgarşîk** bi cih kirine.

Lê di heyamên borî de proleterya û girseyên kedkar, piştî têkoşînên dûvdirêj ên bixwîn, bûne xwediyê maf û azadiyên xwe yên demokratîk. Çînên kedkar di warê çawanî û çendîniyê de bi hêz in. Ji ber vê yekê jî olîgarşiya van welatan demokrasiya klasîk a bûrjûwaziyê û azadiyan heta radeyekê sînordar bikin jî tu carî nikarin destê xwe bidin cewhera wê. Taybetmendiya olîgarşiya van welatan, olîgarşiya fînansê ye.

Dîktaya olîgarşîk a weke li welatê me jî ne tenê mohra sermayedariya diravî li ser xwe radike. Ji ber ku sermayedariya li welatê me jî ne bi hêzên xwe yên hundirîn, ji jor ber bi jêr ve ava bûye. Ji lewra jî bûrjûwaziya yekdest a herêmî ji destpêkê ve, ji dendika xwe ve bi emperyalîzmê re bûye yek û pêş ketiye. (Ji ber ku emperyalîzm veguheriye diyardeyeke hundirîn, olîgarşî jî di nava wê de ye.) Lê ev bûrjûwaziya yekdest a ku pêş

dikeve, ne di wê hêzê de ye ku bi tena serê xwe hevbendiya xwe ya bi emperyalîzmê re bidomîne û têkiliyên hilberînê yên emperyalîst biparêze. Ji ber vê yekê jî rêveberiya xwe bi bûrjûwaziya çandiniyê ya ku girêdaneke neçarî di nava wan û yekdestên biyanî û herêmî de heye û bi bermahiyên feodal re par ve dike.

Di nava rêveberiya olîgarşîk de bûrjûwaziya yekdest a hevkar, spartgeha sereke ya emperyalîzmê be jî ne yekane çîna herêmî ye ku têkiliyên hilberînê yên emperyalîst diparêze.

Rêveberiya olîgarşîk a weke rêveberiya welatê me, bi rehetî dikarin bi rêveberiyeke dîktayê ya ku tê de maf û azadiyên demokratîk ên girseyên karker û kedkaran tune ye, rêveberiya welat bikin. Mirov dikare ji vê re bibêje faşîzma mêtîngeriyê. Ev şêwazê rêveberiyê yan bi "demokrasiya nûnertiyê" ya ku têkiliya wê bi demokrasiya klasîk a bûrjûwaziyê re tune ye (bi **faşîzma veşartî**) tê meşandin an jî bêyî ku guh bidin demokrasiya sindoqan jî, bi awayekî aşkere tê meşandin. Lê pêkanîna wê ya aşkere, ne ji bo demeke dirêj e. Bi gelemperî dema ku kontrolê winda dike, serî li vê rêbazê dide.

III

XETA ŞOREŞGER Û REVÎZYONÎZM

Me bi kurtasî behsa taybetmendiyên serdema qeyrana giştî ya 3'yemîn û cudahiyên wê yên ji serdemên din ên qeyranên giştî kir.

Di vê heyamê de revîzyonîzm û oportunîzm, di nava eniya çepgir de bi du awayan derdikevin holê.

Beşa yekemîn, li taybetmendiyên sereke yên vê serdemê dinerin û dibêjin ku dozîneyên gerdûnî yên Lenînîzmê yên ku heta ku emperyalîzm weke pergalekê hilweşe wê di meriyetê de bin, êdî ne derbasdar in û teoriyên aştiyane û pasîfîst ên şoreşê diavêjin holê.

Halbûkî cewhera emperyalîzmê nehatiye guhertin. Tiştên ku hatine guhertin**, têkiliyên di navbera emperyalîstan de û şêwazên mêtîngeriyê ne.** Ji vê hêlê ve dozîneyên gerdûnî yên Lenînîzma ku Marksîzma heyama emperyalîst e, heta ku emperyalîzm weke pergalekê hilweşe, wê di meriyetê de bin.

Beşa duyemîn jî xeta reformîzma civakî ye ku têkiliyên guherbar û şêwazê mêtîngeriyê yên emperyalîzmê paşguh dike, teoriyê ne weke rêbereke çalakiyê, lê weke dogmayekê digire dest. Li gorî wan kesan, propogandaya çekdarî, nikare bibe şêwazê têkoşînê yê sereke; di Lenînîzmê de ev şêweyê propogandayê tune ye, propogandaya çekdarî nikare birêxistin bike; mijar bi vî rengî were destgirtin ev tê wê wateyê ku mirov ji devê tifingê li her tiştî dinêre û hwd...

Em hinekî li ser vê mijarê bisekinin.

Weke ku tê zanîn Marx û Engels di nîva duyemîn a sedsala 19'emîn de gotibûn ku incex piştî şerê cîhanî yê di nava sermayedaran de têkoşîna di navbera proleterya û bûrjûwaziyê de dikare derbasî merhaleyeke pêşdetir bibe û li cîhanê şoreşa yekemîn a proleter pêk were. (Bnr. **Şoreşa Bênavber-1**)

Di heyama emperyalîst de Lenîn û Bolşevîkan, ev nirxandina bêhempa girtin ber çavan û şoreşa proleter a yekemîn a cîhanê pêk anîn.

Lenîn hêj di 1900'î de (beriya ku pirtûka **Emperyalîzmê** binivîse) diyar kiribû ku zagona geşedana pêngavî û bêhevsengî ya sermayedariyê, wê bibe sedema şerê di navbera emperyalîstan de û di encamê de jî li Rûsyaya ku xeleka herî lawaz a sermayedariyê ye, şoreş pêk were. Di bingeha vî şêwazê Lenîn ê şoreşê de ew nêrîn heye ku wê dijberiyên di navbera emperyalîstan de teqez bigihêjin asta leşkerî. (Bnr. Şoreşa Bênavber-1 û Hêmayên Lenînîzmê).

Weke ku tê zanîn di şerê cîhanî yê di navbera emperyalîstan de di vê merhaleya serûbinbûnê de tevgera proleter a cîhanê pêngavên mezin kirine û ji 6 parçeyan 1'ê cîhanê bûye sosyalîst. Di merhaleya serûbinbûnê ya şerê emperyalîst ê cîhanî yê 2'yemîn de jî ji 3 parçeyan 1'ê cîhanê bû sosyalîst û sosyalîzm li ser asta cîhanê bû xwedî nav û dengekî mezin.

Piştî şerê cîhanê yê 2'yemîn, sermayedarî ket nava heyameke nû ya qeyranê. Di vê heyamê de ne gengaz e ku dijberiyên di nava emperyalîstan de veguherin şer. (Ji ber sedemên ku me berê diyar kiribûn).

Şoreşa Kubayê bi şêwazê xwe yê xebatê û bi riya ku şopandiye, yek ji encamên vê heyama dîrokî ye. Bi vegotineke

din, yek ji encamên sepandina Marksîzm-Lenînîzmê ya li pratîka vê heyama dîrokî ye. (Ji bilî şoreşa proleter a Kubayê hemû şoreş, di nava serûbinbûnên herdu şerê cîhanê de hatine lidarxistin). **Şêwazê sereke yê têkoşînê propogandaya çekdarî ye û şerê pêşengên gel ên şoreşger e. Ev, di encama sepandina dozîneyên gerdûnî yên Marksîzm-Lenînîzmê ya li pratîka rewşa dîrokî ye û ji bo şoreşgerên proleter ên hemû welatên ku di binê hegemonyaya emperyalîst de ne xeta bolşevîk e**.

Partiya me ya ku propogandaya çekdarî ji xwe re dike bingeh û diyar dike ku bi şerê çekdarî girseyên kedkar dikarin tev li refên şoreşger bibin û têkoşîna şoreşger incex bi şerekî gel bigihêje serkeftinê, vê nirxandinê di binê rêberiya Marksîzm-Lenînîzmê de û li gorî têkilî û nakokiyên rewşa dîrokî û bandorên wan ên li ser welatê me, dike.

Pasîfîstên welatê me û pasîfîstên cîhanê ji bo têkoşîna rêxistinên şoreşger ên ku weke şêwazê têkoşînê yê sereke şerê pêşangan dimeşînin, wiha dibêjin: “Ev duelloya di navbera komeke zilaman û çînên serdest e. Ev, xeta anarşîzm û narodnîzmê ye. Li cem Lenîn ev şêwazê têkoşînê tune ye. Heger pirsgirêk wiha were destgirtin, ev tê wateya ku mirov ji devê tifingê li her tiştî binêre û hwd...”. Ev tenê ji teslimiyetê re rûpoşekê ava dikin û divê mirov girîngiyê nede wan. Lê em vê yekê bêjin ku di vê demê de şoreşek hatiye lidarxistin. Û kesên ku ev şoreş li dar xistiye, propogandaya çekdarî weke şêwazê sereke yê têkoşînê hilbijartine û dest bi şerê pêşengan kiriye. Tevgerên şoreşger ên ku vî şêwazê xebatê yê Lenînîst ê rewşa dîrokî ji xwe dikin bingeh, îro li çolterên cîhanê destana rizgariya gelan dinivîsin. Pasîfîst jî li cîhanê û li welatê me weke komeke biçûk a dûvikên çepgir ên emperyalîzm û olîgarşiyê, li

hemberî kesên ku li dijî emperyalîzmê bi xwînê û bi agir destanên rizgariyê dinivîsin, gotinan dibêjin.

Bersiva her baş a li dijî van pasîfîstên ku dibêjin ev şêwazê têkoşînê li cem Lenîn tune ye dîsa ji hêla Lenîn ve tê dayîn.

Em gotinê ji Lenîn re bihêlin:

"Marksîzm pêwîst dike ku pirsgirêkên têkoşînê bi awayekî dîrokî werin lêkolînkirin. Heger ev pirsgirêk ji ***rewşa dîrokî ya şênber*** *cuda were nirxandin, ev tê wê wateyê ku hêmanên materyalîzma diyalektîk bi awayekî têr nehatine fêmkirin. Di merhaleyên cuda yên werara aboriyê de li gorî guhertinên zindî yên siyasî, neteweyî û çandî,* ***şêweyên cuda yên têkoşînê derdikevin holê û ev, dibin şêweyên sereke yên têkoşînê; bi van ve girêdayî, di asta duyemîn de jî şêweyên têkoşînê yên temamker têne guhertin****."* **(Lenîn)**

Belê, di vê rewşa dîrokî ya şênber de (di heyama qeyrana 3'yemîn a emperyalîzmê de) û di merhaleyên cuda yên werara aboriyê de (di emperyalîzmê de) kesên ku bêyî ku guhertinên mercên zindî yên siyasî, neteweyî û çandî bigirin ber çavan û ji pratîkê qut ji berhemên Marx, Engels, Lenîn, Stalîn û Mao şêwazên xebatê yên mekanîk derxin, dikarin bibin marksologên jêhatî, lê tu carî nikarin bibin şoreşgerên proleter.

Cudahiya sereke ya di navbera oportunîzm û xeta şoreşger de, di hilbijartina şêweyê sereke yê têkoşînê de derdikeve holê. Weke ku tê zanîn têkoşîna şoreşgerî ya proleter a li dijî çînên serdest, piralî ye. Ev piralîbûn, di binê du sernivîsan de kom dibin:

a) Rêbazên têkoşîna aştiyane (nayên wateya lihevkirinê).

b) Rêbazên çalakiya çekdarî.

Li welatên ku di binê dagirkeriya emperyalîzmê de ne, wê li hemberî emperyalîzm û olîgarşiyê têkoşîneke çawa were meşandin? Wê hevsengiya çêkirî ya di navbera olîgarşiyê û bertek û nerazîbûnên gel de bi kîjan şêweyên têkoşînê were xerakirin? Ji bo gel were refên şoreşê, em ê kîjan şêwazê têkoşînê ji xwe re bikin bingeh? Amûra sereke ya pêngaveke diyarkirina rastiyên siyasî ya berfireh, wê kîjan şêweyê têkoşînê be?

Pîvana sereke ya ku xeta şoreşger û xeta oportunîst ji hev cuda dike, ya ku teoriya şoreşger û lafazaniya "ortodoks" a bîrdozî û polîtîk ji hev cuda dike, ev e.

Revîzyonîzm û pasîfîzma navneteweyî yên ku di vê demê de têkoşîna şoreşger, weke merhaleyên werar û şoreşê bi xetên stûr ji hev cuda dikin, wiha bersiva vê pirsê didin: (Cudahiyên di nava wan de çi dibin bila bibin, ji kesên ku bajaran ji xwe re dikin bingeh heta kesên ku çolterê ji xwe re dikin bingeh)

"Divê em derbasî nava girseyan bibin, li dora pêdiviyên demildest ên girseyan wan birêxistin bikin, wan derbasî çalakiyê bikin û hişmendiya siyasî bigihêjînin wan; ango di çarçoveya maf û daxwazên aborî û dmeokratîk girseyên kedkar birêxistin bikin û berê wan bidin armanca siyasî."

Li hemû welatên ku paş de hatine hiştin ên ku tê de maf û azadiyên demokratîk nayên bikaranîn -hatine cemidandin- bi vegotineke rasttir ji hêla olîgarşiyê ve "destûr" nayê dayîn ku werin bikaranîn û bi artêş, polîs û hêzên din re li hemberî girseyên kedkar polîtîkaya çewisandinê tê meşandin, rêxistinên

ku dixwazin van xebatên klasîk ên "xebatên girseyê" û têkoşîna aborî û demokratîk bidin meşandin, li hemberî hêza leşkerî ya dijmin û pêkutiya dijmin wê bikevin nava bêhêzbûnê û her ku biçe wê bêtir ber bi rastgiriyê ve bişemitin.

Ev rê *"Ji dêvla ku hevsengiya çêkirî ya di navbera zorbaziya olîgarşîk û pêkutiya ku ji aliyê gel ve tê de xera bike, wê wê berdewam bike."* (Che)

Belê, wê berdewam bike. Bêguman wextê ku di vê riyê de bimeşin wê qaşo hin pêşketin jî pêk werin. Lê parastvanên vê riyê, di destpêkê de xwedî taybetmendiyên şerker bin jî wê van taybetmendiyên xwe winda bikin, ji rê derkevin û wê bibin burokrat. Kurtasiya vê riyê wiha ye: windakirina cewherê şoreşgerî û çend kedkarên ku hatine bêbandorkirin. **(7)**

Rêxistinên ku vî rêbazê têkoşînê ji xwe re dikin bingeh, wê bikevin binê siya şoreşgerên nijadperest û wê bêjin qey rêveberiya wan wê li welat maf û azadiyên demokratîk pêk bîne û di vê çarçoveyê de wê bêjin qey li derdora têkoşîna aborî û demokratîk wê karibin girseyan bi rêxistin bikin û hişmendiyê bidin wan.

Mînak li welatê me koma (X) li dora weşaneke ku rastiyan tîne ziman kom dibe; hewl dide li cihên weke kargehan bi cih bibe û bikeve nava tevgerên girseyî yên aborî û demokratîk û bi vê riyê girseyên gel bikişîne nava refên şoreşê. Ango vî şêwazê têkoşînê dimeşîne û ji bo daçûnên rêxistinbûna xwe çend bûyerên şêlandinê kiriye û çend hewldanên vê komê yên sabotaj û suîkastê hene. (Lê ev çalakiyên çekdarî, ne propogandaya çekdarî ne.)

Ev koma (X) ya ku bi vî şêwazî dixebitî, hemû hêviyên xwe bi cûntayeke şoreşger û neteweparêz ve girê dabûn. Li gorî wan, wê vê cûntayê Destûra Bingehîn a 27'ê Gulanê xistiba meriyetê, wê xalên zagonê yên 141 û 142'yan ji holê rakiribana û mercên li gorî şêweyên wan ên têkoşînê ava kiribana.

Nêrîna şoreşgerî:

Ji bo xerakirina hevsengiya di navbera olîgarşiyê û nerazîbûn û bertekên gel ên bi piranî bêzanebûn têne kirin ên li dijî pergalê de were xerakirin û girse, tev li refên şoreşê bibin, rêbaza sereke ya têkoşînê, propogandaya çekdarî ye.

Di welatên ku tê de têkoşînên aborî û demokratîk ên girseyên kedkar, -bi dirûvê nûnertiyê be jî- ji hêla zorbaziya olîgarşîk ve bi terorê tê çewisandin de, di welatên ku otorîteya navendî bi artêş, polîs û hwd. re di çavên gel de weke "hût" tê dîtin de têkiliya bi gel re û kampanyaya ravekirina rastiyên siyasî û tevlêkirina gel a refên şoreşê, incex bi riya propogandaya çekdarîpêk were.

Propogandaya çekdarî, ne têkoşîna leşkerî ye, lê têkoşîna polîtîk e. Ne takekesî ye, lê têkoşîna girseyî ye. Ango weke ku kesên pasîfîst dibêjin, propogandaya çekdarî, teqez ne terorîzm e. Di warê armanc û şêweyê de ji terorîzma takekesî cudatir e.

Propogandaya çekdarî, di çarçoveya stratejiyeke şoreşger de ji bo girseyên kedkar, çalakiyên şênber pêk tîne û ji vir derbasî mijara razber dibe. Li dora bûyerên şênber, rastiyên siyasî rave dike, girseyan dike xwedî hişmendî û armanceke polîtîk nîşanî wan dide. Propogandaya çekdarî, nerazîbûna gel a li hemberî pergalê derdixe hişmendiyê û gel ji şuştina mejî ya emperyalîst

rizgar dike. Di destpêkê de girseyan dihejîne û paşê jî wan zane dike. Nîşan dide ku otorîteya navendî ne ewqasî xurt e û hêza wê beriya her tiştî xwe dispêre **barebar, gef û demogojiyê**.

Propogandaya çekdarî beriya her tiştî bala girseyên ku di nava derdê debara xwe ya rojane û hwd. de winda bûne, bi weşanên emperyalîst hatine beralîkirin û "hêviya" xwe bi partiyên cuda yên pergalê ve girê dane, dikişîne ser tevgera şoreşger û di nava girseyên ku hatine gêjkirin û bêbandorkirin de tevgerekê ava dike.

Di demên destpêkê de matmayîn û dudiliya girseyan ên ji ber propogandaya rastgir a xurt (weşanên oportunîst jî di nava wan de ne) cihê xwe ji sempatiya li hemberî tevgera şoreşger re dihêle; olîgarşî li hemberî çalakiyan rûpoşa xwe ya "dadweriyê" diavêje aliyekî û li dijî gel pêkutî û terora xwe digihêjîne asteke bilind. Gelê ku vî rûyê qirêj ê olîgarşiyê dibîne û jê dûr dikeve.

Rêxistina ku propogandaya çekdarî ji xwe re dike bingeh, her ku diçe dibe yekane çavkaniya hêviyê ya bindestan. Li aliyekî zêdebûna bêkarî û buhabûnê, nerazîbûnên gel zêde dikin, li aliyê din jî olîgarşiya ku li dijî propogandaya çekdarî pêkutî û terora xwe zêde dike û her ku diçe hemû mafên demokratîk ên gel ji holê radike, di destpêkê de kesên rewşenbîr, ji çavê tevahiya gel dikeve. Partiya ku şerê gerîla bi serkeftî dimeşîne, di destpêkê de beşên hişyar ên gel ên ku di binê bandora hin beşên oportunîst ên eniya çepgir de mane li dora xwe kom dike û her ku diçe gemarên di nava eniya çepgir de paqij dike. Hêmayên weke karker, gundî û xwendekaran ên ku pasîfîstan mejiyên wan tevlihev kirine, her ku biçe wê li dora propogandaya çekdarî kom bibin. Ango propogandaya çekdarî, wê di destpêkê de eniya çepgir komî ser hev bike. Hêmanên dûrist ên ku di destpêkê de

di binê bandora hin tevgeran de bûn, wê li dora stratejiyekê kom bibin.

Propogandaya çekdarî, şerê gerîla yê çolter û bajaran û şerê hilweşandina derûniyê di nava xwe de dihewîne.

Şêweyê sereke yê têkoşînê wiha ye, lê ev nayê wê wateyê ku şêweyên din ên têkoşînê werin paşguhkirin. Rexistina ku propogandaya çekdarî ji xwe re dike bingeh, li gorî hêza xwe, şêweyên din ên têkoşînê jî digire dest. Lê şêweyên din ên têkoşînê, di asta duyemîn de ne. Şêweyê sereke yê têkoşînê, propogandaya çekdarî ye. Ev nayê wê wateyê ku wê li hemebrî tevgerên aborî û demokratîk ên girseyî tenê weke temaşevan were tevgerandin. Rêxistin, li gorî hêza xwe hewl dide li dora maf û daxwazên aborî û demokratîk, girseyan li dora xwe kom bike. Hewl dide li hemberî olîgarşiyê, hemû bertekan beralî bike. Lê di destpêkê de teqez baz nade her deverê, xwe naxe nava tevgerên girseyî yên ku hêza wê derbas dike û ewlehiya wan bi çekan nehatiye parastin. **Li gorî hêza xwe bi xebatên derveyî propogandaya çekdarî yên weke hişyarkirin, perwerdeya siyasî, propoganda û rêxistinkirinê mijûl dibe**.

Têkoşîna girseyê ya polîtîk a klasîk û propogandaya çekdarî bi dû hev de tên, di nava hev de ne, bi hev ve girêdayî ne û bandorê li hev dikin.

Şêweyên din ên têkoşînê yên aborî, polîtîk û demokratîk ên ku li derveyî propogandaya çekdarî dimînin, bi propogandaya çekdarî ve girêdayî ne û li gorî propogandaya çekdarî xwe saz dikin. (Şêweyên têkoşînê yên di asta duyemîn de ne, li gorî şêweyê sereke yê têkoşînê teşe digirin, ango li gorî rêbazên propogandaya çekdarî xwe saz dikin.)

Di **Stratejiya Şer a Leşkerî ya Polîtîkbûyî** (SŞLP) de propogandaya çekdarî bingeh e û şêweyên têkoşîna polîtîk, aborî û demokratîk jî bi şêweyê sereke yê têkoşînê ve girêdayî ne. (Rêxistina vê stratejiyê, têekoşîna bîrdoziyê weke amûreke polemîkê nagire dest; lê weke perwerdeya siyasî ya kadroyên xwe digire dest).

Di heyama qeyrana 3'yemîn de nêrînên xetên şoreşger û revîzyonîst ên eniya çepgir a welatên ku di binê dagirkeriya emperyalîzmê de ne, bi kurtasî wiha ye. Bi kurtasî em dikarin bêjin ku li van welatan, li ser navê "şoreşgeriya proleteryayê" du jirêderketin rû didin:

1) **Taybetmendiyên Xeta "Ortodoks" a Klasîk a Revîzyonîst:**

Beşên leşkerî û beşên polîtîk, weke du beşên dijberî hev têne dîtin û beşa leşkerî biçûk tê nirxandin. Rista proleteryaya bajaran, di çarçoveya mînaka sovyetîk a ku mifteya proleteryayê ye de dinirxînin û zêde mezin dikin. Piştî ku nav û dengê propogandaya çekdarî belav bû, di eniya çepgir de qîmeta van rêxistinan kêm bû. Ji ber vê yekê jî paşê hin cih ji bo avakirina gerîla vekirin. Bêguman ev gerîla jî bû çîrok.

Ligel ku li welat qeyraneke neteweyî heye, rêbazên têkoşîna aştiyane têne meşandin û merhaleyên werar û şoreşê, bi xetên stûr ji hev têne veqetandin û di encamê de jixweberiyek derdikeve holê ku Şerê Pêşengan napejirîne.

2) **Xeta milîtaniyê ya çepgir** a ku li hemberî vê nêzîkahiyê weke bertekekê derketiye holê û şîroveyeke şaş a Şoreşa Kubayê ye; **Nêrîna Fokoperest**: Ev nêrîn, têkiliyên bajar û çolterê û propogandaya çekdarî û rêbazên din ên têkoşînê yekpare nabîne; tenê tevahiya çolterê û propogandaya çekdarî ji xwe re dike bingeh û rista

bajaran û şêweyên din ên têkoşînê paşguh dike. Di bingeha vê nêrînê de ew raman heye ku, dibêjin pêwîst e ku qeyrana neteweyî ya li welatên ku paş de hatine hiştin bi awayekî herî sûdwer were nirxandin; bi têkoşîna pêşangan, gundî demildest çekan rakin û şer, di demeke kurt de veguhere Şerê Gel.

Lewra ev xet jî, jixweberbûneke "çepgir" e. Parastvanên vê nêrînê li hemberî rastiya jiyanê fêmkirin ku ev şîroveya wan ne pêkan e û bi lez dev ji vê nêrîna berdane. Îro li cîhanê rêxistinên propogandaya çekdarî ya ku di nava nêzîkahiyeke wiha ya fokoperest de ne hema hema nemane.

BEŞA SÊYEMÎN

TAYBETMENDIYÊN TIRKIYEYÊ YÊN DÎROKÎ, CIVAKÎ, ABORÎ Û PIRSGIRÊN DI DERBARÊ PRATÎKA ME DE

I

DEWLETA OSMANÎ YA FEODAL A NAVENDÎ

Divê mirov dewleta Osmanî di du merhaleyan de binirxîne: a) Imparatoriya Osmanî ya Leşkerî, Navendî û Feodal, b) Dewleta Osmanî ya Komprador û Feodal.

Ligel ku ne xwediyê avaniyeke klasîk a feodal bû jî civaka Osmanî, dewleteke feodal bû. Bi taybetî jî piştî sedsala 15'emîn, avaniya civakî, avaniyeke leşkerî, navendî û feodal bû. Rençberên ku bi axê ve girêdayî ne, hilberîn pêk dianî; berhemên zêde bi riya feodalên asta duyemîn, ji hêla otorîteya navendî ve dihatin bidestxistin. Riyên bazirganiyê yên stratejîk di destê feodalîzma Osmanî de bûn û talana derveyîn hebû; van jî dikir ku talana navxweyî, ango mêtîngeriya hundirîn ne zêde tûj be.

Ji ber vê rewşê û ji ber ku avaniya feodal a heyî ne di teşeyeke klasîk de bû, nakokiyên hundirîn heta radeyekê nerm dibûn. (Ango nakokiyên di navbera hêzên hilberînêr û têkiliyên hilberîna feodal de ne ewqasî tûj bûn ku di demeke kurt de bigihêjin asta herî jorîn). Dema ku sermayedarî hêdî hêdî pêş diket û nakokî jî ber bi tûjbûnê ve diçûn, bi destwerdana derveyîn a sermayedariya Ewropî, pêşketina sermayedariya herêmî hate astengkirin. **(8)**

Bêguman ji ber vê lawaziya tevgera hundirîn, ev welat ji bo sermayedariya Ewropayê bû qadeke mêtîngeriyê.

Di dawiya sedsala 18'emîn de civaka Osmanî, ji bo sermayedariya Ewropyê bû bazareke vekirî. (Bi Hevpeymana Bendeya Balta'yê ya sala 1838'an re ev rewş fermî bû.) Di heman demê de di van salan de otorîteya navendî lawaz dibû û yekÎneyên herêmî yên feodal hêza xwe zêde dikirin.

Civaka Osmanî, ji sedsala 18'emîn û pê de bi awayekî lezûbez kete nava pêvajoyeke mêtîngeriyê; dewlet bi awayekî lezûbez bû komprador; sermayedariya herêmî ya nûgihayî, li hemberî rikberiya sermayedariya Ewropayê li ber xwe neda û aborî jî veguherî avaniyeke feodal û komprador.

Yek ji taybetmendiyên herî girîng ên vê avaniya aboriya feodal û komprador jî ew bû ku di nava vê avaniyê de bûrjûwaziyeke şoreşger tune bû ku netewebûnê bimeşîne; gelê ku di binê bandora avabûna derûnî û çandî ya ji ber taybetmendiya feodal û nîv-feodal û kevneşopiyan de radiza, bixe nava tevgerê û ramanên pêşverû û demokratîk belav bike. Ev peywir, li ser milê bûrjûwaziya biçûk bû. **(9)** Bi vegotineke din, çalakbûna jixweber a feodalîzma Osmanî, ji ber ku ne xwediyê avaniyeke klasîk a feodal bû, lawaz bû û ji ber vê yekê jî navendîbûna hişk a dewleta leşkerî ya feodal, burokrasiyeke xwedî rayeya fireh ava kiribû û ev burokrasî jî weke çînekê tevdigeriya.

Dewleta navendî ya feodal, di sedsala 18'emîn de serdestiya xwe ya navendî hêdî hêdî winda kir, serdestên herêmî hêza xwe ya desthilatdariyê mezintir kir û bi destwerdana derveyîn, dewleta feodal a navendî nikarîbû li ber xwe bide û bi wan re kete nava hevpeymanê û bû komprador. Di encamê de di nava

vê beşa burokrasiyê de du tevger derketin holê. Beşa jorîn a van burokratan a ku para xwe ji sermayedariya Ewropyê digirt, bi malbata sultan re bi awayekî lezûbez bû komprador. Bankerên Galata'yê, seraya komprador û beşa jorîn a burokrasiyê (dewleta feodal a komprador), hevbendiya paşverû ava dikirin ku ji mêtîngeriya eniya Rojavayî parên girîng digirtin.

Ev beşa burokrasiyê ya ku ji ber talana sermayedariya Ewropya Rojavayî rayeyên xwe yên berê bilezûbez winda dikirin, bêriya wan demên berê yên "şanedar" û "sûdwer" dikirin. Ev beş, ji pêvajoya nû ya dewletê ne dilxweş bûn. (Di vê yekê de bandora mezinkirina hêzê ya serdestên herêmî jî heye). Bi bêrîkirina wan rojên sûdwer, li hemberî tevgera feodal û komprador di destpêkê de di binê ala "Osmanîbûnê" de paşê jî bi tevgera nijadperestiyê ya ku li Ewropayê pêş ket re di binê ala "Tûranî" de helwest nîşan dan. Lê ji ber taybetmendiyên xwe, armancên vê beşê hertim ne zelal in, çalakiyên wan jî ne çalakiyên encamgir in. Sermayedariya Ewropayê di nava vê beşê de ji xwe re hertim sîxur peyda kirine û karibû berê wan bide armancên sextê yên şoreşger (ên weke Tûranîbûnê û hwd.) ên ku mêtîngeriya wê firehtir dike. Heta car caran li hemberî bertekên feodalîteyê, vê beşê weke amûreke gefê bi kar aniye.

Di encamê de:

1) Ewropayê sûd ji nûvedanên erdnîgariyê û teknîkê wergirt û derbasî sermayedariyê bû, lê dewleta Osmanî di vê merhaleyê de ji ber çalakgeriya xwe ya jixweber a lawaz, dereng ma. Lewra kete pêvajoya mêtîngeriyê.
2) Ji ber taybetmendiya feodalîzma Osmanî (têkiliyên feodal û rençberan di wateya klasîk de ne zelal û tûj in û mêtîngeriya hundirîn nerm û veşartî ye) serhildêrî, di

nava kedkaran de nebûye kevneşopiyek. Dewleta navendî ya feodal, talana derveyîn ji xwe re dikir bingeh û mêtîıngeriya hundirîn veşartî û nerm dimeşand; ji ber vê yekê jî di çavê gelê Anatolyayê de weke bavekî mezin û parastvan dihate dîtin.

3) Ji ber ku otorîteya navendî ya feodal xurt bû (serdestiya herêmî gelekî lawaz bû), fikra "destnedan" û "têkneçûna" otorîteya dewletê, di nava girseyan de weke rameneke giran cih girtibû.

Bi kurtasî di heyama Şerê Rizgariya Neteweyî yê 1'emîn de çalakiyên serkeftî yên Kuvay-i Milliye yên li dijî dewleta komprador a ku bi awayekî aşkere di eniya dijminê dagirker de cih digirt, ew nêrîna dewleta Osmanî ya zalim, "hilnaweşe", "kes nikare li dijî wê derkeve" û "hêza xwe ji xweda digire" hilweşand û avêt.

4) Bi bandora tevgera hundirîn û derveyîn, ji malzoraka feodalîzmê, bûrjûwaziyeke şoreşger pêş neket. Ji neçarî, barê wê, ji aliyê rewşenbîrên bûrjûwaziya biçûk ve hate hildan.

II

KEMALÎZM

Kemalîzm ala rizgariya neteweyî ya nijadperestên şoreşger ên welatekî ku di binê dagirkeriya emperyalîzmê de ye. Cewherê kemalîzmê, helwesta li dijî emperyalîzmê ye. Teqez şaş e ku mirov kemalîzmê weke bîrdoziyeke bûrjûwaziyê, bîrdoziya hemû bûrjûwaziya biçûk an jî bîrdoziya hemû beşên rewşenbîr ên leşker û sivîl binirxîne.

Kemalîzm, li ser bingeha nijadperestiyê, helwesta li dijî emperyalîzmê ya eniya herî çepgir û radîkal a bûrjûwaziya biçûk e. Ji ber vê yekê jî kemalîzm, çepgirî ye; rizgariya neteweyî ye. Kemalîzm, helwesta radîkal a polîtîk e ku nijadperestên şoreşger, li dijîemperyalîzmê nîşan dane. **(10)**

Li welat, di eniya çepgir de li hemberî emperyalîzmê tevgereke çînayetiyê ya şoreşger a neteweyî û radîkal tune bû; li cîhanê jî eniyeke sosyalîst tune bû ku weke îro şerên rizgariya neteweyî destek bike. Di heyameke wiha de nijadperestên şoreşger ên ku li dijî emperyalîzmê şerê serkeftî yê yekemîn dane meşandin û bi ser ketine, reseniya welatê me ne ku bingeha wan xwe digihêjîne pêşverûtiya burokrasiya jêrîn a Osmanî. Mirov dikare ji bo kemalîatan bêje ku jakobenên beşa rewşenbîr a leşkerî û sivîl in.

III

ŞOREŞA 1923'AN Û HEYAMÊN 1923'AN Û 1942-1950'Î

Şoreşa 1923'an, şoreşeke neteweyî ye ku taybetmendiya çîna pêşeng dide der. Dagirkeriya emperyalîst hatiye şkandin, bûrjûwaziya komprador hatiye têkbirin, ligel ku hin hêsanî ji bo sermayeya biyanî hatine nîşandan jî bi gelemperî, mêtîngeriya emperyalîst hatiye bêbandorkirin û hêza bîrdozî û polîtîk a feodalîzmê hatiye şkandin.

Di naveroka vê şoreşê de, bûrjûwazî heye. (Stalîn û Mao, ji tevgera Anatolyayê ya salên 1919-1923'an re dibêjin şoreş e. Her wiha Mao, ji bo Şoreşa Cezayirê ya ku ji hêla naverokê ve ne zêde cudayî Şoreşa Anatolyayê ye jî têgeha şoreşa neteweyî ya demokratîk bi kar tîne). Lê ji ber taybetmendiyên çîna pêşeng, ev şoreş berdewam nekiriye, carinan sekiniye û heta carinan paş de çûye û di dawiyê de welat ketiye pêevajoya ji nûve mêtîngeriyê.

Wê ne rast be em bêjin ku bûrjûwaziya mezin, pêşengiya Şerê Rizgariya Neteweyî yê 1'emîn û Şoreşa Anatolyayê ya 1923'an. **(11)** Ji ber ku di dema emperyalîst de bûrjûwaziyê li hemû cîhanê taybetmediyên xwe yên şoreşger, neteweparêz û demokrat winda kirine. Bîrdoziya wê êdî ne neteweparêzî, lê kozmopolîtîzm e. Wê ala welat û ya neteweyê ji keştiyê avêtiye nava deryayê. Ev al, di dema emperyalîst de di bingeha enternasyonalîzm û welatparêziyê de ji hêla şoreşgerên proleter ve û di bingeha nijadperestiyê de jî ji hêla beşên radîkal û bûrjûwaziya biçûk ve tê hildan.

Di komara Tirkiyeyê ya neteweyî û laîk a ku di 1923'an de hatiye avakirin de di beşa jorîn a rêveberiyê de kemalîst hene û

rêveberî, rêveberiya hevpar a bûrjûwaziya biçûk û hemû şaxikên bûrjûwaziyê ye.

Serdestên feodal hatine lawazkirin, lê ligel ku hêza wan a bîrdozî û polîtîk hatiye şkandin jî hêza wan a aboriyê nikarîbû were bêbandorkirin.

Bi kurtasî **pergala dewletê ya feodal û komprador hatiye parçekirin û li şûna wê di binê rêveberiya yek partiyê de zorbaziya bûrjûwaziya biçûk serdest bûye**.

Lenîn di derbarê taybetmendiyên rêveberiyên ku tê de bûrjûwaziya biçûk di beşa herî jorîn a hiyerarşiyê de ye de wiha dibêje:

"...hêza otorîte û dewletê ji bo xizmeta vê çînê tê bikaranîn ku ev çîn li ser hiyerarşiya aborî, civakî û polîtîk bimîne û li şûna feodalîte û zorbaziya sermayeyê yên ku bi emperyalîzmê re hevpeymanek çêkirine, zorbaziya bûrjûwaziya biçûk tê avakirin û ji bo vê jî avaniya dweletê ya zorker, dikeve binê xizmeta berjewendî û bîrdoziya vê çînê."

Taybetmendiya bîrdozî û polîtîk a rêveberiya Komara Tirkiyeyê ya 1923'an ev bû.

Rêveberiya di warê aboriyê de jî wiha ye: aboriyeke neteweyî ya ku di cewherê xwe de vala ye hatiye afirandin ku xwedaniya taybet û diravê zêde ji xwe re dike bingeh (jixwe taybetmendiya wê wiha ye), rêxistinbûna xwe ya çînî û aborî fireh dike, dixwaze çîna "bûrjûwzaziya neteweyî" ava bike û xwe dispêre hilberîna biçûk.

Ji bo aboriyên wiha, Lenîn wiha dibêje:

"...Aboriya bajar, li ser bingeha pîşesaziya biçûk tê avakirin; bi vegotineke rasttir li herêmên gundewariyê û li bajaran aboriyeke xerckirinê tê avakirin (ev alborî xwe dispêre hêmana 'çi were hilberîn, tê xerckirin' û di asta yekemîn de di xizmeta pêdiviyên xerckirinê yên bûrjûwaziya biçûk e; ji ber ku bûrjûwaziya biçûk beşeke mezin a nirxên zêde ya ku ji hêza proleteryayê û gundiyên xizan tê wergirtin, di destê xwe de digire, xwedî hêzeke mezin a kirînê ye)."

Kemalîstên ku di salên 1923'an de di astên jorîn ên rêveberiyê de bûn, di destpêkê de di mijara têkiliyên aboriyê yên bi emperyalîzmê re de dudil bûn. Li aliyekî dûvikê emperyalîzmê, bûrjûwaziya komprador tune dibû, gelek kargehên stratejîk ên girêdayî yekdestên biyanî bi riya kirînê dihatin neteweyîkirin û di mijara deynkirinê de gelekî baldar dihate tevgerîn û li aliyê din dîsa jî cihê xwe di nava cîhana sermayedar de digirtin û hin karên sermayeya biyanî hêsan dikirin. Destê xwe zêde nedidan hêza aboriyê ya feodalîzma ku di qadên bîrdozî û polîtîk de hêza wê gelekî şkestiye. Ango rêveberiya bûrjûwaziya biçûk ji ber taybetmendiyên xwe yên çînî, pirên di navbera xwe û emperyalîzm û feodalîzmê nikarîbû bi giştî biavêje.

"...Rêxistinbûna bûrjûwaziya biçûk tê firehkirin û pê re pirek tê avakirin ku têkiliyên çînî û siyasî yên bi feodalîteyê re biparêze." (Lenîn)

Mustafa Kemal'ê ku serokê vê rêveberiya ku dizanîbû ku riya Tirkiyeya serbixwe, ji serxwebûna di her qadê de derbas dibe, di mijara aboriya neteweyî de gelekî baldar bû. Rêveberiya komarê bi parastinên karên deriyên sînorî, neçarkirina bikaranîna malên xwecihî û hwd. re hewl dida ku çîneke sermayedar a neteweyî

ava bike û di encamê de bûrjûwaziyeke burokrasiyê ava bû ku bi bûrjûwaziya bazirganiyê re di nava hevkariyê de ye û derfetên dewletê di van qadan de bi kar tîne.

Mînak, avakarên Bankaya Îş a ku ji bo destekdayîna razemeniyên taybet û dayîna krediyan hatibû avakirin, siyasetmedar, bazirgan û derdorên heyama Komarê yên ku tev li şerê rizgariya neteweyî bûne ne. (Bnr. Parazname)

Bankaya Îş'ê weke banakaya siyasetmedaran hatibû avakirin û ev jî bû sedem ku ji bo serdema Komarê nexweşiya aforîzmê dest pê bike. (F. R. Atay, Bnr. Dogan Avcioglu, Pergala Tirkiyeyê). Her ku çû, beşek ji rêveberên Komarê veguherîn bûrjûwaziya burokrat û bi bûrjûwaziya bazirgan û derdorên diravî re razemeniyên aborî pêk anîn. Ev jî bû sedem ku di aboriyê de yekdestiyên taybet û trost ava bibin û ev beş, li ser dewleta ku di destpêkê de li dijî alîkarî û hevkariyên sermayeya biyanî ye, hêza xwe ya polîtîk hêdî hêdî zêde kir. Ji parlementoyê, hêdî hêdî zagonên hêsankirinê hatin derxistin; "hevkariya" bi sermayeya biyanî re pêş ket; di aboriyê de di encama hevkariya bûrjûwaziya reformîst û bûrjûwaziya burokrat de riya yekdestbûnê vebû.

"Di rastiyê de Bankaya Îş'ê ya ku pîşesaziyê di destê xwe de digirt, pozê dixist nava razemeniyên mezin, yekdestî ava dikir, ligel van xalan ji pişta perdê de şirîkatî ava dikir û hilberînên wê kargehê difirotin derve û bi fiyeteke bilind dadixistin sûkê. Di encamê de baskek di nava Bankaya Îş'ê de derket pêş û bû yekdest. Li Tirkiyeyê di avabûna bûrjûwaziya yekdest de koma herî çalak, koma Bankaya Îş'ê bû." (Bnr. Parêzname) **(12)**

Bi kurtasî:

Em di karin vê heyamê di sê merhaleyan de binirxînin.

1) **Heyama 1923-1932'yan**: Di vê merhaleyê de welat azad bû û aboriya wê jî, aboriya xerckirinê ya neteweyî bû.

Di vê merhaleyê de bûrjûwaziya burokrat ava bû û tê de giraniya Kemalîstan hebû.

2) **Heyama 1932-1934'an**: Di vê merhaleyê de bûrjûwaziya burokrat, bi bûrjûwaziya bazirganiyê û yekdestên biyanî re bû yek û hêdî hêdî veguherî bûrjûwaziya yekdest. Ji qeyrana cîhanî ya 1932'an, ev beş sûdeke mezin wergirt û mezin bû. (Bnr. 1932 Zagona Parastinê ya Neteweyî, Parêzname).
3) **Heyama 1942-1950'yî**: Di salên şer de, bi taybetî jî di dema Saracoglû de, rêvebriya Saracoglû fiyetan serbest berda û ev jî bû sedem ku li welat buhabûn bigihêje asteke bilind; di binê rûpoşa alîkariyên Marshall û Trûman de, emperyalîzma Amerîkayê baştir kete nava welat û ji bo sermayeya biyanî kar gelekî hatin hêsankirin. (Li welat pêvajoya mêtîngeriyê dest pê kir).

IV

HEYAMA 1950-1971'Ê

Di van salan de emperyalîzma Amerîkayê ji aboriyê heya polîtîkayê, ji çandê heya hunerê mohra xwe li welat xist û ew bixwe jî di nava olîgarşiyê de cih girt. (Emepryalîzm veguherî diyardeyke hundirîn). Di van salan de têkiliyên hilberînê yên emperyalîst, li qorziya herî dûr a welat jî serdest bû.

Bi kurtasî aboriya neteweyî ya bûrjûwaziya biçûk li gorî bersivdayîna mêtîngeriya emperyalîst rastî guhertinan hat û vehuherî aboriyeke ne neteweyî ya ku tê de têkiliyên hilberînê yên emperyalîst serdest in. Zorbaziya bûrjûwaziya biçûk, cihê xwe ji serdestiya olîgarşîk re hiştiye û bîrdozî û polîtîkayên neteweyî yên bûrjûwaziya biçûk jî cihê xwe ji bîrdozî û polîtîkaya ne neteweyî ya olîgarşiyê re hiştiye.

Bûrjûwaziya yekdest a herêmî, ya ku ji destpêkê ve bi yekbûna bi yekdestên emperyalîst re ava bûye, di wateya rastîn de di vê heyamê de pêş ketiye û fireh bûye. Bi taybetî jî piştî sala 1960'î têkiliyên hilberînê yên emperyalîst bi kûrahî belav bûne û pê re bûrjûwaziya yekdest a herêmî jî di nava olîgarşiyê de bûye palpişta sereke ya emperyalîzmê.

Lê ligel hemû tiştan di vê demê de li welat, di nava olîgarşiyê û bûrjûwaziya biçûk de hevsengiyek berdewam kiriye. Ango olîgarşî, di vê demê de li ser deweletê bi temamî ne serdest e. Ji ber vê yekê jî heta astekê, bi taybetî jî di nava burokrasî û artêşê de nijadperestên şoreşger dikarîbûn bandora xwe berdewam bikin. Lê bi taybetî jî piştî 1963'an li welatê me sermayeya herêmî û ya biyanî bêtir navendî bûn, kom bûn û hilberîna malan giha heta gundan. Bi vê yekê re olîgarşiyê gav bi gav hêza xwe

mezin kir û di sala 1971’ê de baskên rastgir û navîn ên bûrjûwaziya biçûk jî kişandin refên xwe û di nava artêş û burokrasiyê de darbeyeke mezin li hêza Kemalîstan xist.

V

12’Ê ADARÊ Û TÊKILIYÊN ÇÎNAYETIYÊ YÊN GUHERBAR

Bi darbeya 12’ê Adarê re li welatê me di pergala çînan de guhertineke bi giştî pêk hat. Li welat, hevsengiya çêkirî ya di navbera neteweparêzên şoreşger û olîgarşiyê de xera bû û li hemû saziyên dewletê serdestiyeke bi giştî ya olîgarşiyê pêk hat.

Kevneşopiya şoreşgeriya bûrjûwaziya biçûk a artêşa Tirk a ku bingeha wê dewleta Osmanî û rêveberiya bûrjûwaziya biçûk a Komara 25 salî ye, êdî bi dawî bûye û artêş rasterast bûye amûreke polîtîkayên mêtînger ên emperyalîzm û olîgarşiyê. (Ev nayê wê wateyê ku di nava Artêşa Tirk de neteweparêzên şoreşger qet nemane. Encamên bûyerên civakî ji nişka ve dernakevin holê. Wê di nava artêş û burokrasiyê de neteweparêzên şoreşger heta demeke din jî bimînin. Lê êdî hêza xwe ya berê winda kirine. Û her ku biçe wê werin tunekirin).

Li welatê me darbeya leşkerî ya 12’ê Adarê ne jixweber çê bûye. Bi gelemperî serdema qeyrana 3’yemîn a emperyalîzmê û bi taybetî jî qeyrana aboriyê ya mezin a Amerîkayê ya ji 1967’an û vir ve kirin ku li welatê me yê ku di binê dagirkeriya Yankee’yan de ye ev darbe pêk were. Emperyalîzma Amerîkayê aboriya xwe kiriye aboriya leşkerî û li derve û li hundir terora xew zêde kiriye; ev jî kiriye ku li “Amerîkaya Biçûk”, li welatê me pergala heyî leşkerî bibe û êrîşkariya xwe zêde bike.

Mezinbûna qeyrana emperyalîzma Amerîkayê kir ku mêtîngeriya çavbirçî ya yekdestên welatê me zêde bibe û têkiliyên hilberînê yên emperyalîst rehên xwe bêtir fireh bike.

Di encamê de jî qeyrana civakî, aborî û siyasî ya li welatê me kûrtir bû. Diravên me bênirx bûn. Fiyet gihaştin asteke nedîtî. Xizaniya gelê kedkar giha asta herî jor.

Amerîkayê, ji bo hikûmeta Suleyman Demîrel du pêşniyar kirin. Jê xwestin ku hin gavên "rasyonalîzasyonê" (ango gavên ku bi kêrî bûrjûwaziya hevkar û yekdest werin) yên ku li welat mêtîngeriya xwe zêdetir bikin biavêje (Bnr. Raporên OECD'yê) û artêşê tev li rêvberiyê bike û têkoşîna demokratîk a ku bi lez pêş dikeve, biçewisîne.

Ji ber ku lingekî rêveberiya Suleyman Demîrel xwe dispart bûrjûwaziya Anatolyayê ya dizek a ku hêj nebûye yekdest û bermahiyên feodal, nikarîbû bi giştî van gavan biavêje û ji bo yekdestan "aramiyê" pêk bîne.

Di encamê de hate xistin û zorbaziya leşkerî hate avakirin. Bi vî awayî hin "sererastkirin" hatin kirin ku diziya yekdestên çavbirçî zêde bibe û li dijî çîn û beşên din ên serdest, mêtîngerî sere sazkirin. Û li aliyê din jî neteweparêzên şoreşger ên di nava artêş û burokrasiyê de hatine paqijkirin û bertekên gelê me yên li dijî xizaniya mezin jî bi terorê hatiye astengkirin û ji bo mêtîngeriya yekdestên çavbirçî "aramî" hate avakirin.

Em dikarin encam û merhaleyên darbeya 12'ê Adarê wiha rave bikin:

1) **Zorbaziya leşkerî ya li welatê me, şêweyê dawî yê emperyalîzma Amerîkayê ya li welatê me ye. Ev, tê wê wateyê ku demokrasiya nûnertiyê hatiye cemidandin û rista partiyên pergalê daketiye asta herî jêr. Êdî Artêşa Tirk bûye amûreke rasterast û**

aşkere ya polîtîkaya çewisandinê ya ku olîgarşî li hemberî gelê me dimeşîne. (13)

Lê taybetmendiya leşkerên paye-nizm ên artêşa Tirk, hêj jî neteweparêzî ye. Gelek ji wan ji dibistanên leşkerî hatine, ji beşên bûrjûwaziya biçûk ên kedkar in. Ev deh sal in ku emperyalîzm bi awayekî bi pergal dixebite û kevneşopiya şoreşger a bûrjûwaziya biçûk a artêşê diguherîne û bi 12'ê Adarê re jî dest bi valakirinên berfireh kirine. Di nava artêşa Tirk de weke Amerîkaya Latînî mercên şerê navxweyî tune ne; lê dibe ku heta demeke din jî şopên kevneşopiya şoreşger tê de werin dîtin. Lê olîgarşî, bi valakirin û sererastkirinên nû artêşê bi lez vediguherîne artêşa şerê navxweyî û wê dike hêza xwe ya rasterast.

2) Olîgarşiyê bi baldarî nêzîkî hêza bûrjûwaziya biçûk a li welatê me bûye û darbeya 12'ê Adarê bi drûşmeyên weke "Ataturkparêz", "neteweparêz", "pêşverû" û "reformparêz" pêk anî û Hikûmeta 1'emîn a Erîm jî bi taybetî hewl da ku xwe weke hikûmeteke reformparêz nîşan bide.

Dixwazin bi vê rêbazê re hevbendiya di navbera baskê radîkal a beşa rewşenbîr a leşker û sivîlan û baskê rastgir de xera bikin; baskê pêşîn tenê bihêlin; bi van drûşmeyan qet nebe wan bêbandor bikin û baskên "bêalî" û rastgir bikişînin nava refên xwe. Ji ber hevsengiya çêkirî ya li welatê me olîgarşî neçar bû ku vê rêbazê bimeşîne. Ji ber ku Artêşa Tirk, di encama geşedana dîrokî ya welat, hêj weke artêşên Amerîkaya Latînî nebûbû hêza lêdanê ya olîgarşiyê û hêj bi vî awayî bi rêxistin nebûbû. Ji bo ku vê rêxistinbûnê bike amûreke rasterast a polîtîkayên xwe, neçar bû ku bi van drûşmeyan karê xwe berdewam bike.

Her wiha ji bo emperyalîzma Amerîkayê karibe mêtîngeriya berfirehtir bike (bêguman ji bo bûrjûwaziya hevkar û yekdest),

ango ji bo ku karibe mêtîngeriyê bi pergal bike, pêdiviya wê bi piştgiriya rewşenbîrên bûrjûwaziya biçûk ên di nava burokrasî û artêşê de hebû.

Di nava olîgarşiyê de bandora xwe ya berê winda kiribin jî beş û çînên din ên paşverû -bûrjûwaziya bazirganiyê û ya çandiniyê- yên ku hêj hêzeke wan a diyar heye û bi taybetî jî di parlementoyê de piraniyê pêk tînin, ji vî karê bipergalkirina mêtîngeriyê gelekî dilgiran in. Ji ber vê jî di destpêkê de li hemberî van "reformên zer" bertekeke mezin nîşan dan. Rojnameya Milliyetê ya ku teoriya emperyalîzmê û bûrjûwaziya hevkar û yekdest dike, vê rastiyê wiha rave dike:

"...koma ku dendika pêşeng a bûrjûwaziya mezin pêk tînin, li gorî hin beşên karên taybet, xwedî nêrînên pêşverûtir in. Xwestekên ku pêk tên, di destpêkê de sermayeyên bazirganî û çandiniyê yên kevneşop (ji ber ku wê hêza wan a beriya sermayedariyê lawaz bike) gelekî adizdikin. Lê belê şêwazê hilberîna sermayedar ê ji ber mercên heyî pêk hatiye, neçar dike ku li Tirkiyeyê gavên şênbertir werin avêtin. OECD, hêj di rojên destpêkê yên sala 1970'î, ji bo Tirkiyeyê hin gavên şênber pêşniyar kiribûn." (Alî Gevgîlîlî, Sermayedariya Tirk û Xwestekên Nû)

Çîn û beşên beriya sermayedariyê, li hemberî "reformên" bipergalkirina mêtîngeriyê bertek nîşan dan. Hikûmeta 1'emîn a Erîm a ku desthilatdariya safî ya bûrjûwaziya herêmî û yekdest bû, hewl da di binê rûpoşa "pêşverûtiyê, Ataturkparêziyê û reformîzmê" piştgiriya derdorên rewşenbîr ên bûrjûwaziya biçûk werbigire, van derdoran li dijî van beşan weke amûreke çewisandinê bi kar bîne û van bertekan bişikîne. Û di heyama pêşîn de di vê mijarê de desteka baskên herî radîkal ên bûrjûwaziya biçûk jî wergirt..

3) **Lê propogandaya çekdarî hêvî û rûyê rastîn ê Hikûmeta Yekemîn a Erîm derxist holê û nîşan da ku ev hikûmet, rêveberiyeke herî paşverû, har û terorîst a olîgarşiyê ye. Bi vî awayî leyîstoka emperyalîzma Amerîkayê û bûrjûwaziya hevkar a herêmî serûbin kir, rûpoşa wan daxist û plana wan a ku gav bi gav dimeşe xera kir. Propogandaya çekdarî kir ku ev faşîzma aşkere ya ku xwe di binê rûpoşa "paşverûtiyê, reformîzmê û Ataturkparêziyê" de vedişêre daxist û derdorên rewşenbîr ên bûrjûwaziya biçûk jî tê de, çavên raya giştî vekirin.**

Îro hema hema hemû rewienbîrên şoreşger ên bûrjûwaziya biçûk bi awayekî aşkere taybetmendiya Hikûmeta 1'emîn a Erîm nas dikin.

4) Emperyalîzm û bûrjûwaziya hevkar (yekdest) a ku piştgiriya raya giştî winda kiriye, vê carê ji neçariyê ji hin gavên şênberkirinê (reformên zer) yên ji bo bipergalkirina mêtîngeriyê paş de gav avêtine û bi çîn û beşên din ên paşverû ên ku wê ji van gavan zirarê dîtibana re li dora hin berjewendiyên hevpar li hev kirine.

Îro ji bo olîgarşiyê hewayeke cejnê heye. Hikûmeta 2'yemîn a Erîm jî, hikûmeta vê lihevkirinê û aştiya di nava paşverûyan de ye.

Bi 12'ê Adarê re di tevgera çînan a welatê me de ev guhertin pêk hatine.

Wateya van geşedanan ew e ku, bi vegotineke gelemperî, cudahiya welatê me û welatên Amerîkaya Latînî nemaye. Êdî mercên demokrasiya sînordar ên salên 1961-1970'î nemane, êdî hevsengiya heyî xera bûye. Tirkiye êdî bûye welatek ku tê de dagirkerî û mêtîngeriya emperyalîst bi riya Artêşa Tirk tê

meşandin; her cûre lebatên ji bo aborî û demokrasiyê bi teorê têne bêdengkirin; hemû riyên zagonî xitimîne û polîtîkaya şoreşger jî bi çekan tê bêdengkirin.

Ji niha û pê de ji ber ku hemû riyên zagonî xitimîne û li dijî girseyan kedkar, polîtîkayeke cezakirinê ya xedar tê meşandin, weke şêwazê sereke yê têkoşînê yekane riya têkiliyên bi girseyan re û kişandina wan a nava refên şoreşê, propogandaya çekdarî ye.

Cudahiyên sereke yên taybet ên di navbera welatê me û welatên Amerîkaya Latînî û welatên din ên bi paş de hatine hiştin ev in: (Mirov dikare li gel van diyardeyên sereke, hin diyardeyên din jî rêz bike)

1) **Rewşa jeo-polîtîk a welatê me:**

Ji ber ku pirsgirêkeke leşkerî û taktîkî ye em dikarin tenê vana bêjin: Ji bo şoreşgeran rewşa jeo-polîtîk a welatê me avantajeke girîng e.

Dezavantaja wê jî ew e ku propogandaya dij-komunîzmê xwe dispêre "dijminahiya moskofan" a dîrokî.

2) **Taybetmendiya ku ji hêla geşedana dîrokî û civakî ve tê avakirin:**

Ji ber taybetmendiyên resen ên avaniya feodal a Osmaniyan (ji ber navendîbûna tund, amûra dewletê ya xurt û ji ber lawaziya dînamîzma jixweber), di serê mirovên Anatolyayê de têgeha dewletê weke diyardeyeke ku kes nikare li dijî wê derkeve û tu carî hilnaweşe, cihê xwe girtiye. Her wiha rêxistinbûna burokratîk a fireh û hişmendiya yekpartîbûnê ya zorbaziya bûrjûwaziya biçûk a ku heta 1950'yî rêvberiyê di destê xwe de girt jî kir ku ramana sedsalan a ku dibêje otorîteya dewletê

hêzeke ku “kes nikare li dijî wê derkeve, tek naçe û hilnaweşe” xurttir kir.

Her wiha mirovên Anatolyayê ên ku di binê pêkutiya otorîteya navendî ya dewletê de perçiqîne, di nava qalibên hişk ên ramaneke bextperest (qederperest) de dibêjin “wiha hatiye û wê wiha biçe”, di nava bêçalakîbûna polîtîk de ne. (Di heyama qeyrana 3’yemîn a emperyalîzmê de li welatên ku paş de hatine hiştin, ew hevsengiya çêkirî ya ku di navbera olîgarşiyê û bertekên girseyên gel ên li hemberî pergalê de hatine avakirin, ji ber taybetmendiyên dîrokî û civakî yên welatê me, gelekî zêdetir in). Ji ber ku bi salan e hatine xapandin, êdî ji gotin û peyvan bawer nakin. Ji ber vê yekê jî heta ku nebînin xwediyên gotinan, gotinên xwe pêk tînin, ji wan gotinan bawer nakin.

Piştî şerê ji nûve parvekirinê yê 2’yemîn û bi taybetî jî piştî 1960’î, qeyrana aborî, civakî û polîtîk (a ku dagirkeriya veşartî ya Amerîkayê ew pêk aniye) kir ku li welatê me dijberiya çînan û nerazîbûna girseyên kedkar bigihêje asta herî jor.

Îro li gelek cihên Anatolyayê beşên şiyar ên gel, hêviyên xwe ji hemû partiyên pergalê qut kirine û têgihiştine ku yekane riya rizgariya ji xizaniyê, serhildan e. Beşên şiyar ên gelê me, pê dizanin ku axe, karsaz û xwediyên diravan ên ku bi “gawirên” Amerîkan re hevkariyê dikin, li ser wan çawa mêtîngeriyê dimeşînin. Di nava girseyan de dijminahiya li dijî dewlemendiyê, di asta herî jor de ye. Tiştê ku jê fêm nakin jî, xerabûn û valabûna amûra dweleta olîgarşîk a ku weke hêzeke ku têk naçe di çavên xwe de mezin dikin e. (Olîgarşî, di hişmendiya girseyan de ji bo ku ramana “kes nikare li hemberî dewletê derkeve” xurttir bike hertim qîjeqîjê dike, tirsê belav dike, hêza xwe mezintir nîşan dide û demogojiyê dike).

Ji ber vê yekê jî tenê pênc, şeş çalakiyên leşkerî yên şoreşger (bêyî ku propogandaya wê were kirin jî) **di nava**

girseyan de matmayîneke mezin û sempatiyeke kûr ava kir. Tevî welatên Amerîkaya Latînî, li tu welatên ku paş de hatine hiştin, têkoşîneke gerîla ya ku hêj nû dest pê kiriye, di nava girseyan de ewqasî bi bandor û bi rûmet nebûye.

Sedemên vê yekê aşkere ne.

Ji ber ku li tu welatên ku paş de hatine hiştin, di hişmendiya mirovan de ev ramana şaş a ku dibêje "kes nikare li hemberî dewletê derkeve, ji ber ku dewlet têk naçe", weke mirovên Anatolyayê ava nebûye.

Nefreta girseyên kedkar ên welatê me ya li hemberî parlementoyê, partiyên pergalê û siyasetmedaran û nerazîbûna wan a li hemberî gotinên wan ên vala, di astekê de ne ku mirov nikare bi girseyên welatên din ên ku paş de hatine hiştin re bipîve.

Beşên hişyar ên gelê me ji "çepgirên" pasîfîst û yên ku di nava şêwazê xebateke dûvik de ne adiz bûne û dizanin ku tiştek ji wan dernakeve. Ev beş, bi salan e ku hêvî dike ku rêxistinek şerker derkeve holê û cidî nêzîkî mijara şoreşê bibe. (Çavkaniya nêzîkahiya li hemberî THKP-C'yê, ev e).

Ji ber van sedeman, **ji bo ku propogandaya şoreşger bi bandor bibe û girse tev li nava refên şoreşger bibin, propogandaya çekdarî -welatên Amerîkaya Latînî jî tê de- ji hemû welatên ku paş de hatine hiştin zêdetir, ji bo welatê me pêwîst e.**

Ji bo ku nerazîbûn û tevgera girseyan ên li dijî pergalê yên girseyan veguherin çalakiyê, beriya hertiştî divê em jêbawer tevbigerin. Pêwîst e ku em gotinên xwe, bi çalakiyên xwe nîşanî wan bidin. Şoreşger, beriya hertiştî divê bi çalakiyên xwe yên leşkerî nîşanî girseyan bidin ku rêxistina pêkutiyê ya çînên serdest ne weke ku bi sedsalan tê nîşandan e û ev rêxistin pûç û vala ye; hêza wê hemû **qîjeqîj, gef û gotinên vala ye**. Li aliyê

din ji bo ku girse ji propogandaya şoreşger re vekirî bin û bi vî awayî bibin xwediyê hişmendiya şoreşger û tev li refên şoreşê bibin pêwîst e ku propogandaya ku xwe dispêre çalakiyên leşkerî were meşandin.

Dubare be jî em cewhera gotinên xwe rave bikin:

Di encama geşedana aborî, civakî û dîrokî ya welatê me de, ango ji ber taybetmendiya dewletê ya demên borî, di navbera bertekên gelê me û dewletê de hevsengiya çêkirî berdewam kiriye. Bi armanca avakirina hevsengiyeke wiha ya çêkirî, di serdema qeyrana 3'yemîn a emperyalîzmê de di rêbaza mêtîngeriyê de hin guhertin hatine kirin.

Ji vê hêlê ve emperyalîzma Amerîkan li welatê me ji xwe re bingeheke baş dîtiye. Ji ber vê yekê jî li welatê me yê ku hevsengiya tê de, ji hemû welatên ku paş de hatine hiştin xurttir e, rêbaza sereke ya têkoşînê ne şêweyên têkoşînê yên aştiyane ne; berovajî vê yekê, propogandaya çekdarî ye. Şêweyên pasîfîst û revîzyonîst, tenê dikarin vê hevsengiya çêkirî berdewam bikin.

Û ji ber van sedeman hemûyan, di encama çalakiyên gerîlayên bajar ên Sibat û Gulanê de nerazîbûnên li dijî pergalê yên beşên hişyar ên gelê me, veguherîne hezkirina şoreşger. **(14)** Her tiştên nû, di destpêkê de bi bertekan têne pêşwazîkirin. Her ku diçe, cihê xwe digirin û têne pejirandin. Propogandaya dijber a ku olîgarşî li seranserê welat dide meşandin di destpêkê de heta radeyekê bi bandor bûbe jî niha bandora xwe ya berê winda kiriye. Kîna gelê me ya li hemberî pergalê di asteke wiha de ye ku tenê 5-6 tevgerên leşkerî yên li dijî olîgarşiyê, ji bo şoreşgeran prestîjeke girîng afirandiye.

Di heyameke ku tê de gel bi awayekî şênber berê xwe dabû eniya şoreşê û pêwîst bû ku têkoşîna me pêngaveke çawaniyê bike de, hêj di destpêkê de propogandaya çekdarî derb xwar.

Niha peywira me ew e ku em baweriyê bidin wan girseyên ku bi awayekî ji pêdiviya guhertina pergalê bawer dikin. Girse bê rêxistin in ku bi nêrîneke îdealîst, hêza dewleta olîgarşîk "weke hûtan" dibînin û dibêjin qey ev hêz têk naçe. Pêwîst e ku em di nava pratîka şoreşger de nîşanî girseyan bidin ku otorîteya navendî ne ewqasî xurt e, vala ye û hemû hêza wê qîjeqîj û gef e. em dikarin bi vî awayî baweriyê biafirînin.

Belê, pêwîst e em **nîşanî** girseyan bidin ku di şerê li dijî olîgarşiyê de eniya şoreşê ya çekdarî **xurt e**; pêwîst e ku em hêza xwe nîşan bidin, dijmin lawaz bikin û di hêla moralê de wan têk bibin. Yekane riya pêkanîna vê yekê, rêzeserkeftinên leşkerî ye. Yekane riya parastin û pêşxistina potansiyela heyî, ev e. Weşaneke navendî ya şoreşger, incex piştî rêzeçalakiyên leşekrî dikare bikeve meriyetê. (Divê ev yek wiha neyê şîrovekirin ku di nava vê demê de wê weşana şoreşgerî were betalkirin. Bêguman di nava vê demê de wê weşane şoreşgerî ya ku xwe dispêre çalakiyên leşkerî ji bo girseyan derkeve. Lê di vê merhaleyê de nabe ku ev weşan bi awayekî periyodîk derkeve. Her wiha wê broşûr werin derxistin ku armanca wan perwerdekirina kadroyên siyasî û ronîkirina pratîka me ye).

Ajîtasyon û propogandayên ku bi riya weşanê yan jî bi riya propogandîstan têne kirin, divê xwe bispêrin tiştên şênber. Îro çend qaşo weşanên şoreşgerî têne derxistin. Carinan jî hin baskên "çepgir" belavokên ku girseyan vedixwînin çekhilgirtinê têne belavkirin. Bandora wan çi ye? Bandora wan tune ye. Ji ber ku propogandaya tiştên razber dikin. Girse dixwazin kesên ku bi gotinên tûj wan vedixwînin serhildanê û çalakiyên çekdarî, di nava şer de bibînin. Bi taybetî jî gelê Tirkiyeyê guh nadin propogandaya razber û kesên ku dibêjin "em ê dûra bikin". Girse, ji 1961'ê û vir ve van kovar û belavokan nas dikin. "Bi gotinan keştiya me nameşe". Girse, dixwazin pêşengên xwe di

nava şer de bibînin. Wê bibînin da ku ji te bawer bikin. Ev jî têr nake; divê bawer bikin ku tu hêzeke mezin î da ku ber bi te ve werin û bawerî û hezkirina wan veguherin piştgiriyê.

Li welatê me kesên pasîfîst bi taybetî wiha dibêjin: "Çalakiyên ku têne kirin ji hêla gel ve têne hezkirin. Û hew..."

Rast e. Ligel ku ji me hez dikin jî hêj girse me bi awayekî çalak destek nakin û nakevin nava têkoşînê. Ev tiştekî xwezayî ye. Ma hûn li bendî çi bûn? We digot qey wê di encama 5-6 çalakiyên leşkerî de girse rabin û li welat şoreşê pêk bînin?

Ev yek nîşan dide ku kesên pasîfîst, têkoşîna şoreşgerî weke pêvajoyeke demkurt dibînin û haya wan ji avabûna civakî tune ye.

Me heta niha wiha got û em hêj jî dibêjin: Riya şoreşê, çal û xwar e, fetlanok e, asê ye û têkoşîna dehsalan e. Em hêj di destpêka şer de ne. Û ev hezkirina girseyan a di dema destpêkê de jî, ji bo eniya şoreşa çekdarî destkeftiyeke mezin e. Ji ber ku **riya piştgiriyê, ji hezkirin û baweriyê derbas dibe**. Girse, wê di destpêkê de ji eniya şoreşa çekdarî hez bikin. Lê ji ber otorîteya dewleta navendî û ji ber ku wê bêjin qey ev eniya şoreşa çekdarî wê were têkbirin, wê bi dudilî û meraqeke mezin lê temaşe bikin. Piştî ku şerê gerîla bi awayekî serkeftî were meşandin, wê bibînin ku eniya şoreşa çekdarî hêzeke girîng e, têk naçe û tune nabe. Wê çaxê wê ev hezkirin veguhere baweriyê. **Ev, merhaleya duyemîn e**. Bawerî, nayê wê wateya ku piştgiriya piraniya gel hatiye standin. Lê heger şerê gerîla berdewam bike, wê bawerî hêdî hêdî veguhere piştgiriyê.

Hertişt bi şervaniya me ya bi biryar, bi bawer û hevgirtî ve girêdayî ye. Divê em tu carî dev jê bernedin. Derb û têkçûn, divê nebin sedema bêzariyê, berovajî vê yekê divê bawerî û hêrsa me

ya şoreşgerî xurttir bikin; divê bibin sedem ku em bêtir hevgirtî û bêkêmasî şer bikin.

3) Taybetmendiya ku avaniya aborî ya welatê me û rêxistinbûna aborî û polîtîk a bûrjûwaziya biçûk ava kiriye:

Li welatê me rêxistinbûna aborî û polîtîk a bûrjûwaziya biçûk, ji welatên din ên di binê dagirkeriya emperyalîst de paş de hatine hiştin, xurttir e. Ji ber vê yekê jî olîgarşiya li welatê me, dijberiya vê beşê zêde nekiriye û karê xwe meşandine. Heta piştî 12'ê Adarê jî ligel ku harbûn û terora xwe zêde kiriye, dîsa jî weke rêveberiyên paşverû yên li Pakistan, Yewnanistan û Brezîlyayê bi awayekî aşkere zagonsaziyê û demokratbûnê nedaye aliyekî û di warê dirûvî de be jî hin gavên biçûk avêtine.

Welatê bi ji sedî sed bi derve ve girêdayî be jî li gorî piraniya welatên ku paş de hatine hiştin, xwedî pîşesaziyeke navîn û sivik a xurttir e.

Li gel diyardeyên dîrokî, civakî, polîtîk û derûniyê yên ku me ew diyar kirine, ev herdu diyarde jî di bêbandorkirina teqînên jixeber ên girseyan de rista sereke dileyîzin.

Ev jî di eniya çepgir de dibe hinceta qaşo têkoşînên lihevker û teslimiyetkar ên revîzyonîst û pasîfîstan. Kesên pasîfîst, dibêjin: "Welatê me ne wekî welatên Rojhilata Dûr û Amerîkaya Latînî ye; li wan welatan kevneşopiyeke serhildêr heye. Lê li welatê me rewş ne wiha ye, kevneşopiyeke wiha tune ye. Ji ber vê yekê jî pêwîst e ku em di destpêkê de bi şêwazên têkoşînê yên derveyî tevgera çekdarî hişmendiyê bidin girseyan, wan bi rêxistin bikin, ango rêxistinbûna herî kêm a ji bo têkoşîna çekdarî saz bikin û paşê jî dest bi têkoşîna çekdarî bikin" û bi vî awayî dixwazin helwestên xwe yên lihevker û teslimiyetkar rewa nîşan bidin. **(15)** Ev yek, zêde girîng neyê dîtin jî di eniya çepgir de nezelaliyekê ava dike. Ev şîroveya revîzyonîst û

pasîfîst, li gorî hişmendiya formel gelekî rast (!) e, lewra mejiyên kesên ku nikarin di binê ronahiya materyalîzma diyalektîk de li bûyeran binêrin şêlû dike.

Guevera dibêje ku rewşa aborî û civakî ya welatên wekî welatê me, ji bo rêxistinbûna seknan (sazîgerî) ya revîzyonîzm û pasîfîzmê bingeheke şênber ava dike û vê yekê wiha rave dike:

"Li welatên ku tê de bajarîbûn û ne xurt be jî pîşesazî pêş ketiye, avakirina komên gerîla zehmettir e. Bandora bîrdoziya bajarîbûnê, hêviya şerên girseyî yên ku li gorî şêwazên aştiyane xwe birêxistin kirine ava dike û şerê gerîla asteng dike. Ev jî cûreyeke 'rêxistinperestî' yan jî 'sazîgeriyê' (rêxistinbûna revîzyonîst) ava dike ku mirov dikare vê yekê di demên kêm zêde 'asayî' de bi hêsanbûna mercên debara gel a li gorî demên din rave bike".

4) Taybetmendiya ku ji hêla Tevgera 1919-1923'an ve hatiye avakirin:

Gelê Tirkiyeyê, dagirkeriya aşkere ya emperyalîst dîtiye, li hemberî emperyalîzmê bi ser ketiye û şerê rizgariyê ya li dijî emperyalîzmê meşandiye. Ji ber vê yekê jî di nava vî gelî de hestên dij-emperyalîst û nerazîbûna li dijî biyaniyan, ji welatên Amerîkaya Latînî gelekî zêdetir e.

Ev hest, ji bo şoreşgeran bingeheke gelekî girîng ava dike. Rêxistineke ku propogandaya çekdarî ji xwe re dike bingeh, heger karibe nêzîkahiya "dagirkeriya veşartî" baş bide naskirin, wê karibe van hestan û vê nerazîbûnê li ser bingeheke çînayetiyê bide rûniştandin. (Heger ev potansiyel baş neyê bikaranîn, olîgarşî dikare vê yekê li dijî şoreşgeran weke amûreke demogojîk a dij-komunîst bi kar bîne. Jixwe îro olîgarşî vê mijarê bi taybetî dixebitîne. Her wiha olîgarşî, ji bo ku li welatê me gelên Tirk û Kurd bera hev bidin, vê mijarê bi kar tîne).

Cudahî û wekheviyên di navbera welatê me û welatên din ên ku di binê dagirkeriya veşartî ya emperyalîst de paş de hatine hiştin de û taybetmendiyên resen ên welatê me yên ku pratîka me ya şoreşger ronî dikin bi kurtasî wiha ne.

BEŞA ÇAREMÎN

ARMANCA ME YA STRATEJÎK:

ŞOREŞA DIJ-EMPERYALÎST Û DIJ-OLÎGARŞÎK E

Heta îro di nava eniya çepgir de stratejî hertim şaş hatiye fêmkirin; armanca stratejîk, plansaziya stratejîk û **stratejî** bixwe hertim hatine tevlihevkirin.

Weke ku tê zanîn armanca stratejîk, ew platforma çareseriya bîrdozî, polîtîk û aborî ya nakokiyên sereke yên di navbera hêzên hilberîner û têkiliyên hilberînê de ye.

Ji ber ku li welatê me sermayedariya yekdest ne bi hêzên hundirîn pêş ketiye û bûrjûwaziya yekdest a herêmî ji destpêkê ve bi emperyalîzmê re bûye yek, armanca me ya stratejîk, şoreşa dij-emperyalîst û dij-olîgarşîk e. (Têgeha şoreşa dij-emperyalîst û dij-olîgarşîk, ji Şoreşa Demokratîk a Neteweyî-ŞDN'yê ne zêde cuda ye. Lê naverok û çawaniyeke berfirehtir rave dike. Ji ber ku dagirkeriya emperyalîst a dema qeyrana 3'yemîn a emperyalîzmê diyar dike, têgeheke bêtir hevgirtî ye. Têgeha ŞDN'yê bi piranî ji bo rêbazên mêtîngeriyê yên kevn ên emperyalîzmê derbasdar e).

Beriya şerê ji nûve parvekirinê yê 2'yemîn, di encama rêbaza mêtîngeriya emepryalîst de li welatên ku paş de hatine hiştin hevalbendê emperyalîzmê feodalîzma çînayetiyê ya serdest a herêmî bû. (Bûrjûwaziya komprador, tenê dûvikê emperyalîzmê ye). Weke ku me di beşa duyemîn de bi awayekî berfireh diyar kiriye, venêrîn û rewşa şênber a emperyalîst bi gelemperî li peravan, li benderan (keştîgehan), li cihên stratejîk û navnedên sereke yên ragihandinê hebû. Otorîteya navendî gelekî lawaz bû.

Ji 4 parçeyan 3'yê welat û gelheyê di binê venêrîna dewletên biçûk ên herêmî yên lawaz ên ku di nava xwe de nakokiyên wan hebûn de bû. Ji ber ku sermayedarî ne serdest bû bajarîbûn, veguhestin û ragihandin lawaz bûn. Ji bo welat **emperyalîzm, diyardeyeke derveyîn bû û pêvajoya civakî jî pêvajoyeke feodal bû**. Ji ber vê yekê jî nakokiya sereke ya li welat di navbera yekîneyên lawaz ên feodal ên ku ji 4 parçeyan 3'yê welat û gelheyê kontrol dikin û gundiyên nîv-rênçber de bû. (**Têkoşîna demokratîk**) Dema ku gundiyan têkoşîn û tevgerên xwe yên jixweber bi rêxistin kirin û ber bi hişmendiya şoreşger a proleter ve çûn; dema ku bi rêvberiya partiya proleter artêşa gundiyan ava bû, hêza otorîteyên feodal ên herêmî hatin şkandin, baregeh ava bûn û hêdî hêdî welat dikete binê serweriyê, emperyalîzm ji bo ku mêtîngeriya xwe biparêze dest bi dagirkeriya giştî ya welat kir. Wê çaxê nakokiya sereke ya welat, di navbera hemû neteweyê û emperyalîzm û komeke xayinan de bû. (**Têkoşîna Neteweyî**) Di heyama şerê hundirîn de şer, bi gelemperî bi drûşmeyên çînî û di çarçoveya çînayetiyê de tê meşandin, lê di heyama şerê neteweyî yê şoreşger de li ser asta neteweyî û bi drûşmeyên neteweyî tê meşandin.

Di serdema qeyrana 3'yemîn a emperyalîzmê de li welatên weke welatê me, pêvajoya civakî ne pêvajoyeke feodal e. Emperyalîzm jî ne tenê diyardeyeke derveyîn e. Ji ber ku têkiliyên hilberîna emperyalîst xwe gihandine her derên welat, emperyalîzm di heman demê de veguheriye diyardeyeke hundirîn. Otorîteyên biçûk ên herêmî yên feodal ên lawaz, cihê xwe ji otorîteya dewleta olîgarşîk a xurt a ku emperyalîzm bixwe jî tê de cihê xwe digire re hişt. Emperyalîzm, li van welatan bi riya rêxistinên weke CIA û FBI'yê dema ku bixwaze dikare li gorî berjewendiyên xwe di nava baskên cuda yên olîgarşiyê de

desthilatdariyê biguherîne; dikare polîtîkaya cezakirinê ya ku olîgarşî li dijî gelê me dimeşîne beralî bike û destwerdan û sazkirinên cuda bixe meriyetê. Di vê hêlê de di vê serdema hêza nukleerî de venêrîna emperyalîst, ji bo van welatan ne tenê aborî ye, her wiha polîtîk e, bîrdozî ye û leşkerî ye. Mînak, li Tirkiyeya ku di nava rêxistina leşkerî ya NATO'yê de ye, emperyalîzma Amerîkayê rêvebriya dîktaya olÎgarşîk beralî dike, aboriya welat bi rê ve dibe û hegemonyayeke gîştî ava kiriye. (**Nêzîkahiya "dagirkeriya veşartî**) Ji vê hêl ve mirov nikare çînên serdest ên herêmî yên li welatê me û emperyalîzma Amerîkayê bi xêzikên stûr ji hev cuda bike.

Li welatê me nakokiya sereke di navbera **olîgarşiyê û gelê me de ye**. **(16)** Ji ber ku di nava olîgarşiyê de emperyalîzm bixwe cih digire, wê şerê şoreşger ne tenê di warê çînayetiyê de were meşandin. Wê şer, **di warê çînî û neteweyî de** were meşandin. Bêguman heta ku hêza leşkerî ya dewleta olîgarşîk têr neke û artêşa Amerîkayê bi awayekî aşkere tev li şer bibe, wê hêla çînî girantir be.

Revîzyonîst û pasîfîstên li welatê me, nabînin ku emperyalîzmê piştî şerê 2'yemîn ê parvekirinê, di rêbazên mêtîngeriyê de guhertin pêk anîne û dagirkeriya veşartî ya aborî, polîtîk, bîrdozî û leşkerî xistiye meriyetê û weke şoreşgerên welatên paş de hatine hiştin ên dema rêbazên kevn ên mêtîngeriya emperyalîzmê, emperyalîzmê weke diyardeyeke derveyîn dipejirînin û emperyalîzmê û çînên serdest bi xetên stûr ji hev cuda dikin. Oportunîstên ku nakokiya sereke di navbera feodalîzm û gundiyan de dibînin, oportunîstên ku nakokiya sereke di navbera bûrjûwaziya yekdest a herêmî û girseyên gel de dibînin, bi van nêrînên xwe karê emperyalîzma Amerîkayê hêsan dikin. Dagirkerên Amerîkî hemû hêza xwe û hemû

rêbazan bi kar tînin da ku dagirkeriya xwe veşêrin. Ev nêrîn jî ji "eniya çepgir" piştgiriya hewldanên emperyalîstên Amerîkî yên di vî warî de dikin.

Bi diyarkirina armanca stratejîk re pirsgirêk çareser nabe. Armanca stratejîk, bergeha derba sereke ya şoreşê diyar dike. Ango tenê beşeke ji plansaziya stratejîk e. Ji ber vê yekê jî bi diyarkirineke rast a armanca stratejîk re pirsgirêk çareser nabe; divê hêzên sereke, yên pêşeng û yên alîkar jî rast werin diyarkirin.

Wê şoreşa me bi Şerê Gel re serkeftî bibe. Lê weke ku me berê jî diyar kiriye, ji ber taybetmendiyên welatê me û rewşa dîrokî ya ku em tê de ne, wê Şerê Gel ji merhaleya Şerê Pêşengan re derbas bibe.

Di binê ronahiya Stratejiya Şerê Leşkerî yê Polîtîkbûyî de wê bergeha şoreşgerî, li ser xeteke wiha bimeşe:

Merhaleya 1'emîn: Avakirina gerîlayên bajaran.

Merhaleya 2'yemîn: Pêşxistina gerîlayên bajaran.

Avakirina gerîlayên çolterê û **nîşandana hêzê**.

Di van herdu merhaleyan de hêla **şerê derûniyê** wê bêtir derkeve pêş.

Merhaleya 3'yemîn: Berfirehkirina gerîlayên bajaran.

Pêşxistina gerîlayên çolterê.

Merhaleya 4'emîn: Berfirehkirina gerîlayên çolterê.

Çima me bi gerîlayên bajar re dest bi şer kir?

Du beşên sedeman hene:

A) Sedemên Objektîf:

a) Ragihandina rêxistineke şerker a ji bo girseyan, li bajaran bêtir guncan bû. Ji ber derfetên porpogandayê û naskirina di nava raya gştî de, di destpêkê de bajar, li gorî çolterê guncantir bû.

b) Di wateya bûrjûwaziya biçûk de be jî Dev-Genç'ê li bajarên mezin tevgerên tundiya şoreşgerî û çalakiyên girseyî dabûn meşandin. Van jî bingeheke wiha ava kiribû ku çalakiyên çekdarî yên tundtir û berfirehtir werin pejirandin.

B) Sedemên Sûbjektîf:

Ji ber ku di heyama amadekariyên propogandaya çekdarî de em sist nêzîkî kar bûn û di rakirina çekan de em dereng man, ji bo gerîlayên çolterê em ji mercên şênber û manewî yên weke çek, tecrûbe û cebilxaneyê bêpar mabûn.

Ji ber van mercên objektîf û sûbjektîf, partiya me bi gerîlayên bajar re dest bi şerê gerîla kir.

Ji niha û pê de wê partiya me vê riya ku hatiye diyarkirin bişopîne. (Piştî heyameke dirêj a bêçalakîbûnê)

Li gorî Stratejiya Şerê Leşkerî yê Polîtîkbûyî em dikarin hêzên pêşeng û sereke û hêzên alîkar ên şoreşê wiha diyar bikin:

Hêza Pêşeng: Proleterya ye.

Di pirsgirêka hêza pêşeng de ji ber ku Partiya me diyar kiriye ku wê şoreş bi Şerê Gel re bigihêje serkeftinê, pêşengiya bîrdoziyê ya proleteryayê pejirandiye. (Nêzîkahiya ku herêmên sereke çolter in) Di merhaleya Şerê Pêşengan de di nava Partiya me de cudakirina "kesên ku ji beşên kedkar hatine û yên ku ji beşên kedkar nehatine" tune ye. Ya girîng ew e ku şervan, şoreşgerên profesyonel bin. Her ku şer berfireh bibe wê beşên rêveberiyê jî tê de di beşên Partiyê de giraniya kedkaran hebe.

Hêzên Sereke: Gundî ne. (Bermahiyên feodal û bûrjûwaziya çandiniyê ne tê de, hemû hêmayên gundiyan):

Proleteryaya gundan

Nîv-proleteryaya gundan

Gundiyên xizan

Gundiyên navîn

Bêguman proleteryaya bajaran jî di nava hêzên sereke yên girseyî yên şoreşê de ne. Lê di merhaleya bilindbûna şoreşê de diyarkeriya wê xuya dike. Û wê ew, gotina dawî bêje.

"Her ku diçe hêzên nû tev li têkoşîna (şerê pêşengan) ku ji hêla yekîneyên şerker ên biçûk ve hatiye destpêkirin dibin; tevgerên girseyî çê dibin; pergala berê hêdî hêdî lawaz dibe, hildiweşe; û di wê kêliyê de çîna karkeran û girseyên bajarî, çarnûsa şer diyar dikin." (Che Guevara)

Alîkarên Bênavbeynkar:

- Derdorên rewşenbîr ên Kemalîst
- Eniya sosyalîst a cîhanî
- Tevgerên rizgariya neteweyî yên welatên mêtîngeh û bi taybetî jî yên Rojhilata Navîn.

Alîkarên Binavbeynkar:

- Baskê rastgir ê bûrjûwaziya biçûk.
- Rayagiştî û welatên rojavayî yên demokrat.
- Nakokiyên di nava olîgarşiyê de.

Rêza alîkarên bênavbeynkar û yên binavbeynkar, li gorî mercan tê guhertin.

BEŞA PÊNCEMÎN
PIŞTÎ 12'Ê ADARÊ, REWŞA ENIYA ÇEPGIR A TIRKIYEYÊ

Weke ku me di beşa destpêkê de jî diyar kiribû di "eniya sosyalîst" de di encama mercên objektîf û dîrokî yên welat de revîzyonîzm û pasîfîzm bûbûn hêmayên bibandor û beralîker.

Ji ber ku li Tirkiyeyê rêxistinbûna aborî û polîtîk bûrjûwaziya biçûk xurt û berfireh bû; ji ber ku welatê me, heta 1946'an, di binê zorbaziya bûrjûwaziya biçûk de bû û heta 12'ê Adarê jî di nava burokrasî û artêşê bandora bûrjûwaziya biçûk hebû, şoreşgeriya bûrjûwaziya biçûk di welatê me de xwedî qadeke berfireh bû.

Di çarîka sêyemîn a sedsala bîstan de ji ber hezkirina sosyalîzmê ya li ser asta cîhanê, li welatên ku paş de hatine hiştin bûrjûwaziya biçûk, di binê navê sosyalîzmê de di qada polîtîk de cihê xwe girt.

Ji ber ku li welatê me radîkalîzma bûrjûwaziya biçûk xurt bû û bandorê wê li ser dewletê hebû, ev yek kiriye ku di "eniya sosyalîst" de hin kes hêviyên xwe bi pasîfîzmê û radîkalîzma bûrjûwaziya biçûk ve girê bide.

Di mercên wiha de tevgera sosyalîst a li welatê me ne serbixwe bû, hertim bi bûrjûwaziya biçûk re di nava hev de bûn û hewl da ku di binê sîwana zagonî ya bûrjûwaziya biçûk de pêş bikeve. Di nava mercên wiha de darbeya leşkerî ya 12'ê Adarê pêk hat û hevsengiya heyî ya ku ji 1923'yan ve berdewam dike (di destpêkê de bi kêrî eniya şoreşê dihat, lê piştî 1946'an li dijî wê bû) xera bû; olîgarşiya li welat, hêza polîtîk a bûrjûwaziya

biçûk şkand, di hemû saziyên dewletê de bû serdest û bi polîtîkayên pêkutî û tundiyê, eniya çepgir belav kir.

Eniya çepgir, beriya 12'ê Adarê 7-8 bask bû, lê îro di du eniyên sereke de xwe rave dike:

- Eniya şoreşa çekdarî
- Eniya pasîfîst a dûvikê olîgarşiyê yê di nava eniya çepgir de.

Beriya 12'ê Adarê dijberiya propogandaya çekdarî û dijberiya gerîla, weke xayintiyê dihate pênasekirin û hema hema herkes gotinên şer û çalakiyên çekdarî ji devê xwe nedixistin. Lê beriya 12'ê Adarê û piştî 12'ê Adarê weke du cîhanên cuda ne. "Pisporên gerîla" yên dema legal ên ku digotin qey mirov divê xew herî tûj nîşan bide da ku bibe şoreşger, ên ku propogandaya çekdarî ji devê xwe nedixistin û herkesên ku propogandaya çekdarî napejirînin bi xayintiyê tawanbar dikirin, dema ku piştî 12'ê Adarê ji bilî rakirina çekan tu rê nema, gotin ku wan beriya 12'ê Adarê di mijara şoreşê de zêde nefikirîne, di bingeha xwe de propogandaya çekdarî rêxistinê ava nake, propogandaya çekdarî şaş e, wan berê mijar zêde nizanîbûn, piştî 12'ê Adarê ew fêrî teoriyê bûne û bi vî awayî wan ew xeta revîzyonîzmê ya ku beriya wê weke pasîfîzmê dihate nirxandin, bi çarlepka himbêz kir.

Ev, rewşeke xwezayî ye. Ji ber ku darbeyên leşkerî xetên rastgir û pasîfîst derdixin holê. (Têkçûna 1905'an, ji bo demeke derbasdar hêz dabû xeta menşevîk).

Piştî 12'ê Adarê di nava eniya çepgir a Tirkiyeyê de du geşedanên dijberî hev rû dan.

Ya pêşîn, ji bilî xwendekaran ji beşên cuda yên gel, gelek endamên nû û dûrist li dora propogandaya çekdarî kom bûn, lê "navdarên balkêş" ên heyama legal jî gotin ku ew berê şaş fikirîne û bi awayekî dildarî xwe avêtin eniya pasîfîzmê.

Ev avabûna di eniya çepgir de, bandor li Partiya me jî kir û komeke biçûk a di nava Partiya me de gotin ku bîrdozî, teorî, nêrînên stratejîk û çalakiyên Partiya me, teorî û pratîka narodnîzmê û anarşîzmê ye û bi vî awayî bûn dûvikên eniya pasîfîst ên di nava Partiyê de.

Li gorî van hêmayên rastgir;

- Daxuyaniyên Bi Hejmara 1'emîn ên Partî û Eniyê yên ku bingehên bîrdozî û stratejîk ên THKP-C'yê rave dikin û nivîsa "**Di Şoreşê De Bicihbûna Çînan**" a ku di **Kurtuluş**'ê de hate weşandin, teoriyên anarşîzm, fokoperestî û narodnîzmê ne.
- Tevgerên gerîla yên Sibat û Gulanê, ango çalakiyên şoreşgerî yên çekdarî yên ku Partiya me bi girseyan dane naskirin, pratîkên bîrdoziya narodnîzmê ne û di bingeha wan de bîrdoziya oportunîst a çepgir heye.
- Şerê THKP-C'yê yê pêşengên şoreşger ên gel, dûelloya (şerê takekesî) di navbera komeke zilam û olîgarşiyê de ye.
- Stratejiya Şerê Leşkerî yê Polîtıkbûyî, stratejiyeke fokoperest e. propogandaya çekdarî şaş e, rêxistinê ava nake û tu carî mirov nikare wê ji xwe re bike bingeh.
- Di vê demê de peywira şoreşgerî ew e ku em li dora weşana navendî xwe bi rêxistin bikin û têkoşînên aborî û demokratîk ên karkeran beralî bikin.

Bi kurtasî xeta rastgir a di nava Partiya me de rexneyên wiha dikirin. Ev rexne, weke rexneyên komên pasîfîst ên Kivilcimli û Şafak'ê ne. (Ev nivîsa ku nêrîna Partiya me rave dike, di heman demê de rexneya van nêrînên pasîfîst e).

Ev komika ku ne li gorî hêmanên bîrdozî û pratîk ên Partiya me dimeşiyan, bi raya piraniya Komîteya Giştî ya Partiyê, ji Partiyê hatin dûrxistin. Em weke hewldaneke vala dibînin ku yek bi yek rexneya nerazîbûnan bikin.

Biryara Komîteya Giştî ya Partiyê û xeta Partiyê, xeta proleter a şoreşger a ku bi sepandina Marksîzm û Lenînîzmê ya li gorî mercên şênber ên cîhanê û welatê me ava bûye ye. Û çalakiyên wê jî li gorî vê ravekirina bîrdozî û polîtîk a Lenînîst e.

Teror û tundiya olîgarşiyê çiqasî zêde bibe jî, wê Partiya me şerê gerîla berdewam bike. **Riya Partiya me, riya şoreşê ye. Riya şoreşê, riya Partiya me ye.**

Wê şer, piştî darbeya Gulanê, ji cihê ku lê sekiniye berdewam bike. Ne bername û gotinên biroqankî, lê **çalakiyên şoreşger** dikarin rêxistinê ava bikin û wê bi gel bidin nasîn.

BIJÎ ŞERÊ RIZGARIYA GELÊ ME YÊ ÇEKDARÎ!

BIJÎ THKP-C!

HETA RIZGARIYÊ, ŞER!

(*) "**Şoreşa Bênavber II-III", ew belge ye ku bi awayekî bipergal û bi awayekî giştî, nêrînên bîrdozî, polîtîk û stratejîk ên THKP-C'yê rave dike. Ev belge, ji hêla Mahir Çayan ve, di 29'ê Mijdara 1971'ê de, piştî reva ji zindana Maltepeyê hatiye nivîsîn.**

Jêrenot:

(1) Di nava mercên wiha de darbeya 12'ê Adarê pêk hat û ev darbe hemû pêlewanên derewîn û "donkîşotên tûj" ji hev de xistin.

*Nivîsa esasî wiha ye: "Ev tevger, di salên ku tê de rêvizyonîzm bi bandor bû de pêş ket û xurt bû. Ji ber vê yekê jî em çiqasî li ser bisekinin jî wê di destpêkê de bandora vê yekê heta radeyekê hebe. Mirov berovajî vê yekê bifikire, ev dibe îdealîzm. Wê ev bermahî di nava şer de û bi şerkirinê werin avêtin.

(2) Revîzyonîzma cîhanî dibêje ku cewhera emperyalîzmê hatiye guhertin, ji ber vê yekê jî yek ji hêmanên gerdûnî yên Lenînîzmê ya ku dibêje "şoreşa ku xwe dispêre tundiyê" êdî ne derbasdar e. Halbûkî tiştê ku hatiye guhertin ne cewher e, tenê teşe hatiye guhertin. Heta ku pergala emperyalîzmê hilweşe, wê hêmanên gerdûnî yên Lenînîzmê jî derbasdar bin.

(3) Pergala şer a Amerîkayê bi awayekî balkêş, gelekî mezin bûye. Di cotmeha 1961'ê de kovara Nation a Amerîkî, lêkolîna Fred Cook a bi navê "Jaggemsut: Dewleta Ku Berê Xwe Dide Şer" di weşaneke taybet de weşand.

"Hevbendiya pîşesaziyê û leşkeran, ango koma leşkerên ku karê wan ew e û sermayedarên ku bi saya amûrên leşkerî dewlemend bûne, her ku diçe polîtîkaya Amerîkayê bêtir diyar dike. Milyarên ku diherikin, desthilatdariyeke aborî dide Pentagonê ku li hemû welat belav dibe. Çalakgeriya Hêzên Çekdarî, ji çalakgeriya şirketên United States Steel, Amerîkan Telephone and Telgraph, Metropolibin Life Insurance, General Motors

û Standart Oil oj New Jersey sê caran mezintir e. Hejmara kesên ku ji wezareta parastinê mehane digirin, ji hejmara karker û karmendên van şirketên mezin sê caran zêdetir e."

Li gorî ku Cook diyar dike, 21 milyar dolarên ji butçeya 1960-1961'ê, ji bo amûrên şer û leşkerî hatine xerckirin. Ev siparîş û hewldan dikin ku aboriya Amerîkayê bi bernameya leşkerî ve gelekî were girêdan.

Di 1960-61'ê de rewş wiha bû. Di nava 10 salên dawî de jî leşkerîkirina aboriyê gihaye asteke gelekî bilind.

(4) Di vê merhaleyê de rêxistinên ku "bi leyîstokên diravan ve têkildar in", têra olîgarşiya aborî nakin. Di vê mijarê de rêxiztinên weke sindoqên malnîşan (kesên teqawid), sindoqên diravan û şirketên sîgortayê hêza xwe zêde dikin.

(5) Li gorî dahûrandinên qaşo "sosyalîst" ên ku vê guhertinê paşguh dikin, Tirkiye ne weke welatên din ên mêtîngeh e. Heta li gorî hin kesan, tenê dagirkeriyeke biçûk heye. Hin kes ji van dahûrandinên şaş, stratejiyên şoreşa sosyalîst derdixin, hin kes jî li gorî mînaka sowyetîk, wêneyên şoreşê xêz dikin.

(6) Di serdema qeyrana 3'yemîn de Che Guevara'yê ku şoreşgerekî proleter ê serkeftî bû, di 1961'ê de di kovara Verde Olive de, di nivîsa xwe ya bi navê "Kûba: Istisnayek E, Yan Pêşenga Şerê Li Dijî Emperyalîzmê Ye?" de guhertinên rêbaza mêtîngeriyê ya emperyalîzmê, ango mêtîngeriya nû wiha rave dike:

"...hilweşandina avaniyên kevn ên feodal û hevbendiya bi hêmayên herî pêşketî yên bûrjûwaziya neteweyî re, bi kêrî wan (emperyalîstan) jî tê. Li dijî hin reformên aboriyê, guhertinên di pergala xwedaniya axê

de û heger xwe bispêre kirîna teknîkê û malên sereke ya ji Amerîkayê li dijî pîşesaziya nerm dernakevin.

Formula herî baş ew e ku bûrjûwaziya neteweyî bi berjewendiyên biyanî re hevkariyê bike; bi vî awayî welatên din ên emperyalîst ên dijber werin bêbandorkirin û bi vî awayî dikarin diravên zêde yên ku bi vê rêbazê bi dest xistine, di binê parastina rêziknameyên sist ên kambiyoyê de ji welat derxin derve.

Bi saya vê şêwaza nû ya mêtîngeriyê, welat bixwe biryarên gumrukê yên ku rê li pêşiya karên gelekî mezin vedike, derdixe û berjewendiyên DYA'yê diparêze. (Bêguman DYA jî van karan rasterast dibe welatê xwe). Bi vî awayî li holê rikberî namîne û buhayên malan ji hêla yekdestan ve têne diyarkirin. Ev hemû di Projeya Hevbendiyê ya Ji Bo Pêşketinê de xwe didin der. Bi vê projeyê re ji bo ku pêşketina mercên şoreşê bisekinîne emperyalîzm beşeke biçûk a ji karan di nava çînên mêtînger ên neteweyî de belav dike. Bi vî awayî dixwazin van çînan li hemberî çînên ku herî zêde têne mêtîn, bikin hevalbendên qewîn ên emperyalîzmê. Bi vegotineke din, ev hevbendî hewl dide ku nakokiyên hundirîn ji holê rake."

Piştî ku van gotinan dibêje, Che diyar dike ku nakokiyên di navbera emperyalîstan de bi şer çareser nabin û ji bo welatên mîna welatê me qeyrana siyasî û aborî ya ku çarenûsê diyar dike, qeyranên mezin ên di navbera emperyalîzmê û hevalbendên wê yên herêmî (Che ji dêvla gotina "herêmî", gotina "neteweyî" bi kar tîne) mercên pêwîst ên şênber ava dike. "Ji bo roja me, hêmaya diyarker, hevrebûna eniya emperyalîzmê û bûrjûwaziya neteweyî ye".

(7) Polîtîkaya hişyarkirina girseyan a vê xetê wiha ye:

- Weşaneke navendî ya domdar (weke amûra ravekirina rastiyên siyasî)
- Broşûr
- Di tevna belavkirina weşana navendî de, di nava rêxistinê de avakirina beşên burokratîk
- Û rêxistinbûna tevgerên qaşo leşkerî (ne propogandaya çekdarî)

Kesên revîzyonîst ji van re dibêjin "rêxistinbûna stratejîk". Û beriya her tiştî ji bo vê rêxistinbûna qaşo stratejîk kar dikin. Lê di binê polîtîkayên tund ên olîgarşiyê de heger rêxistinek weşaneke navendî û broşûran derxe û bi xebatên klasîk ên qaşo girseyî re "hêzên nû" yên şoreşê ava bike, wê rêveber û xebatkarên wê rêxistina ku hêj di asta avabûnê de ye û teqez ne di merhaleya rêxistinbûna stratejîk de ye, bi derxistina kovar û borşûran û belavkirina wan sînordar bimînin.

Wê di nava mercên giran ên eniya dij-şoreşger de ew rêxistin tu carî neyê asta ku çekan hilbigire. Wê dem derbas bibe, lê mercên rêxistinbûnê amade nebin. Wê ew rêxistin bikeve nava çirava burokratîzmê. Wê ruhê şerker ê endaman (heger hebe) winda bibe, wê endam bibin weke bayiyên rojnameyan ên ku li bendî derketina weşana navendî ne. Wê belavkirina van weşanan zehmet be û xwendekarên wê ne zêde bin. Û wê ew weşan veguhere mekanîzmayeke burokratîk a ku tê de çend pasîfîstên qaşo rêveber û "komîteyên herêmî yên karker û gundiyan" gewezetiyê dikin, nîqaşên entellektuel dikin û raporan didin û distînin.

Wê veşartîbûna zêde û sistbûn bi hev re bimeşin. Wê çerxên îllegalîteyê ji bo pasîfîzmê bigerin. Heger

di navberê de karekî hêsan a bidestxistina diravan hebe, wê navend çend kesan ji bo pêkanîna vî karî diyar bike. Bi vî awayî wê bêjin qey rêxistina wan gelek karan bi hev re û bi awayekî serkeftî dimeşîne. Wê hefte û meh bi çîroka temamkirina rêxistinbûna stratejîk û rêxistinkirina çalakiyên leşkerî, bi gewezetiyê û karên nivîsê derbas bibin û wê bêjin "karên mezin têne plankirin".

Şêwaza xebatê ya pasîfîzma ku di gotinê de têkoşîna çekdarî dipejirîne wiha ye. Pasîfîzm, di binê navê têkoşîna bîrdoziyê de ew şoreşgerên ku li dijî emperyalîzm û olîgarşiyê şerê şoreşger ê gel dimeşînin rexne dike, hewl dide wan reş bike, hewl dide mejiyan şêlû bike û hezkirina ku propogandaya çekdarî ava kiriye belav bike.

Oportunîzm, dûvikê emperyalîzmê yê di nava eniya çepgir de ye.

(8) Di civaka Osmanî ya sedsala 18'emîn de -ligel ku di derbarê dînamîka hundirîn a civakê de hêmayên astengkirinê tune bûn jî- sermayedariya ku ji şêwaza hilberînê ya feodal pêşketîtir bû, ava bû.

a) Cotkarî, zanaat û bazirganî ji hev cuda bûn, kombûneke sermayeya bazirganiyê û diravî pêk hat.
b) Hişmendiya ku berê xwe dide razemeniyên sûdwer pêş ket.
c) Hêza kar a serbest derket holê.
d) Bûrjûwaziya herêmî ya ku sermayeyê di destê xwe de digire û berê xwe dide razemeniyên sûdwer derket holê.

Mirov dikare bêje ku çalakgeriya jixweber a civaka Osmanî -ne zêde xurt be jî- ji bo pêşketina serbixwe ya sermayedariyê û şoreşa pîşesaziyê guncan bû. Lê Osmanî

derbasî pergala sermayedar nebû û bû qada mêtîngeriya sermayedariya Ewropayê. Sedemên vê yekê ev in:

a) Piştî vedîtina riyên nû yên deryayî, navendîbûna bazirganiya cîhanî ya Anatolyayê nema û bazirganiya deryayî girîngtir bû.
b) Ewropayê çavkaniyên xwezayî û hêza mirovî ya Asya, Efrîqa, Amerîka û Hindê desteser kirin û sermayeyek mezin kom kir.
c) Li Ewropayê artêşên profesyonel hatin avakirin ku hêza wan a lêdanê mezin e û bi çekên xurt hatine bihêzkirin.

Van diyardeyan kir ku di avaniyên civakî yên welatên Ewropaya Rojavayî de pêşketin çê bibe û sermayedariya hemdemî ava bibe, lê nehiştin ku civaka Osmanî derbasî pergala sermayedar bibe û jê re bûn astengên derveyîn. (Ji bo agahiyên berfirehtir li Parazname'yê binerin).

(9) Bûrjûwaziya biçûk -mercên dagirkeriya aşkere ne tê dene çîneke civakî ya hemdem e ku bikaribe girseyên gel ên kedkar şiyar bike, girseyan ji feodalîzma sedsalan rizgar bike û tevgereke xurt a şoreşger biafirîne. Ji ber vê yekê jî tevgerên neteweyî û şoreşger ên şêlû yên rewşenbîrên neteweparêz ên leşker û sivîl ên Osmanî hertim lawaz bûn, li ser gel bandoreke wan a girîng tune bû û girse bi piranî tenê li wan temaşe dikirin.

(10) Diyarkirina bi vî awayî ya pirsgirêkê, ji bo Partiya me ya ku di 72'an de li Tirkiyeyê şerê gerîla dimeşîne (di merhaleya şerê pêşengên şoreşger de) gelekî girîng e. Di nava derdorên rewşenbîr ên bûrjûwaziya biçûk de em dikarin bi kê re kar bikin? Bersiva vê pirsê, di ravekirina rast a Kemalîzmê de veşartî ye. Her wiha ev ravekirin, ji bo diyarkirina xeta girseyê jî girîng e. Heger em

Kemalîzmê weke bîrdoziyekê, weke bîrdoziya beşa leşker û sivîlên rewşenbîr pênase bikin, wê bergeha ku divê were şopandin cuda be; heger weke helwesta rizgariya neteweyî ya baskê çepgir ê leşker û sivîlên rewşenbîr a li hemberî emperyalîzmê were nirxandin wê bergeh cuda be. Di roja me de ji ber prestîja cîhanî ya sosyalîzmê û ji ber ku Yekitiya Sowyetan alîkara sereke ya tevgerên neteweparêz ên şoreşger ên radîkal e, neteweparêzên şoreşger jî xwe weke sosyalîst pênase dikin. Ji ber wê jî gelek Kemalîstên welatê me jî îro ji xwe re dibêjin sosyalîst. Weke ku tê zanîn taybetmendiya bûrjûwaziya biçûk a welatên ku paş de hatine hiştin, ji taybetmendiya welatên sermayedar û emperyalîst cudatir e. Helwesta vê çînê ya li dijî emperyalîzmê û çînên serdest ên herêmî cuda ye. Di warê helwestê de mirov dikare vê çînê di sê koman de binirxîne. Komek, di nava hevbendiya paşverû de cih digire; koma din ji dûr ve li bendî encamê ye. Koma sêyemîn jî tev li tevgerên çînî yên "radîkal û neteweyî" dibe û li ser bingeha neetweparêziyê helwesteke dij-emperyalîst nîşan dide.

Kemalîzm, helwesta polîtîk a rizgariya neteweyî ya baskê herî çepgir û rewşenbîr ê bûrjûwaziya biçûk e.

Di Şerê Pêşengan de em dikarin bi vî baskê Kemalîst ê derdorên rewşenbîr ên bûrjûwaziya biçûk re li gorî hêmana "him dostanî him têkoşîn" hevbendiyê çêkin. Heger em hemû rewşenbîrên bûrjûwaziya biçûk ên xwedî hişmendiya werarker weke Kemalîst binirxînin û li helwestên wan ên neyînî yên ku îro li hemberî çalakiyên me nîşan didin binêrin û bêjin "eywah, em ji derdorên demokratîk qut bûn û ber bi çepgiriyê ve çûn" ev tê wê wateyê ku Kemalîzm nehatiye fêmkirin. Îro

baskê rastgir ê beşa rewşenbîrên leşker û sivîlan û yê bûrjûwaziya biçûk, bi awayekî teqez di nava refên olîgarşiyê de ne. Baskê navîn, beriya 12'ê Adarê li bendî bû ku guhertineke radîkal a desthilatdariyê çê bibe û xwe avêtibû eniya çepgir; niha jî xwe gelekî nêzîkî eniya rastgir kiriye. Baskê çepgir jî ji ber taybetmendiya xwe ya darbekar û şoreşger, xeyal dikir ku bi baskê rastgir ê rewşenbîrên leşker û sivîlan re hevalbendiyê ava bike û bibe desthilatdar, lê 12'ê Adarê weke çakûçekî li serê vî baskî ket û rewşenbîrên leşker û sivîlan ew tenê hişt û ket piyê olîgarşiyê. Ev rewş jî bi qasî wî çakûçî bandor lê kir. Û îro di nava mercên wiha de xwe paş de kişandiye û hewl dide xwe komî ser hev bike.

Hevalbendên rewşenbîrên leşker û sivîlan ên THKP-C'ya ku di merhaleya Şerê Pêşengan de ye, incex Kemalîst bin. Divê em bi wan bidin fêmkirin ku baskê rastgir, hevalbendê teqez ê olîgarşiyê ye û dikare di dema tevgereke dîrokî de xayintiya refên şoreşger bike. Incex dema ku ev bask, fêm bike ku darbekarî ne riya rizgariyê ye û êdî baskê rastgir wekî dostê xwe nebîne, bi vî baskî re eniya hevpar gengaz dibe.

(11) Wê li dijî materyalîzma diyalektîk be kû mirov çîna pêşeng a şoreşê, ji naveroka civakî ya şoreşê derxe.

(12) Bi vê geşedanê re emperyalîzm jî di nava burokrasiyê de ji xwe re alîgir dîtin. "Di vê navberê de komîsyonên li miqabilî meşandina karan zêde bûn, kesên li derdora İhsan Beg'ê ku serokê berê yê Dadgehên Istiqlalê yê û endamê Meclîsa Rêvebir ê Bankaya Îş'ê ye, ji hêla yekdestên biyanî ve ji bo daxwazên Hêzên Deryayî di nava ruşwetê de hatine hiştin." (Bnr. Parêzname)

(13) Ev tê wê wateyê ku hêza neteweparêzên şoreşger hatiye şkandin û hevsengiya nisbî bi dawî bûye.

(14) Ne tenê çalakiyê THKP-C'yê, lê belê çalakiyên çekdarî yên THKO'yê jî di vê mijarê de bi bandor bûne.

(15) Kesên pasîfîst li welatê me yê ku di binê dagirkeriya emperyalîzmê de ye wiha dibêjin: "ewilî em xebatên revîzyonîst bikin û girseyê û xwe bi rêxistin bikin û paşê jî em ê dest bi têkoşîna şoreşgerî bikin". Lê rêxistinbûna ku xwe li ser rêbazên aştiyane yên têkoşînê ava dike, teqez nikare bigihêje asta şerkirinê. Mînaka Yewnanistanê li holê ye.

(16) Ev yek, di pratîkê de di navbera pêşengên şoreşger ên gel û olîgarşiyê de tê dîtin.

BIRYARA DERXISTINA JI THKP-C'YÊ YA YUSUF KUPELI Û M. RAMAZAN AKTOLGA

Ji hevalên Îlhan û Mahmût re,

Hêmanên bîrdozî, polîtîk, rêxistinî û stratejîk ên partiya me di hejmara 1'emîn a kovara Kurtuluş'ê de, di daxuyaniyên Partî û Eniyê de û di rêziknameya Partiyê de zelal û aşkere ye.

Xeta partiya me, ew xeta tevgera şoreşger a navneteweyî ye ku di encama sepandina Marksîzm-Lenînîzmê ya li gorî mercên cîhanê û Tirkiyeyê de derketiye holê.

Partiya me, di serdema mêtîngeriya nû de ji bo ku li hemberî gelên cîhanê û Tirkiyeyê peywirên xwe yên enternasyonel û neteweyî pêk bîne, şerê gerîla ji xwe re kiriye bingeh.

Partiya me şerê gerîla, weke şêwazê herî bilind û bi bandor ê têkoşîna polîtîk dibîne û xeta wê ya stratejîk, xeta şerê leşkerî yê polîtîkbûyî ye.

Ev xet, şerê gerîla li gorî hêmana şerê şoreşger ê yekbûyî digire dest.

Şerê şoreşger ê yekbûyî, di van demên ku Partiya me hêj piştgiriya çalak a girseyan wernegirtiye û şer di navbera olîgarşiyê û pêşengên gel ên şoreşger de tê meşandin de hêmana rêxistinî ya Partiya me û hêmana yekitiya pêşengiya polîtîk û leşkerî ye.

Hûn, ên ku hêmanên bîrdozî, polîtîk, stratejîk û rêxistinî yên Partiya me weke "Narodnîzm"'ê, weke "yekbûna ne birêkûpêk a Marksîzm û narodnîzmê û jirêderketina herî xetere ya çepgir" dinirxînin û bêyî agahiya Komîteya Giştî ya Partiyê, hewl didin

li dewsa xeta şoreşger a Partiya me, xeta pasîfîzma civakî ya navneteweyî bi cih bikin, êdî ji bo we ew derfet nemaye ku di nava Partiya me de bimînin.

Ev Partî, li ser wan hêmanên bîrdozî, teorîk û stratejîk ava bûye ku hûn îro wan weke "Narodnîzm"'ê pênase dikin û wan napejirînin û ev Partî bi pratîka şoreşger a li gorî vê xeta bîrdoziyê di nava gel de belav bûye.

Ji ber van sedeman weke endamên Komîteya Gîştî me biryar da ku raye û peywirên we yên di nava Partiyê de werin sekinandin û hûn ji Partiyê werin veqetandin. (*)

HETA RIZGARIYÊ ŞER!

Oral, Ruştu, Memdûh, Cevdet, Hasan

Berfanbara 1971'ê

(*) Kesên ku di cihekî rêxistinê de peywirdar bin û vê nêrîna rastgir bipejirînin, wê rastî heman pêkanînê werin.

NAMEYA BERFANBARA 1971'Ê

Di nameya beriya vê de me tenê anîbû ziman ku em ê nikaribin bi Îlhan û Mahmût re di nava rêxistinbûnekê de bimînin û me hemû têkiliyên xwe bi wan re qut kirine.

Me sedemên vê yekê jî di du sernivîsan de diyar kiribû:

1- Cudahiyên xeta bîrdozî, polîtîk û stratejîk

2- Van kesan, bi awayekî dûrî rêhevaltiyê û bi awayekî xayinane hin kar kirine ku hevrêyên xwe yên di hucreyên olîgarşiyê de ne bêdeng bikin. Ev kes ketibûn nava helwesteke wiha ku ne di hevrêtiya şoreşger de ne jî di hevaltiya feodal de cihê wê heye.

(...) Dev ji stratejiya şerê leşkerî yê polîtîkbûyî berdane û xeta Kivilcimli ya pasîfîst û revîzyonîst (bi şîroveyeke nû) li ser partiyê hatiye ferzkirin.

Ev herdu heval, hemû nivîsên kevn ên ku nêrînên me yên hevpar bûn û heta radeyekê bingeha bîrdozî û teorîk a tevgera me ava dikirin, daxuyaniyên Partî û Eniyê, xeta ku di Kurtuluşê de hatibû diyarkirin û axaftinên me yên ku hatine çapkirin, lê nehatine çapkirin û hwd. bi giştî napejirînin.

Bersiva wan a ji bo pirsa "Ma di wê demê de we jî ev nêrîn nediparastin?" gelekî sosret e:

"Belê me ew diparastin. Em jî wiha difikirîn. Lê me wê çaxê Marksîzm zêde nizanîbû. Tiştên ku Mahir digotin me rasterast dipejirandin. Lê di nava van şeş mehan de me xwend û em fêr bûn. Me dît ku nêrînên kevn û xeta partiyê, pêkhateyeke Narodnîzm û Marksîzmê ye. Di rastiya xwe de xeta kevn, di binê gotinên Marksîst de fokoperestiyê bi cih dike. Xeta me ya kevn, jirêderketineke çepgir e..."

(...) Bi qasî ku em dizanin ev heval, ji Marksîzmê agahdar in; di vê mijarê de di civînan û hwd. de berdevkî dikirin, behsa berhemên hosteyên sosyalîzmê dikirin digotin ku hin tevger di xeteke şaş de ne û her wiha em bi wan re bi mehan li ser mijarên hişmendiya şoreşê, şêwazê xebatê, hişmendiya rêxistinê û mercên Tirkiyeyê axivîne û em gihane heman ramanan.

Ev hevalên ku heta dawiya meha gulanê xeta partiyê bi germî diparastin, piştî ku hevalên wan ên li Stenbolê hatin girtin bîrdozî û stratejiyên berê guhertin, xeta kevn weke jirêderketina çepgir bi nav kirin, ketin nava pirtûkan (hemû peywirên xwe yên pratîk dan aliyekî) û fêrî Marksîzmê bûn; di dawiyê de jî gotin "Doktor berê bi piranî rast digot. Me gotinên Doktor şaş nirxandin" û ew xeta ku berê weke revîzyonîst û dij-Lenînîst hatibû nirxandin, weke xeta nû ya Partiyê ragihandin. Nabêjin ku her tiştên ku Doktor dibêje rast e, lê dibêjin ku Doktor bi piranî tiştên rast digot û wiha tevdigerin.

(...) Xeta Partiya me, xeta şerê leşkerî yê polîtîkbûyî ye.

Weke ku tê zanîn, şerê gerîla bi tena serê xwe tiştekî leşkerî ye.

Şerê gerîla, weke têgehekê bi tena serê xwe ne xwediyê wateyeke şoreşgerî ye.

Lê ji bo ku marksîstên welatekî ku di binê dagirkeriya (veşartî û aşkere) emperyalîzmê de ye karibin rastiyên siyasî rave bikin û hişmendiya polîtîk ava bikin, amûra sereke û şêwazê sereke ya vê riyê şerê gerîla ye û navê vê jî xeta şerê leşkerî yê polîtîkbûyî ye.

Di navbera vegotina şerê leşkerî yê polîtîkbûyî û propogandaya çekdarî de di hêla naverokê de cudahî tune ne...

HETA RIZGARIYÊ ŞER

PARTIYA RIZGARIYA GEL A TIRKIYEYÊ
DANEZANA BI HEJMARA 1'EMÎN

RIYA ŞOREŞÊ

Stratejiya Şoreşê ya THKP'yê

TIRKIYEYA KU DI BINÊ NÎRÊ EMPERYALÎZMA AMERÎKAN DE YE

Tirkiye ji dewlemendiya binerdî heta bazirganiya derve, ji aboriyê heta polîtîkayê, ji çandê heta hunerê di binê venêrîna emperyalîzma Amerîkan de ye.

Ji bo welatekî mêtîngeh an jî nîv-mêtîngeh, wateya emperyalîzma Amerîkan, talankirina dewlemendiyan e; xizanî û birçîbûna gel e û perçiqandina rûmeta neteweyî ya di binê potînên Amerîkan de ye.

Li welatê me di encama polîtîkaya pêkutiyê ya li dijî gelê kedkar a ku rêveberiya olîgarşiya AP (Partiya Dadweriyê) dimeşîne de qeyrana aborî, civakî û polîtîk gelekî kûr bû; diravên me bênirx bûn; xizaniya gelê kedkar giha asteke bilind û mercên jiyanê zehmet bûn. Kadroyên Demîrel ên olîgarşiyê, li hemberî nerazîbûn û tevgerên gelê me nikarîbûn pergala heyî bi zagonên fermî biparêzin û di encamê de ji hêla beşa leşkerî ya olîgarşiyê ve bi darbeya 12'ê Adarê hatin xistin. Hikûmeta Erîm a ku difikirîn ku wê berjewendiyên yekdestên herêmî û biyanî çêtir biparêze, hate peywirdarkirin.

Siyasetmedarên pergalê rewşê weke "aloziya hikûmetê" bi nav dikin, lê ya rast ew e ku hewldana partiyên pergalê yên

demokrasiya temsîlî di hêsankirina mêtîngeriya emperyalîzma Amerîkan û çînên serdest ên herêmî de qels mane. Valahiya ku kêmasiya partiyên pergalê ya di parastina pergalê de ava kiribû, ji hêla baskê leşkerî yê olîgarşiyê ve hate dagirtin. Li pişta hikûmeta îro, ev baskê olîgarşiyê heye.

Ev rewş jî derbasdar e. Çerxên mêtîngeriya emperyalîst ên ku dizîvirin wê xizaniya gelê kedkar û zehmetiya mercên jiyanê zêdetir bikin. Wê olîgarşî, sedema nerazîbûna gel bi kêmasiya hikûmeta Erîm ve girê bide û vê carê jî wê ew were xistin û li dewsa wê jî kadroyên nû bînin ser rêveberiyê.

Wê çerx bizîvirin û cûnta jî lipey hev werin. Wê hinek ji wan weke "Ataturkparêz û laîk" û hinek ji wan jî weke "reformparêz" werin nîşandan; wê rewşenbîrên welatparêz bi hêviyeke nû her carê xwe bi yên nû ve girê bidin, paşê wê fêm bikin ku hatine xapandin û wê li bendî bin ku pêngaveke "pêşverû" pêk were.

Di welatên ku ji hêla emperyalîzmê ve hatine dagirkirin de ev çerx her tim wiha dizîvire. Heta ku welatê me jî parçe bibe wê ev çerx wiha bizîvire.

RIZGARIYA GELÊ ME

Di vê rewşê de hewl didin ku tevgerên herî biçûk ên rizgariya neteweyî û demokratîk biperçiqînin; kesên ku rizgariya neteweyî diparêzin di kolanên sereke de li pêşiya çavên gel bi awayekî xayinane têne şehîdkirin û di êşkencexaneyan de rastî êşkenceyên hovane tên. Di rewşeke wiha de mirov nikare behsa dewleta zagonî û demokrasiyê bike. Heger hinek li welatê me behsa dadweriyê, dewleta zagonî, destûra bingehîn, mafên hemwelatiyê heta mafên mirovan bike, nêta kesên wiha ne xerab be, ew kes safikî ne.

Li hemberî desthilatdarî û tundiya dij-şoreşê ya emperyalîzmê, ji rakirina çekan pê ve çareserî tune ye. Partiya me, riya rizgariyê di şerê çekdarî yê gel de dibîne. Şêwazê îroyîn ê şerê me, şerê gerîla ye.

Partiya me wiha difikire ku di encama hewldana hemû welatparêzan û bi şerê gel ê demdirêj, zehmet û bixwîn de dijmin dikare were têkbirin û di vê merhaleya şerê gel de şerê gerîla yê bajar ji xwe re dike bingeh.

Mercên şênber û yên sûbjektîf ên îroyîn pêwîst dikin ku şerê gerîla li bajaran were meşandin. em di merhaleya yekemîn a şerê rizgariya gel de ne.

Wê şerê gerîla yê li bajaran:

1- Nîşanî girseyên gel bide ku rêveberiya xayinan çiqasî vala û xerabe ye.

2- Wê nîşanî girseyên gel ên ku weke volkanekê li bendî teqînê ne bide ku, rêxistinek heye ku dikare ji cihê ku lê dixe deng derxe heye, rêxistinek heye ku cezayê dide zordestan û dikare dîktatoryaya xwe ya şoreşger ava bike.

3- Wê partiya me ji hin serboriyan derbas bike û di riya avakirina rêxistina şerker a gel de qewîn bike.

Rêxistina şer, ji qadên şer derdikevin.

Bi kurtasî di vê dema ku em jê derbas dibin de pêwîst e ku di serî de çîna me ya karkeran hestên nerazîbûn û serhildanê yên ku di nava hemû girseyên gel de hene werin xurtkirin; pêwîst e ku ev girse, ji bo têkoşîna çekdarî werin beralîkirin û avaniya rêxistinî ya partiya me were xurtkirin.

Di merhaleya duyemîn a şer de şerê gerîla belavî hemû welat dibe û li gel gerîlayên bajar, gerîlayên çolterê jî dest pê dike.

Di merhaleyên sêyemîn û çaremîn de hêzên gerîla vediguherin artêşa birêkûpêk.

Mirov nikare ji niha de behsa dema van merhaleyan bike. Em nikarin van bûyeran texmîn bikin. Peywira me ya niha ew e ku pêwîst e em di vê riyê de bi awayekî bipergal û bêrawestan şer bikin.

Di serî de çîna me ya karkeran, riya rizgariya hemû çînên gel, ji şerê gerîla derbas dibe.

Pêwîst e ku em li ser vê xeta stratejîk a ku ji hêla oportunîst û revîzyonîstan ve gelekî hatiye tevlihevkirin, hinekî bisekinin. Şerê bîrdoziyê yê proleteryayê di eniyên bîrdozî, aborî û polîtîk de bi hev re rû dide. Li hemberî bîrdozî û jirêderketinên bûjûwaziyê şerê şoreşger ê proleteryayê, şerê bîrdoziyê ye. Têkoşîna rojane ya ku bi armanca sererastkirina mercên jiyan û xabatê yên çînên karker û kedkar jî, têkoşîna aboriyê ye. Têkoşîna ku rasterast armanca wê rêveberiya çînên paşverû ye jî, şerê polîtîk e.

Têkoşîna polîtîk ji propogandaya polîtîk a ku bi riya weşanên şoreşger têne kirin heta xwepêşandanên girseyî yên polîtîk, ji grevên polîtîk heta şerê gerîla bi şêwazên cûrbecûr pêk tê.

Şêwazê herî bilind û bibandor ê têkoşîna polîtîk, şerê gerîla ye.

Partiya şoreşger, di van hersê eniyan de , derfetên her eniyê bi awayekî herî sûdwer dixe nava tevgerê. Partiya me li hemberî

emperyalîzmê, çînên serdest ên herêmî û dûvikên wan ên di eniya çepgir de di sê eniyan de hewl dide şerê xwe bimeşîne.

Pratîka şoreşger a cîhanê nîşan dide ku heger yek ji sê eniyên têkoşîna çînayetiyê were paşguhkirin an jî girîng neyê dîtin, di eniya çepgir de jirêderketin rû didin.

Partiya me li dijî tevger û komên rastgir û pasîfîst ên ku têkoşîna çînayetiyê bi derxistina kovarekê û rêxistinkirina tevgerên zagonî sînordar dikin têdikoşe; bi heman awayî li dijî tevger û komên fokoperest ên "çapgir" ên ku têkoşîna çînayetiyê tenê weke şerê gerîla dibînin jî derdikeve. Ev herdu jirêderketin jî rizgariya gelê kedkar bi paş ve dixin û asteng dikin.

Pasîfîstên li welatê me dibêjin ku em hêj di merhaleya werarê de ne û ji ber vê yekê jî mercên şênber ên şerê çekdarî tune ne. Gotinên wiha ji bingeha xwe de seqet in û şaş in. Armanca van dahûrandinan, veşartina bîrdozî ya teslîmiyetê ye. Li welatên ku emperyalîzm lê serdest e, merhaleyên werar û şoreşê bi xetên stûr ji hev cuda nabin; ev herdu merhale ketine nava hev. Her wiha ddagirkeriya emperyalîzmê tê wateya bikarîna zor, tundî û çekan a eniya dijber. Ev jî dide xuyakirin ku mercên şênber ên şerê çekdarî hene.

Di vê demê de partiya me ya ku têkoşîna desthilatê dike, ne di wê hêz û astê de ye ku desthilatê bi dest bixe. Incex di merhaleya şerê artêşên bipergal de mirov dikare li seranserî welat behsa bidestxistina rêveberiyê bike. Û em teqez nabêjin ku em di vê merhaleyê de ne. Em tenê dibêjin ku ji bo ku şerê şoreşger ê gelê me bigihêje vê astê, pêwîst e ku şerê gerîla were pêşxistin û em bi vê armancê têdikoşin.

Di vê demê de şerê rizgariya gel, weke şerê gerÎlayên bajar tê meşandin. Partiya me, vî şêwazê têkoşînê bi hin rêzikan ve girê daye. Di şerê gerîlayên bajar de armanc hêzên emperyalîst, bûrjûwaziya yekdest û kûçiên wan e. Partiya me hemû tevgerên ku berê xwe didin van armancan dest dike û çalakiyên serserî yên ku berê xwe nadin van armancan jî bi tundî şermezar dike.

Partiya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê, ji partîzanên ku şer dikin pêk tê. Partiya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê hêmana yekitiya pêşengiya polîtîk û leşkerî ji xwe re dike bingeh. Şerê gerîla yê ku bi pêşengiya Partiya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê ji merhaleyên demdirêj û navberkar derbas dibe, wê artêşa rastîn a gel biafirîne.

Riya şoreşa Tirkiyeyê, riya partiya me ye. Riya partiya me, riya rizgariya gelê me ye.

HETA RIZGARIYÊ ŞER!

KOMÎTEYA NAVENDÎ YA PARTIYA RIZGARIYA GEL A TIRKIYEYÊ (Gulana 1971'Ê)

ENIYA RIZGARIYA GEL A TIRKIYEYÊ

DAXUYANIYA BI HEJMARA 1'EMÎN

Karkerino,

Gundîno,

Leşkerino, Rewşenbîrên Welatparêz, Gelê Me,

Emperyalîstên Amerîkî û kûçikên wê salên dirêj welatê me talan kirin; çi me hebû, ji xwe re birin. Ked û xwêdana gelê me yê kedkar û hemû xebatkaran dizîn. Dest danîn ser hemû dewlemendiyên me, petrola me, kroma me, sifira me û hemû çavkaniyên me yên xwezayî. Li pey xwe jî ji me re birçîbûn, xizaniyeke giran, nexweşiyên ku hezaran kes ji me birin û nezaniyeke ku gelê me neçarî jiyaneke tarî kiriye hiştin.

Îro li welatê me komeke xayin û kûçikên ku ji bermahiyên sifreyên dijminê dagirker xwedî dibin, ji bo vê pergala qirêj berrdewam bikin û xulamtiya emperyalîzma Amerîkayê bikin, çerxa zordariya bi awayekî bêwicdan dizîvirînin. Her welatparêzên ku li hemberî dizî û talana wan disekinin jî li qadan têne gulebarankirin. Dixwazin dengê karker û gundiyan, dengê kesên ku nan û axê dixwazin bi xwîn û zordariyê qut bikin. Tiştên ku em wan diafirînin û hildiberînin bi zorê ji destê me derdixin.

Kûçikên faşîst ên Amerîkaperest ji bo ku vê pergala mêtîngeriyê ya qirêj çêtir bimeşînin di binê navê pêkanîna asayîşê niha jî rewşa awarte ragihandine. Maf û azadiyên gelê me yên herî sereke jî ji holê hatine rakirin.

Îro demogojiyeke qirêj e ku mirov li welatê me behsa zagonan, dewleta zagonî, destûra bingehîn, mirovahî û mafên hemwelatîbûnê bike.

Em li ser axa xwe bûne gelekî kole.

Gelo wê ev rewş wiha berdewam bike?

NA!

HEZAR CARÎ NA!

Nabe ku ev rewş wiha berdewam bike; êdî dem hatiye ku em rabin serhildanê, çekan rakin û ji bo ku dijminê dagirker têk bibin bikevin nava tevgerê.

Hêz û derfetên wan ên ku îro xuya dikin, ne xema me ne. Ew, komeke biçûk in, lê em bi milyonan in. Tiştekî ku em winda bikin tune ye, lê em dikarin cîhaneke mezin bi dest bixin.

Em weke Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê dibêjin ku:

1- Ji bo hilweşandina serdestiya emperyalîzma Amerîkî û desthilatdariya çînên mêtînger ên xualmên wê yên herêmî û ji bo bidestxistina serxwebûnê, yekane rê şerê rizgariyê yê çekdarî ye.

Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê hemû welatparêzên ku di vê riyê de biryara têkoşînê dane himbêz dike û rêxistina pêşengên şervan ên gel e. Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê, di têkoşîna xwe de pêşengiya rêxistina şer a çîna karkerên Tirkiyeyê , Partiya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê dipejirîne û têkoşîna xwe di binê fermandariya wê de dimeşîne.

2- Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê bi biryar e ku heta ku emperyalîzma Amerîkî û kûçikên wê ji welat biqewirîne

têbikoşe û heta ku şervanê wê yê dawî bimire şerê xwe berdewam bike.

3- Dijminên Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê emperyalîstên Amerîkî, sermayedarên fînansê, axayên axê, navbeynkar, kesên ku bi zêdebûnê diravan didin, burokratên leşkerî û sivîl ên Amerîkanperest û hemû dijminên gel in.

4- Peywira sereke ya Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê ew e ku eniya dijmin a ku ji hêla emperyalîstên Amerîkayê û hevalbendên wan ên herêmî hatiye avakirin hilweşîne û xera bike; dest deyne ser hemû malên ku ji keda gel hatine bidestxistin û bi van malan hêza şer a Eniyê bilind bike; amûrên pêwîst bi dest bixe û hêzên çewisandin û tundiyê parçe bike.

Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê, berpirsyariya maceraperest û pêxwasên berê xwe didin armancên ku ne di nava xalên êrîşê yên Eniyê de ne û zirarê didin refên gel, ranake. Revandina zarokan, tengavkirina jinan û êrîşa li dijî kesên ku rasterast ne bi emperyalîzmê ve têkîldar in, êrîşa li dijî karkazan û dwelemendên di asta navîn de yên derveyî komeke biçûk a xayinan, ango êrîşa li dijî bûrjûwaziya navîn û zirardayîna wan nabe çalakiya şoreşger. Ev, çalakiyên pêxwasiyê ne. Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê, bûyerên bi vî rengî bi awayekî tund şermezar dike. Û li hemberî hemû çalakiyên li dijî emperyalîstên Amerîkî, nûnerên sermeyaderiya fînansê, zaliman û dijminên gel jî rêzdar e û heta dawiyê desteka wan dike. Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê, hemû çalakiyên şervanên xwe bi riya daxuyaniyên xwe ji gel re radigihîne. Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê darizandin û cezakirina dijminên gel, kesên êşkencekar, zalim û diz pêk tîne. Hesabê xwîna ku rijiandine û zilma ku kirine dipirse.

5- Bi vê armancê Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê ligel hewldanên xwe yên beralîkirina têkoşîna gelê me ya aborî û demokratîk, di mehên dawî de van tevgerên leşkerîkirine:

1- Diravên rojekê yên Şaxa Kuçukesat'ê ya Bankaya Zîratê, ji bo bikaranîna wan a di şerê şoreşgerî yê gelê me de, hatine desteserkirin.
2- Bi armanca bîranîna şoreşgerên ku di "Yekşema Bixwîn" de şehîd bûne di tevgera terora şoreşger de di 16-17'ê sibatê de ev çalakî hatin kirin.:
    a) Navenda Tûslogê ya depoya amûrên leşkerî ya Amerîkî ya li Zîncîrlîkuyuyê,
    b) Şaxa Tûslogê ya li Şîşliyê,
    c) Şaxa Bankaya Bazirganiya Derveyîn a Amerîkî-Tirk a li Elmadaxê,
    d) Sefareta DYA'yê,
    e) Sefareta Ingiltereyê,
    f) Navenda şirîkatiya emperyalîst a Amerîkî IBM'ê ya li Gumuşsûyûyê hatine bombekirin.
3- Bota leşkerî ya Amerîkî ya li Salipazariyê hate bombekirin û xerakirin.
4- Diravên rojekê yên şaxa Erenkoyê ya Bankaya Bazirganiyê ya Tirk, ji bo bikaranîna wan a di şerê şoreşgerî yê gelê me de, hatine desteserkirin. Di vê çalakiyê de erebeya leşkerê Amerîkî yê bi navê A. Donald hate bikaranîn û ev erebe paşê hate şewitandin.
5- Diravên rojekê yên Kadir Has û Mete Has (ên ku xwediyên gelek kargeh û şirîkatiyên weke Coca-Cola, Pe-Re-Ja, Elvan, Mercedes-Benz, Otomarsan û Akbank'ê ne) û diravên rojekê yên Talip Aksoy

(axayê ji Edeneyê) ji bo bikaranîna wan a di şerê şoreşgerî yê gelê me de, hatine desteserkirin.

6- Tevgera 1'ê Gulanê hate lidarxistin.

Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê, bang li hemû welatparêzên rasteqînî dike ku tev li şerê wê yê serxwebûnê bibin. THKC (Eniya Rizgariya Gel a Tikiyeyê), eniya hemû şoreşger û welatparêzan e û eniya rizgariya gelê Tirkiyeyê ye.

HETA RIZGARIYÊ ŞER

ENIYA RIZGARIYA GEL A TIRKIYEYÊ Gulana 1971'ê

RÊZIKNAMEYA PARTIYA RIZGARIYA GEL A TIRKIYEYÊ

BEŞA 1'EMÎN

BERNAMEYA GIŞTÎ

THKP, partiya siyasî ya proleteryayê ye. Armanca sereke ya THKP'yê ew e ku li cîhanê ji hêla mirovan ve li ser mirov mêtîngerî neyê kirin û pergaleke civakî were avakirin ku tê de her cûre pêkutî û mêtîngerî tune be. Heta ku ev armanc pêk were THKP, weke partiya siyasî ya proleteryaya Tirkiyeyê wê têkoşîna xwe berdewam bike.

BEŞA 2'YEMÎN

JI ENDAMÊN PARTIYÊ RE

Xala 1.- Herkesên ku rêzikname û bernameya partiyê dipejirînin; bi qasî ku bi rehetî bikaribin xebata şoreşgerî bimeşînin marksîst û lenînîst bin; rastiyên welat bizanibin; tev li yek ji rêxistinên partiyê bibin û tê de bi awayekî çalak bixebitin û li gorî biryar û disiplîna partiyê tevbigerin dikarin bibin endamên THKP'yê.

Xala 2.- MERCÊN DERBASBÛNA PARTIYÊ:

Bi pêşniyara du endamên partiyê, bi derpêşkirina nûnerê wê qada xebatê û bi biryara erênî ya komîteya navendî endamtiya partiyê pêk tê.

Xala 3.- Rêxistinên partiyê yên hin astan, di çarçoveya rayeya xwe û li gorî rewşa şênber van cezayan didin kesên ku ne li gorî disiplîna partiyê tevdigerin: Hişyarî, di nava partiyê de

bêpeywirkirin, ceribandina di nava eniyê de û avêtina ji partiyê. Biryarên bêpeywirkirin û derxistina ji endamtiya partiyê, ji hêla Komîteya Navendî ve têne standin. Û Komîteya Giştî jî erê dike.

BEŞA 3'YEMÎN

HÊMA Û BEŞÊN RÊXISTINA PARTIYÊ

Şer ji gelek hêlan ve tê meşandin. Pêwîst e ku ji rêxistinkirina tevgerên girseyî yên beşên cûrbecûr ên gel heta beralîkirina wan û ji têkoşîna bîrdoziyê heta şerê çekdarî hemû şêweyên têkoşînê bi hev re werin meşandin.

Xala 4.- Di vê demê de hêmaya rêxistina partiyê, navendîbûna demokratîk e ku hêla wê ya navendîbûnê girantir e. Incex piştî ku herêmên rizgarkirî werin avakirin, navendîbûna demokratîk dikare bi awayekî giştî were sepandin.

Xala 5.- Ji bo ku bikaribe vê têkoşîna piralî bimeşîne, komîteyeke giştî ya partiya me heye ku ji endamên ku herî zêde derdikevin pêş ên her qadê û ji endamên komîteya navendî ya ku bi avakirina têkilî û hevsengiya di navbera hemû qadan de berpirsyar e, pêk tê.

Komîteya giştî gelekî kêm kom dibe. Di hebûna rewşên gelekî awarte (yên weke dema ku di navbera endamên komîteya navendî de dubendî derkevin, dema ku biryareke li ser rewşa giştî ya partiyê were standin, dema ku bobelatek pêk were û hwd.) de kom dibe û biryarê distîne.

Komîteya giştî, beşa herî bilind a partiyê ye. Komîteya xwe ya navendî diyar dike. Komîteya wê ya navendî, ji hemû karên partiyê berpirsyar e. Birêkûpêkbûna xebatên partiyê saz dike.

Li derveyî van xalan, her endamên komîteya navendî, rêveberên komîteyên xebatê yên diyar in. Ev kes, ji bo ku kar bi pergal bimeşin, li her qadê komîteyên alîkar ava dikin.

Niha komîteya gîştî ji 10 kesî û komîteya navendî jî ji 3 kesan pêk tê. Li gorî geşedana têkoşînê, ev hejmar dikare were zêdekirin.

ENIYA RIZGARIYA GEL A TIRKIYEYÊ

Beşên rêveber ên partiyê, her wiha rêveberiya eniyê jî dikin.

Xala 6.- Mercên endamtiya eniyê:

a) Ji bo xwendekaran: Divê xwediyê hişmendiyeke diyar a marksîst-lenînîst bin û hêmayên partiyê di warê hêmayî de bipejirînin. Divê cidî û bipergal bin û di qadekê de xebatê bimeşînin.
b) Ji bo karker, gundî û kesên ku ji beşên din ên gel hatibin: Divê rêbertiya partiyê bipejirînin û li gorî disiplîna partiyê tevbigerin.

Xala 7.- Mercên derbasbûna THKC'yê:

Bi pêşniyara du endamên eniyê û bi erêkirina nûnerê partiyê yê wê qadê û bi erêkirina yek ji endamên komîteya navendî pêk tê.

17/05/1971

Demjimêr: 17:00

JI DESTEYA WEZÎRAN A AMERÎKANPEREST RE,

Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê, di TEVGERA 1'Ê GULANÊ de Efraîm Elrom'ê sefîrê Israîla ku dijminê sereke yê gelên Rojhilata Navîn e û pêlîstoka Emperyalîzma Amerîkayê ye, yê Tirkiyeyê yê ku di rêxistinkirina tevgera Siyonîst a li welatê me de risteke wî yê girîng heye, revandiye.

Li hemberî jiyana Efraîm Elrom, divê demildest ev şertên me werin cih:

1- Pêwîst e hemû şoreşgerên girtî werin berdan. (Wê cih paşê were diyarkirin)

2- Pêwîst e Daxuyaniya Bi Hejmara 1'emîn a Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê 3 rojan bi awayekî giştî di Bernameyên Nûçeyan ên TRT'yê de di demjimêrên 07:30, 13:00, 19:00 û 22:45'an de were weşandin.


3- Heta ku dem biqede pêwîst e polîs û hêzên din nekevin nava şopandinê û weşanên li dijî vê yekê dernekevin.

Piştî vê ultîmatomê 3 roj dem heye. Heger şertên me bi cih neyên wê Efraîm Elrom demildest were gulebarankirin. (Dem heta 20/05/2021'ê demijmêr 17:00'ê ye)

Komîteya Navendî ya Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyeyê







MAHIR ÇAYAN



HUSEYÎN CEVAHÎR



ULAŞ BARDAKÇI